

K. T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ

BINGEHÊ VEGOTINÊ DI ROMANA
"GRÊWEYA BEXTÊ HELALE"YA ETA NEHAYÎ DE

Karokh Fahmi Farho FERHO

VAN - 2017

T.C
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

**ETA NİHAYI'NIN "HELALE'NİN İDDIA
ŞANSI" ROMANINDAKİ ANLATIM ESASI**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN
Karokh Fahmi Farho FERHO

DANIŞMAN
Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN - 2017

K. T.
ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ

BINGEHÊ VEGOTINÊ DI ROMANA
"GRÊWEYA BEXTÊ HELALE"YA ETA NEHAYÎ DE

Amadekar
Karokh Fahmi Farho FERHO

Şêwirmend
Alk. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN - 2017



T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Karokh Fahmî FARHO tarafından hazırlanan “Binyada Vegêranê Di Romana Şertê Bexta Helaley a Eta Nehayî”adlı bu çalışma, 27/04/2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İmza: 

ÜYE : Yrd. Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

İmza: 

ÜYE : Yrd. Doç. Dr. İbrahim SÜRÜCÜ

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

Prof. Dr. Murat DEMİRER

Enstitü Müdürü



NAVEROK

| | |
|---|------|
| NAVEROK..... | I |
| KURTE..... | III |
| ABSTRACT..... | VI |
| PÊŞGOTIN..... | VIII |
| BINGEHÊ VEGOTINÊ DI ROMANÊ DE..... | 1 |
| 1.1 VEGOTIN ÇEMK Û PÊNASE..... | 1 |
| 1.2 Girîngiya Vegotinê..... | 3 |
| 1.3 Şêwazên Vegotinê..... | 4 |
| 1.4 Vegotina Babetî..... | 6 |
| 1.5 Vegotina Xweyî..... | 7 |
| 1.6 Goşenîga û Corên Vegotinê..... | 8 |
| 1.7 Corên Dîtina Goşeyî ya Vebêj..... | 9 |
| 1.7.1 Dîtina Goşeyî ya Derve..... | 9 |
| 1.7.2 Dîtina Goşeyî ya Hundirî..... | 10 |
| 1.8 Dem..... | 12 |
| 1.8.1 Dema Vegotinê..... | 12 |
| 1.8.2 Beşên Dema Vegotinê:..... | 15 |
| 1.9 Girîngiya Demê di Tekstên Wêjeyî de..... | 16 |
| 1.10 Cih û Rolê Cih di Vegotina Romanê de..... | 17 |
| 1.11 Corên Cih di Romanê de..... | 21 |
| 1.11.1 Cihê Waqî:..... | 21 |
| 1.11.2 Cihê Xeyalî:..... | 23 |
| 1.11.3 Cihê Fantazî..... | 24 |
| 1.11.4 Cihê Hogir:..... | 24 |
| 1.11.5 Cihê Nehogir..... | 26 |
| 1.11.6 Cihê Vekirî:..... | 27 |
| 1.11.7 Cihê Daxistî..... | 28 |
| 1.12 Corên Karkter û Rolên Wan di Vegotina Romanê de..... | 29 |

| | | |
|-------|--|-----|
| 1.13 | Bûyer û Peywendiya ligel Vegotinê | 37 |
| 2 | VEGOTIN DI ROMANA GRÊWEYA BEXTÊ HELALEYÊ..... | 46 |
| 2.1 | Rol û Bandora Kesayeta Serekî di pêkhatiya Vegotina Romanê de | 46 |
| 2.1.1 | Coreyên Kesayetî li Gor Rol û Bandora Wan di Vegoteya Romanê de | 47 |
| 2.1.2 | Coreyê Kesayeta li Gor Xwezayî rol di Pêkhatiya Awahiya Kesayetan de..... | 48 |
| 2.1.3 | Rola Kesayetiya Serekî di Vebêjîna Romanê de | 49 |
| 2.1.4 | Rola Karakterê Serekî di Romana (Grewî Bextî helale) ya Eta Nehayî de | 50 |
| 2.1.5 | Rola Kesayetiya Kêlegê di Vebêjîna Romanê de | 53 |
| 2.1.6 | Rola Kesayetiya tenîstê di Vegotina Romana ‘‘Grewî Bextî Helale’’ ya Eta Nehayî de | 54 |
| 2.1.7 | Rola Çîrokbêj di Vebêjîna Romanê de | 58 |
| 2.1.8 | Rola Çîrokbêj di Vegotina Romana (Grewî Bextî Helale) ya Eta Nehayî de..... | 59 |
| 2.2 | Awayê Nêrînên Goşeyê yên Vebêjînê..... | 63 |
| 2.3 | Dîtin ji Paşve: | 65 |
| 2.4 | Dîtin li Gel:..... | 68 |
| 2.5 | Dîtina li Derve | 72 |
| 2.6 | Gotûbêjên di Romana (Grewî Bextê Helale) ya Eta Nehayî de | 73 |
| 2.6.1 | Gotûbêjên Rasterast..... | 79 |
| 2.6.2 | Gotûbêjên ne Rasterast | 81 |
| 2.6.3 | Hûnera Vesf di Roman (Grewî Bextî Helale) ya Eta Nehayî de | 83 |
| 3 | Teknîk di Romana Girewiya Bextê Helaleyê de | 90 |
| 3.1 | MONOLOG (MONOLOGUE) | 90 |
| 3.2 | Monolog û Corên Wê..... | 92 |
| 3.3 | DEM (TIME)..... | 96 |
| 3.4 | Dem û Corên Wê | 99 |
| 3.5 | Teknîkê Paşxeriyê | 103 |
| 3.5.1 | Teknîkê Pêşxerî | 107 |
| 3.5.2 | Teknîkê Pêşxerî | 108 |
| | ENCAM..... | 111 |
| | ÇAVKANÎ..... | 113 |

KURTE

Wêje bi giştî, roman bi taybetî roleke giring dibînin di berfireh kirina hizra xwandevan de û roman wisa dike ku bi awayeke kûrtir û bi dîtineke cuda ya rexnegirî ve li tiştê bê nêrîn. Dibe her ev yek jî be ji sedem ku me roman helbijart û lêkolîneke zanistî ya zêdetir li ser babeta cîhana roman bikin.

Nav nîşana vê nameyê (bingehê vegotekirinê di romana ‘‘Grewî Bextê Helale’’ ya Eta Nehayî de)dibe sînore karkirina me. Ku ev romane yek ji romanê herî balkêş ê nivîskar û wêjeya kurdî ye. Elbet nivîskar li teniştê vê romanê de çend roman û kurte çîrok jî nivîsiye, lê awayê giringiya vegotekirinê û babetên giring ên romanê wa lê kiriye ku em vê romanê ji bo kar li ser bikin helbijêrin.

Ev nameye ji sê beşên serekî pêktê:

Beşa yekem: Ku ji sê babetan pêkhatiye, di destpêkê de teoriyeke baş pêkhatiye û awayên nivîsa romanê hatiye vekirin û piştê xwe girêdaye bi hin çavkaniyên giring. Herwaha di nivîsê de balkêşana ser vegotekirinê û awayên vegotekirinê, li gel vê yekê jî di vê beşê de nêrînên goşeyî û coreyên wê hatine rawekirin. Herwaha behsa rol û giringiya dem, cîh, karakter û bûyeran di bingehê vegote kirinê de hatiye rawe kirin.

Beşa duyem: Ev beş ji du babetan pêkhatiye û karkirina pratîkî ya derbarê romana (Grewî Bextê Helale) de, rola kesayetên serekî û xwedî rola teniştê û çîrokbêjê di romanê de hatiye rawekirin. Herwaha rola gotûbêj û coreyên wê û rola wan a di pêşdebirina vegotekirinê de hatiye behs kirin, herwaha vesf û pesn û bandora wê li ser vegotekirina romanê ya di vê beşê de hatiye behs kirin.

Beşa sêyem: Di vê beşê de behsa rêgezên serekî yên vegotekirinê hatiye kirin, wek; monolog, flashbek, dem, teknîka pêşxerî û paşxeriyê hatiye behs kirin. rol û erkên her yek ji wan rêgezane di romanê de hatiye rawe kirin.

Herwaha di dawiyê de jî wek encam bi çend xalan, encamên bidest hatine puxteyek ango kurteyek jê hatiye derxistin û listeya çavkaniyan jî hatiye rêz kirin.

ÖZET

Genel de edebiyat, özeld de roman okuyucunun görüş ve düşüncelerini etkileme ve geliştirme anlamında önemli bir rol oynadıkları gibi, roman okuyucuda daha derin ve eleştirel bir bakış açısının gelişmesini de beraberinde getirir ve daha oturan belli bir dünya görüşüne sahip olmasında büyük katkı sağlar. Bundan dolayı da özellikle roman üzerine bilimsel bir araştırmayı esas aldığımızı ve bu nedenin bu konuyu seçmemize temel teşkil ettiğini belirtmek yerinde olacaktır.

Tezimizin esas konusu olan Eta Nehayı'nın "Grewî Bextê Helale" adlı romanındaki anlatımını çalışmamızın esas konusu olarak ele aldık. Bu roman yazarın ve Kürt edebiyatının oldukça dikkat çeken bir çalışmasıdır. Elbette yazarın bu roman dışında da bir kaç romanı daha ve kısa öykü çalışmaları vardır. Fakat bu çalışmanın anlatımının önemi ve konuların anlatım biçimi, bu roman da oldukça dikkat çekici olduğu gibi üzerinde çalışılması gerektiğine inandığımız ve bu araştırma için seçtiğimiz bir konu oldu.

Bu tez üç temel bölümden oluşmaktadır:

Birinci bölüm; Üç konudan oluşmaktadır. Başlangıçta iyi bir teorik çalışma ve romanın yazım biçimi ele alınmış ve oldukça önemli kaynakları temel edinmiştir. Ayrıca yazımda anlatım konusuna dikkat çekilmiş ve anlatım biçimi ile kendi köşesinden bakış açılarını ve biçimlerini izah etmeye çalışmıştır. Diğer taraftan zaman, mekan, karakter ve olayların anlatım biçimi ve temeli ele alınarak önemi ele alınmaya çalışılmıştır.

İkinci bölüm; İki konudan oluşmaktadır ve "Grewî Bextê Helale" romanındaki Pratik çalışma biçimi, as karakterde rol oynayan kişilikler ile yan rol alan kişilikler ve anlatım yapan kişinin rolleri romanda ele alınarak izah edilmeye çalışılmıştır. Ayrıca romanda var olan diyalog biçimleri ve anlatımın gelişim süreci ele alınarak, bazı vasıflar ve bu vasıfların romanın anlatım dili üzerindeki etkileri bu bölümde ele alınmaya çalışılmıştır.

Üçüncü bölümde ise; anlatım dilinin temel ilkeleri üzerine bazı noktalara dikkat çekilmiş, monolog, flaşbek, zaman, gelişim ve gerileme tekniği çeşitli yönleriyle ele alınmıştır. Ayrıca bu ilkelerin romanda rol ve görevleri izah edilmeye çalışılmıştır.

Ayrıca en son olarak da, sonuç bölümünde bazı noktalara dikkat çekilmiş, elde edilen veriler temelinde bir özet çıkarılarak, çalışmada faydalanılan kaynaklar sırasıyla dizilerek çalışma sonlandırılmıştır.



ABSTRACT

As well as playing an important role in influencing and developing the views and ideas of novel readers in general, literature also brings a deeper and more critical perspective to readers and contributes greatly to a better understanding of a certain worldview. It is therefore worthwhile to state that we base our scientific research on the novel in particular, and that this is the basis for choosing this topic.

We discussed Eta Nehayi's narrative in his novel "Grewî Bextê Helale" as the main subject of our work. This novel is a remarkable work of the author and Kurdish literature. Of course, besides this novel, the author also has a few more novels and short stories. But the way of expressing this work and the way of expressing them is a remarkable topic that we believe we should work on as this novel is quite remarkable.

This thesis consists of three main parts:

First part; It consists of three subjects. In the beginning, a good theoretical study and the writing style of the novel were taken up and based on the important sources. In addition, my writing emphasized the importance of narration and attempted to explain the forms of narration and forms of narrative from its own corner. On the other side, the way of expression of time, space, characters and events and basics were taken into consideration.

Second part; It is composed of two subjects and tried to explain the practical working style of " Grewî Bextê Helale ", the personalities playing the role of as a character and the roles of the person who plays the side and the role of the narrator. In addition, the dialogue forms that exist in the novel and the process of development of the narrative are considered, and some qualifications and the effects of these qualities on the narrative language of the novel are tried to be discussed in this section.

In the third chapter; Some points on the basic principles of the expression language were noted, monologue, flashback, time, development and regression techniques were discussed in various aspects. In addition, these principles have been tried to explain the roles and tasks of the novel.

Lastly, some points were noted in the conclusion section, a summary based on the obtained data was drawn up, and the study was terminated by sequencing the resources utilized in the study.



PÊŞGOTIN

Herçend roman ji çend bingehên hûnerê pêk jî tê, lê yek ji wan bingehan jî binesaziya vegote kirinê ango vebêjînê ye. Di nav rexne kirina kurdî de heta naha bi awayeke zanistî a madebûneke lewaz heye. Ev teknîke wek hemû teknîkên din ê hevçerxên din xwedî amaje û asta xwe ya taybete, ev yek jî bi vê taybetiyê ve tê naskirin, ku dibe pîvan bo diyar kirina asta bingehê rêgezên din ên vebêjînê.

Helbijartina vê babetê (Bingehê vegotinê di romana ‘Grêweya bextê Helale’ ya Eta Nehayî de) lêkolîneke ji rêgeza herî serekî ya bingehê vebêjî ya romanê vedikole. Ev yek tê wateya ku em tenê aliyê hûnerî, ku ew jî bingehê wê li ser vegotinê ye, di vê romana roman nivîs de verdigêrin û karê me bi romanên din tuneye.

Destnîşan kirina sînore lêkolînê, wek di navnîşana lêkolînê de jî hatiye diyar kirin tenê yek romanekê digre navxwe. Ev destnîşan kirin nayê wê wateyê ku romanên din ên roman nivîs ji vê romanê bîna cuda kirin, ji ber armanca destnîşan kirinê û raxistina berçav a wan aliyên hûnerî yên di vê romanê de, ji bo ku baştir em bikarin li ser babetê bi ponijîn û qad û çarçoveya lêkolînê em bikarin pir berfireh nekin. Di dema diyar kirina wan aliyane de jî ji bo me aşkera bû, ku lêkolîn di aliyê vê romanê ve werçerxeke nû di romana kurdî de li xwe digre. Giringiya lêkolînê di pratîk kirina romanê de li wê yekê vedigere ku em dikarin bi hûrgilî asta vebêjîna di romanê destnîşan bikin. Bê guman çawaniya ber bi pêş de birinê û lêkdana astên di romanê de pir heldigre. Ji ber vê jî di vê derê de ew bingehê buye armancê lêkolînê û hewldaneke bo hewsengandin û tîşk xistina ser giringiya vebêjînê û coreyên di vê romanê de.

Sedemê helbijartina vê babetê ji ber çend aliyên giring pêkhatiye, yekem; Ev lêkolînên akademîk ên heta naha derbarê romana kurdî (Zarawayê Soranî) pêkhatine, negeheştine wê astê ku lêkolîneke zanistî yên bi hûrgilî bin û taybet li ser vebêjînê bin. Ew yek heta naha pêknehatiye, ku bi hûrgilî û bi kûrayî bal li ser hatibe kêşandin. Ji ber bi awayeke pir kurt behsa awayê vebêjînê li hin romanên kurdî de hatiye kirin. di demekî ku ev teknîke sedemeke bo serkeftin û diyar kirina nûjenî di dariştina romanê de.

Duyem: Heta naha lêkolîneke serbixwe û zanistî derbarê vê romanê de nehatiye kirin, ku taybet li ser bingehê vebêjînê be. Lê awayeke giştî ji wî alî yan jî ji aliyê din ve hin rexnegirên li dervey behsa akademîk gotar û lêkolînên xwe di derbarê romanên Eta

Nehayî de nivîsîne, ji bo vê jî ev lêkolîne hewldaneke bo diyar kirina nirxên serekî yên vegote kirinê di romanê de giştî de û herwaha bi taybetî di romana (Grewî Bextê Helale) de

Li gor baweriya min pêkanîna lêkolîneke bi wî awayî gelek pirsgirêk û astengî xwe nîşan didin, ku yek ji wan pirsgirêkên ku hatine pêş me jî hebûna çavkaniyên zanistî yên di vê babeta zimanê kurdî de bûye, herçend hin çavkaniyên zanistî hebûn jî lê piraniya wan jî bi zimanê erebî û zimanên Ewropî bûn. Ji ber vê jî li gor daxwazê û wek pêwîst me karî sûd ji wan çavkaniyan verbigrin. Ev yek jî bû sedem ku ferhenga zimanê kurdî di vê babetê de hinekê wek hejar û lewaz bimîne.

Di vê lêkolînê de, rêbazê teorî yê rawekirinê û rexneyên pratîkî di diyar kirina astên vebêjîna vê romanê de hatiye peyrew kirin.

Herwaha li ser sê beşan de dabeş bûye.

Beşa yekem: Bo behs kirina bingehe vegoteyê û giringiya vebêjîna di romanê de bi giştî hatiye cuda kirin. Li gel diyar kirina pêkhatiyên vegotinê, ku pêktê ji (Coreyên vegote kirinê û awayên vegote kirina nêrînên goşeyî) ev beşe dabeş dibe li ser sê babetên serekî de.

Di mijara yekem de pênase û core û nêrînên goşeyî yên vegote kirinê hatiye behs kirin. di mijara duyem de behs li ser dema vebêjîna ya rola cîh, di vebêjîna coreyan de hatiye kirin. di mijara sêyem de behs li ser coreyên karakter û bandora wan di vebêjîna de, herwaha rola bûyeran a di vebêjîna romanê de hatiye kirin.

Beşa duyem: Beşa duyem li ser du mijaran hatiye dabeş kirin û her du beşên teorî û pratîkî li xwe digre. Di mijara yekem de behs li karakterên serekî û bandor û rolê wan di vegotinê de amaje pê hatiye kirin. herwaha rol û bandora kesayet û karakterê teniştê û coreyên wan amaje pê hatiye kirin, di dawiya mijarê de jî behs li çîrokbêj û core û pêgehên wan di vebêjîna romanê de hatiye behs kirin.

Di mijara duyem de behs li nêrînên goşeyî û coreyên wê di romanê de hatiye rawe kirin û bi awayeke pratîkî gotûbêj û rol di pêşdebirina bûyeran de hatiye behs kirin, her di vê mijarê de behs li ser bingehe vesf û pênase û bandora wê li ser vebêjîna di romanê de hatiye kirin.

Beşa sêyem: Di vê beşê de rola rêgezên serekî yên vebêjîna ji aliyê teorî û pratîkî ve hatine destnîşan kirin. ew jî pêkhatine ji rêgezên (Monolog û dem û flaş û

teknîkê pêşxistinê û paşxistinê) her yek ji wan rêgezane jî xwedî cîhekî taybet ê xwe ne û ji aliyê teorîk ve hatiye behs kirin. Li gel rawe kirin û pratîk kirina wan rêgezane di vê romanê de ji bo wê jî behs hatiye kirin.



BINGEHÊ VEGOTINÊ DI ROMANÊ DE

1.1 VEGOTIN ÇEMK Î PÊNASE

Dibe Yûnanî yekem kes bin li ser wate û şêwazên vegotinê hûr bibin û bikaranî bin. Peyva (Epos) ku bi Yûnanî wateya peyv û çîrok e, weke efsane wateya efsane dide û bûye binçîneya peyva (Epic) ê¹, weke berjeng jî wateya vegotinê bi dest ve aniye, wate berhemeke ku divê bê vegotin. Wate, destpêka peyva çîrok û vegotinê bi yek wate hatiye, armanca her dukan jî vegotin bû. Her berheme ku bê vegotin çîrok e. Weke tê dîtin du tişên tamamkerên hev in.

Vegotin bingeheke sereke yê hemû corên vegotinên weke destan, roman û çîrokê ye, (Mebesta vegotinê ew binemayên balkêşin ku mirov her di destpêka jiyane de her dem hewla vegotinê daye. Wate, vegotin kirdareke ji bo derbirîna bûyer û serhatiyan.)² Vegotin kirdare, stûn û ragirtina hemû tekstekê (deqek) vegotine. Bi bê vegotin hebûna çîrokê jî nîne, bi serhatî û bûyeran hebûna wê heye. Vegotin weke binemayeke sereke di hunerê vegotinê de piştî xwe pê girêdide. Roman û çîroka serkeftî, divê şêwazeke vegotinê ya serkeftî jî hebe.

Şêwazên pênase û nasandina vegotinê gelek in lê hemû li ser wê yekê kokin ku vegotinê yek binema heye ew jî ew ku divê bûyereke hebe ji bo ku vegotin hebe. (Vegotin çîrok e, her dema ku gotarek derketi bû ligel bûyer, karakter û gotûbêjkirina karakteran karek encamdan, ew dibe vegotineke amade.)³ Vegotin serederî ligel tişteke dike ku qewimî be, yan li ser qewimînê ye û dibe ku di paşerojê de biqewime. Wate dibe her dem bûyereke hebe û kesek jî wê bûyerê vegotin bike.

Vegotin, bi dirêjahiya demê re guhertinên mezin bi ser hatiye. Ligel pêşveçûna şaristaniyet û alozbûna jiyana mirov li ser zewiyê vegotin jî gelek nezêl bûye û têgihiştina şêwaz û corên wê hêsan nîne. Wate, di destpêka romanên hunerî de ku di romana bi navê 'Robinson Crusoe' ya Danyal Defoe û 'Romana Don Quixote'⁴ ya Servantes de derdikeve ku vegotinê gelek guhertinên mezin bi xwe ve dîtiye. Eger wê demê civaka mirovatîyê sade û hêsan bûya, bi zelalî di wêjeya

¹ - Ferhengî Edebî, Muhsîn Ehmed Omer, Çapxaney Hemdî, Slêmanî, 2012, R 241.

² - A Glossary of Literary Terms, M.H. Abrams, Tahran, ninth edition. 2009, p 208.

³ - Zaraway Edebî, ferhengî şîkarane. Bextîyar Secadî. Weşana Aras. Hwlêr, 2004. R 85.

⁴ - Roman Çîye? Komalêk nivîskar, wergêr: Cewad Mistefa. Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2008. R 138.

vegotinê ya wê serdemê de diyare ku teknîk, ziman û derbirîn sade bû. (Li dawiya ew hemû şoreş û pêşketinên ku di warê pîşesazî, bînasazî, astrolojî, zanistên civakî û mirovatî de qewimîn, wêje û wêjeya vegotinê bi giştî pêşveçûneke ber bi çav bi xwe ve dît.)⁵ Vegotin weke têgiheke rexneyî û wêjeya nû, weke pirsgirêkek wêjeyî ya aloz ku her dem mirov vedigerîne ji bo meselaya corên wêjeyê, di nava wêjeya Rojhilat û wêjeya Kurdî de, dîrokek kevnar heye û di çendîn pêngav, werçerxan û guhertinan de derbas bûye. (Vegotina ku peywendî bi reng û war yan jî binçîneyên huner û beşên wêjeyê ve heyî, ta niha jî di nava wêje û rexneya Kurdî de, di bi warê lêkolînkirina teoriyan de, baldariyeke wisan nedaye.)⁶ Di demekê de ev mijare binçîne yan taybetmendiyeke bingeîn di wêjeya vegotinê de pêktîne. Vegotin kêmîr cihê girîngî pê dana nivîskarên Kurd bûye, ev jî wê wateyê nagihîne ku nivîskarên Kurd girîngî bi wêjeya vegotinê nedane. Dibe ku kêmîr bala nivîskarên Kurd kêşa be. Wate, nivîskar ew çend di hewla gihandina çîrokekê de bûn ew çend jî girîngî bi aliyên ciwankarî yên teksta nivîsandinê nedane.

Dema behsa vegotinê tê kirin ku tekstek li ber destê me ye û bûyera ku yek li dûv yekê hatî vegotin dike, vêca ew bûyer xeyalî yan rastî be, mêrxwaz, cih, ferman têde be û di hemahengiyê de jî vegotin hest pê bike. Taybetmendiyan destpêkê yên vegotinê di tekstê de hest pê dike ku vegotina bûyereke yan çîrokekê ji naverokek pêkhatî ji cih û dem li ser binçîneyê hebûna destpêk û dawiyeye zelal.

Gelek dîtin hene li ser wê gelo vegotin çîye, wisan dike tekstek ji bo wejeya vegotinê dabirêje, çima tekstek dîrokî weke vegotin nayê danîn ku di heman demê de jî bûyerekê vegotin dike. Vegotin di teksteke wêjeyî de, hunandî yan pexşanî, berhem dibe dû amraz:

1. Bûyer yan Dîrok.

2. Vegotina Xweyî.⁷

Li vir jî di pileya yekem de mebest çawaniya vegotinê ye. Her mijarek an naverokek dikare bi gelek şêwazan bê vegotin. Helbet em ji vir ve li rastî mijareke din dibin ku jêre dibêjin şêwaz yan stîl yan jî hunera vegotinê. Nirxê wêjeyî û nirxê ciwanî di her kareke wêjeyî de ji vir diyar dibe. Vegotin her dem li ser zarê yekê

⁵ - Teşkek bo ser roman. Ebdulrehman Munîf, wergêr: Şîrîn K. weşana Serdem. Slêmanî 2006. R 86.

⁶ - Rxney(Rexney Romanî Kurdî) Fuad Reşîd, weşana Soran, Hewlêr, 2005.R 205.

⁷ - Geranewe le xeyalewe bo waqî, Eta Qeradaxî, weşana Serdem, Slêmanî, 2004. R93.

(Eve jî li gorî corê wêjeye û serdem diguhere.)⁸ Helbet li vir dibe, cûdahiyê bixin di navbera heskiriyên çîrok (hîkaye) û danerê pirtûkê, evane heman kes nînin. Eger li rûyê rexneyên Fenomenolojî cûdahî nake jî lê di navbera romannivîs û nivîskar de vegotinê bi xwe di nava tekstê de veşartîye. Ji bo em bikarînin di nava tekstekê de vegotinê destnîşan bikînin û şîrove bikînin, çend xaleke girîng hene, divê destnîşan bikin.

1. Li dûv hev hatina bûyeran.

2. Leza vegotinê

3. Ziman⁹

Ev her sê xalane ast, şewaz û corên vegotinê dipîvin. Ji bo her yek ji van xalane pêwîstî bi ser rawestandîna û şîrovekirina taybet heye.

1.2 Girîngiya Vegotinê

Mirov berdewam di nava qonaxa vegotinê de derbas dibe, vegotin serederiyên jiyane, çîrok, pend, metelok û serhatiyên dîrokî beşekin ku ji jiyana mirov hatine veqetandin. Wate, mirov berdewam girêdayî tiştê ye ku vegotin ji pêkhatiyên sereke ye. Bi bê vegotin wêneyê jiyane nabe. Di pirtûkên pîroz ên esmanî de û bi serhatiyên pêxember û çîrokên baş ji bo nûtirîn serhatiyên mirovayetî, vegotin şahdemar û movika piştê ya hemû bûyereke ye.

Nabe tiştê bê paşguhîstîna û girîngî di arastekirina bûyeran û gihandina peyaman de li berçav negire. Eşkereye ku ast û çawaniya vegotinê ji kesekê ji bo kesekê din ji goşenîgayekê ve ji bo goşenîgayekê din diguhere. Wate, vegotin her ewe nîne ku bi şeweyekî hêsanî û zimanekî sade bûyerê vebêje. Belku pêwîstê vebêj di vegotinê de jêhatîna nîşan bide di erkdarkirina tûxmê tam û xeyalê taku vebêj di heman tam û balkêşiyê de ji babeta vegotinê werbigire. Ji vê, ji bo me derdikeve holê vegotin hunere ne zanist e. Wate, dikarin bêjin vegotin yek ji girîngtirîn binemayên sereke yê hunera tekstê ya her çîrokeke ye, mercê sereke yê her kareke wêjeyî jî ta asteke mezin jî girêdayîye bi rêya ku keresteyên pêrêdixê û vedigerîne ji ber ku eve di wêjeyê de rû bi rûyê ew bûyerane dibe ku bi şeweyekî diyar û eşkere pêşkêş dike. Alan Rob Girê çawaniya vegotinê dike pîvana serkeftina karê xwe û dibêje: (Çîroknivîsê rasteqîne ew keseye ku dizane çawan çîroka xwe binvîsîne)¹⁰

⁸ - Hûnerî roman, Mîlan kondêra. Wergêr: Kerîm pereng, Weşana serdem, Slêmanî 2008.

⁹ - Geranewe le xeyalewe bo waqî, Eta Qeradaxî, weşana Serdem, Slêmanî, 2004. R67.

¹⁰ - Xeyal û roh, komelek nivîskar, weşana Serdem. Slêmanî, 2004.R 214.

Pol Regor jî vegotinê bi yek ji rêyên (afîrandina watenasiyê pêname dike.)¹¹ Piraniya rexnegirên biwarê çîrok û romanê tekezê li ser wê dikin ku vegotin girîngiyekî taybet heye di her kareke afîrandinê de yê li ser vegotinê. Ew vegotina ku wisan dike xwendevan li ser xwendina teksta wêjeyî berdewam be.

Xwezaya romanê û wêjeya vegotinê, xwazayeke ligel sînor, rehayî (mutlaq), take rastiyeke taybete û wisan dike bi rêjeya hêjmara wan romanên ku hatine nivîsandin, şêwaz û corên din ên vegotine hebe. Di romanê de eger şêwaz pêwîstî bi wê be zelal û eşkere nebe, ew mebesta romanê pêwîstî bi zelalî û eşkereyî yê heye, ji bo ku xwendevan bi baştirîn şêwe hest pê bikin, ku ewe jî ji bilî şêwazeke zelal ê vegotinê ligel ti tiştek din kare nake. (Di nava destan û romanê de hunerên vegotinê pirin û her hunerek vegotinê jî di nava teksta wêjeyî de erkek yan zêdetir heye. Girîngiya her yek ji hunerên vegotinê ji girîngiya amrazên din ên vegotinê kêmtir nîne. Weke, bi nebûna amrazekê yê vegotinê hest bi nebûna kêmasiya teksta wêjeyî dikin, ew bi nebûna hunerek ji hunerên vegotinê teksta wêjeyî kêmasî lê dikeve.)¹² Wate, di çîrok û romanê de kîjan ji amraz û tûxmên vegotinê ji ya din nîne. Belku hemû li gorî giranî û senga xwe rolê xwe heye di afîrandina teksta wêjeyê de, nabe pişt bi yek ji regezan girêbide û aliyên din bîn paşguhxistin.

1.3 Şêwazên Vegotinê

Dibe ku diyarkirina şêwaza vegotina destanê di çarçoveya wan prensîbên giştî de ku ji bo wê hatiye diyarkirin kareke hêsantir be. Di romanên de diyarkirina şêwaza vegotinê, roman amrazekê ji berê nivîsandinê ti prensîbek ji bo nehatiye diyarkirin, wê demê dikarin ji bo romanê prensîb diyar bikin ku qonaxa nivîsandina romanê temam bûye. Roman berevajiyê amrazên wêjeyî yên din prensîb jêre datîne. Lê jêre tê dîtin, dibe ku wê demê em vê pirsyarê ji xwe bikin û bêjîn destan jî di destpêkê de amrazek nebû. Prensîb jêre hatiye danîn. Dibe ku piştî Homeros destana xwe dinivîsîne piştî Arîsto tê û prensîbên destanê li ser wan berhemên Homeros datîne ku ligel wî baştirîn û bilintirîn corên wêjeyî bû. (Cûdahiya diyarkirina wan prensîbên Arîsto di berhemên Homeros de diyarkirî û kirî prensîb ligel wan prensîbên her rexnegirên din di her romanekê de tên dîtin.)¹³ Ew prensîbên Arîsto dîtin bûn prensîb û kesên piştî Homeros ew heman prensîb peyrew kirine ya baştirîn

¹¹ - Ledaykbunî muzik le rohî romanewe, Bekir Elî, weşana Çawdêr, Slêmanî, 2009. R 82.

¹² - Xeyal û roh, komelek nivîskar, weşana Serdem. Slêmanî, 2004. R 59.

¹³ - Xewnî Nwsîn, komalêk Nivîskar, wergêr: Dilşad Xoşnaw, weşana: Serdem. Slêmanî, 2008. R 112.

jî ew bû ku baştirîn şêwe li ser wan prensîban diçû lê ew prensîbên ku rexnegirên romanê dibînin tenê ji bo xwendevan yan rexnegir bi başî ji wê romanê têbigihin, ast û sînore wê diyar bike bi mercê prensîbên romanê ji romanê derbasî romaneke din nebin. Ji ber ku (romaneke din komek prensîbên taybet heye ku ji romaneke din cûda dike.)¹⁴ Biqasî hêjmara romanên cûda şêwaza vegotinên cûda ji hene. Her roman bixwe şêwaza xwe dibîne. Her ev şêwaza vegotinê jî dibe bi taybetmendiyan taybet yan romanê cûda dike ji romaneke din. Her dem nivîskarê afirêner li pey corek a vegotinê digere ku ji berê nehatibe bikaranîn, nû be ji bo xwendevan û wergiran. Gerana li pey şêwaz û stîla cûda, her dem karê afirêneran pê dibe. Ew romanên xwedî prensîbên nû bin di hemû waran de navdarî û serketineke mezin bidest dixin.

Dibe vegotin bixwe di dema vegotinê de bi corek ji coran derbikeve, ew ji bi afirandina hizir tê binav kirin. Qonaxek ji wan qonaxên ku kesê vegotinê dike bi xwe têde dîdîl dibe û di nava wan rastiyên ku têde jiyaye ligel wan kesayetiyên ku diafirîne. Ji bo vê mebestê ji rexnegirên Formalîsî yan Rûsî Tomas Fîskî şêwaza vegotinê bi ser du sisteman de dabeş dike. Her yekê ji yê din cûda dike. Bi vî rengî 2 şêwazên sereke ji bo vegotinê hene. Vegotina Babetî û Vegotina Xwe. Di sistema vegotina babetî de nivîskar agahdarî hemû tiştane. Her wiha hizirkirina veşartî ya mêrxwazan jî dizane. Ku çawan di sistema Vegotina Xwe de bi dîtina çavên kesê dike, şopên vegotinê dikevin yan pêwîstî bi ravekirina hemû agahiyên diyarkirî nîne û napirsîn ka çawan kesê vedibêje yan guhdar van tiştan zaniye. (Dibe ev du sisteme bînan diyar kirin, eve wateya wê ye ku vebêj dibe vebêjê hemû tiştan û peywendî bi vegotina babetî ve dike yan vebêjeke eşkereye ca çi vegotinê bi bernavê axaftinker be yan bernavê nediyar be.)¹⁵ Ev core vegotinane jî peywendî bi Vegotina Xwe ve jî heye. Nivîskar azade kijan şêwaza vegotinê hilbijêre, yekem car temaşeyî babetan dike yan jî çi şêwazeke ya vê çîroka xwe ku hêj ne nivîsandiye bixwe li ser kaxezê. Gelek caran roman xwe bi xwe stîla xwe dibîne, ji bo vê romanê divê her ev stîle vebêje yan ne serkeftineke baş bidest naxe. Niha li ser her du şêwazên sereke radiwestîn û cûdahiyên her du aliyan derdixin holê

¹⁴ - Romanêk le Giftugo de, Enwer Husên, weşana wezateta rewşenbîry, Slêmanî, 2006. R 67.

¹⁵ - Çend Wêstgeyekî Edebî, Komelêk nivîskar , wergêr: Ezîz Reuf. weşana Çawdêr, Slêmanî, 2008. R 204.

1.4 Vegotina Babetî

Bingehê vegotina babetî ji bo destanê vedigere. (Di vegotina Klasîkî de jêre dibêjin vegotina destanî yan jî vegotina raste rast.)¹⁶ Ji ber ku destan pişt bi vegotina hemû tiştan ve girêdide. Weke sedemeke gehînera di navbera karakter û xwendevan de. Wate, vebêjê hemû tiştan ku li derveyê bûyeran radiweste û bi rêya bernavê (cînav) kesê sêyem bi nediyar vegotinê encam dide. Serbestiyeke temam di cîbicîkirin, behs kirin û şîrovekirina bûyeran de heye. Bi xwesteka xweşiyê di nava hemû amrazên hunerî yê romanê de tevgerê dike û pesneke giştî dide cih û dem. Di vê şewazê de nivîskar destvekirîtir û azadanetir dikare hizrên xwe derbixe û deshilateke temam bi ser karakter û bûyeran de heye. Di vê şewazê de her dem vebêjek heye ku gelek caran cûdakirina ji nivîskar bi xwe jî zehmet e, agahdarî hûrgiliyên bûyerane. Di gelek romanên de bi xwe dernakeve lê xwendevan ji hemû tiştan têdigihin.

Şewaza vegotina romana "Grêweya bextê Helale" şewazeke babetiye, bi wateya vebêjê hemû tiştan derdikeve û komkirina romanê vedigerîne û agahdarê hemû çîrokê ye (Ew Çarenûsa Te ye Helale, dam ku xencerek çiya û çiya, bajar û bajar, welat û walat cihê te bikeve, heta vir, li Stoklomê, li taxa Filesmîngbergê, qata çarem, avahiya jimare 18 li sing bide.)¹⁷ Ev destpêka romanê ye, her ligel yekemîn hevokê de xwendevan dizane ji bo vegotina romanê şewaza babatî hatiye peyrew kirin. Gelek caran nivîskar ji bo bikare çîrokê ji hemû milan ve bibîne hewarê ji bo vê şewazê dibe. Di vê romanê de jî vebêj agahdarî hemû bûyerane, hem ewên ku li Kurdistanê diqewimin û hem jî ewên li Swêd û Stokolmê. Vebêj bi zimanekê bûyeran vedibêje weke ewe bixwe şahidê bûyeran be û rastiya bûyeran bi çavê xwe bibîne. Di bendek din de vebêj berdewam dibe (Wê rojê bû yan rojê din ku hema Hemereşîd Axa destê Şêrzad girt û bir bû mala xwe. Wê rojê di bîranîna Helale de weke piraniya wan rojên ku tiştêk wisan bû ku di bîra me de bimîne. Rengê cil û bergên Şêrzad ji rengên xweliyê bû.)¹⁸ Weke dibînin di vê şewazê de nivîskar agahdarî hundirê karakterane jî. Dikare xeyalên ku karakter dihezirin jî hîs bikin û biçê di nava bîranînên wan de. Wate, di vê şewazê de qet cihê namîne di çîrokê de

¹⁶ - Şary Deste u taqmekan, Şaram Qewamî, weşana Gilbirg, Sine, 2007. R 69.

¹⁷ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, weûana Renc, Slêmanî, R 7.

¹⁸ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 173.

vebêj nekare li hemberî wê berxwe bide û nekare bîbîne. Dibe ku hemû cih û hemû bûyer bi rêzê ve di bin çavê tîr ê (Hikayetxwazî) de hemû tiştan de derbas dibe.

1.5 Vegotina Xweyî

Vegotina xweyî di bingehe de ti rolekê ji bo vebêjê hemû tiştan nahêle. Di van corane de, bi rêya vebêjê û li pey cihê vegotinê dikevin. Ji bo ku eve ji bo me bê cih, bi rêya bernavê kesê yekem, ku ji derveyî bûyerê tên nava bûyeran (ji ber ku vegotin bi zimanê axaftinker ku karakterê sereke yê romanê encam dide, wisa bi me dike ku em jî êş û azarên mêrxwaz û karakteran hîs bikin. Her ligel wan jî tevî vegotinê bibin.)¹⁹ Di vî milî de Frîdman başî û bihêziya roman bi nemana vegotina babetî ve girêdide û tekezê li ser wê dike ku ne amadebûna vebêjê hemû tiştan, roman zindîtiye û bihêztir dike. (Ji ber ku di vegotina kesî de bingehe cor bi cor, firehdeng û firehnîgayî tên holê û ji bo karakteran jî derfet dest dikevin raste rast bîn pêşberî xwendevan û bandorê li xwendevan bikin. Ji bilî vê fireh dengî di vê şewazê de derfet dide bi amrazên din yê romanê ji bo kar ji bo hev bikin ji bo peywendiyên navbera wan bihêztir dibin.)²⁰ Bûye dibînin ku romana nû bi saya vê şewazê pêşketineke ber bi çav bi xwe ve dîtiye.

Di vê romanê ku bi vê şewazê hatî nivîsandin dikarin behsa romana Helîm Yûsif "**Gava Masî Tî Dibin**", ya Mardîn Îbrahîm "**Mergê Meymûnê**" û çendîn romanên din bikin. Nivîskar di vê şewazê de destvekirîtiye û azadiyeke reha (mutlaq) bi karakteran dide ta bixwe bînin ziman ne nivîskar yan jî vebêj li ser hizrên wan baxive. Ev core şewaze corek ê azadiyekê dibexşe bi karakteran û bilindgoyekê pêre dide da ku li gorî xwesteka dil balbikêşe li ser xewn, xeyal hêvî û hizirkirinên wan.

Ji bo mînak, di romana "**Mergê Meymûnê**" de hemû karakteran beşê taybet ê xwe hene ji bo vegotina çîrokên xwe, her karakter parçeya çîroka xwe ya ciyewaz vedibêje. Çendîn karakterên ku her yek bi cûda û çîroka xwe ya ciyewaz romanê pêktînin. Di yek ji beşan de Erdelanî çîroka xwe wisan vedibêje: (Min ji berê gelek bihîstibû û min xwendibû ku mirov kuştin weke heşîşkêşan jî wisane care yekem zehmet e.. Wekû xwarina ereqê jî her wisane. Min di hemû jiyana xwe de tenê yek

¹⁹ - Duazdah Name bo Romannwsêkî law, Marîo Bargas Yosa, wergêr: Şîrîn K. weşan: Paşkoş Çawdêr, silêmanî, 2008. R 25.

²⁰ - Cîhanî Roman, Haşim Ehmed Zade, weşana: Endêşe, Silêmanî, 2015. R171.

kes kuşt û dibe kesê dawiyê jî di jiyana min de ku ez bikujim.)²¹ Weke dibînin şêwaza xweyî lê digere her çi di hizra karakteran de ye bi bê sansor derbirîn û şerm ji hestên xwe nekin. Astengiyek nebe da nebêje bi azadiyane behsa jiyana tawankariya xwe nekiriye weke di mînaka jor de me dîtî.

Di romana "**Dema Masî Têhn Dibin**" de jî pişt bi şêwaza vegotina xweyî girêdaye. Lê di vê romanê de tiştên bê canan jî ji bilî mirov weke mar, se û lawirên din jî dikarin baxivin, rewş û jiyana xwe şîrove bikin. Ji bo mînak: Berek li ser sînor, marek di nava kaviyê xaniyekê de û deriyê teneke yê malekê. Hemû evaneyên di vê romanê de weke mirov xwediyê hizir û gotinên xwe ne. Eger bi vê şêwazê venebêje gelek zehmet e di şêwaza babetî de nivîskar bikare bi vê şêwazê derbirînê lê bike. Nivîştîya binçenga bi vî rengî behsa xwe dike: (Di hemû cihan de ew mela û şêxên nivîştî ji bo xelkê çêdikin, lê yê masî ew bû ku min ji bo çêkirî. Serê biska befrîn bi diyari pêre dabû li kevaleke sêgoşe aland, dirû û ez jê çêkirim, benek bi min ve kir û weke nivîştîyekê di bin binçenga xwe ve girêdam. Gelek agahdarî wê bû ku kes nebîne.)²² Weke dibînin ew nivîştî serhatiya xwe vedibêje û behsa wî kesî dike ku çawan ew çêkiriye û çawan parastiye, ev jî şêwaza vegotina xweyî ye.

1.6 Goşenîga û Corên Vegotinê

Dema behsa vegotinê dikan, ji bo behskirina me cewherî û zanistî be, divê mijara dîtina goşenîgayî be. Ji ber ku her çîrokek bi rêya dîtina goşenîga hatiye diyarkirin û pêşkêşî me dike. Di haman demê de peywendiyên vebêj ligel cîhanê û kesan şîrove dike. Her wiha romannivîs neçar dike dîtina goşenîga diyarkirî ku sîstema xwendinê jî diyar dike hîlbijêre. (Wate, behsa wan hemû taybetmeniyên dike ku peywendî bi vebêj û çîrokê ve heye. Ji ber girîngiyê jî li gorî piraniya rexnegiran nîrxê hîmê di romanê de ji dîtina goşenîga çavkanî digire.)²³ Ji bo vê ew goşenîgaye girînge ku romanivîs li wê name ji bo xwendevanan dişîne. Her dem ew goşenîgaye dibe pencereyek, xwendevan û wergir li naverokê binêrin, yan ji nivîskar bi çi şêweyek ji kîjan goşe ve derdikeve pêş û çîrokê radigihîne. (Dema romannivîs romanekê dinivîsîne, şêwaza peywendî û xizmayetî taybet bi xwe heye. Nirx û bihayên civakî bi xwe heye, ew xalên ku peyrew dike bi wan ve dijîn, hîs dikan ka çi

²¹ - Mergî Meymun, Mardîn Îbrahîm, weşana Endêşe. Slêmanî, 2015. R 93.

²² - Katêk Masîyekan Tînu Debin, Helîm Yusif, weşana Endêşe. Slêmanî, 2015. R 93.

²³ - Nîgakan, Azad Berzincî, weşan: Çawdêr. Slêmanî, 2008. R 57.

tişteki ji bo wan girînge.)²⁴ Ji bo vê êdî ku pirtûka nivîskar bilav dibe, êdî ti deshilatek li ser naverokê namîne, xwendevan jî weke organeke serbixwe temaşeyî naverokê dike û bi dîtina goşeyê taybet lê dinêre. Qonaxa dîtina goşeyê xwendevan ji wê destpê dike û êdî nivîskar ti deshilatek bi ser naverokê namîne û dîtina goşeyî ji bo wê romanê bi dawî dibe. Êdî hemû tişteki dikeve destê xwendevan. Eger teksta wate û balkêşên her tekstekê miri bin û li ser rûpelan bicih mabin, ew hewl dide ligel xwendevan rûpelên teksta xwe zindî bike û pêvajoya têgihîştina cûdahiyên xwendevan destpê dike û bêgûman bitevî goşenîgaya ciyewaz jî.

Divê nivîskar şewazek ji şewazên vegotinê hilibijêre û erkê vebêj bispêre yek ji corên vegotinê lê ewa girîng, ew dîtina goşeyî ya ku diafirîne. Wate, ew cihê ku nivîskar lê çavdêriya bûyeran dike ji bo vebêj bidîtina goşeyê xwe ve yan bi dîtina goşeyê keseke din ve ku rolê vebêj dilehîze agahdarî bûyer û kesayetiyên be û çawaniya pêşkêşkirin û pesinkirinê jê digire li ser milê xwe. Ji ber vê (di romanê de dîtina goşeyî yan dîtina cihanî gelek girîng e. Ji ber ku nirxan bi dîtina diguherin. Bi wateya hilibijartina dîtina goşeyî ku têde dîtina kesayet û bûyeran.)²⁵ Ew dîtina cihanî ya nivîskar ku em jî dibînin bi serhatiyên di nava romanê yan çîrokê de, wate nivîskar her çî di romanê de pêşkêş dike ji berê ku bûyer yan karakter û çîrok bin ew dîtina cihanî ya nivîskar hatiye diyarkirin jê hatin û çalaktiya nivîskar gelek caran hilibijartina dîtina goşeyî diyar dike.

1.7 Corên Dîtina Goşeyî ya Vebêj

Gelek caran dîtina goşeyî li gorî ew şewaza ku nivîskar bikartîne ji bo vegotina romanê, dîtina goşeyî diyar dike.

1.7.1 Dîtina Goşeyî ya Derve

Ew dîtina goşeyî ku vebêj ji derveyî teksta romanê ye, wate nivîskar ji derve karê vebêjîyê encam dide û dikare bûyeran, reftar û ya di dilê kesan de nîşan bide. (Di vê dîtina goşeyî de nivîskar bixwe têde derdikeve, digire û yek ji beşdarbûyên bûyerê nîne. Lê hemû tiştanê di vî warî de bi berjeng (sifet) a xwe afirêner li ser mikûr hatiye. Ew rêyên ji bo vegotinê bikartên, derdikeve ku vebêj hemû tiştî dizane û xwendevan hest bi kesayeta vebêj nake. Dîtina goşeyî ya hemû tiştan an

²⁴- Teknîky Gêranewe le romanî (Êwarey Perwane)y Bextîyar Elî de, weşan: Berêweberayeti Roşinbîry, Slêmanî, 2009. R 216.

²⁵ - Çend wêstgeyekî Edebî u Fikrî. Azad Berzincî, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2006. R

kesayetiye yan jî babetî ye.)²⁶ Vebêj weke şahidê bûyerê li ser bûyeran ku bi xwe jî amadeye. Lê gelek caran her xweşiyên xwediyê wê dîtina goşeyî, nivîskar diçe di nava hundirê kesayetan de û tiştên veşartî yên di nava bîr û hizrên wan de ji bo xwendevan vedibêje. Wisan li dîtina goşeyî ya derve dibe, kesayet bi xwesteka xwe sereberî pêre dike û hest û nestên wan ligel hest û nestên nivîskar cûdakirin zehmet dibe. Di vir de nivîskar û kesayetên di nava romanê de dibin yek û xwendevan nizane gelo ewa dixwîne dîtina nivîskare yan ya romannivîse? Di dîtina goşeyî ya derve de xwendevan nizane çawan danûstandin ligel romanê bike. Ji bo hemû tişt bi corek veşartî û nediyar dimîne ku nasandina bîrdoziyan ji bo zehmet dibe. Renge ev jî yek ji kêmsiyên dîtina goşeyî ya derve be.

1.7.2 Dîtina Goşeyî ya Hundirî

Vebêj ji hundirê naveroka romanê weke encam digihîne, di vê dîtina goşeyî de kesayetê sereke yan komek kesayetên nava romanê rolê vebêj dilehîzin. Wate vebêj û kesayet yek rolê dibînin, vebêj jî bi bernavê kesê yekem axaftinkerê "min" e. Li gorî dîtina goşeyî kesayetî Mişil Botor dibêj: "Bernavê (min) vediguhêze ji bo hundir, ev kesayetiye jî nikare ewa derbarê xwe dizane ji bo me vebêje."²⁷ Ji ber ku ew kesayetiye ya ku erkê vebêj pê hatiye spartin, nûnerê nivîskar e, tenê dikare ji derûna xwe ve temaşeyê bandorên ji derve bike. Nikare ji derveyî vî karek din encam bide û bigihê. Ev jî dîtina hundir ji bo naverokê zaniye yan jî dîtina tekstê, ewa bi wateya tekst bixwe tê temaşekirina bandoriyên derve, ka her çawaniyek be ji aliyê cor yan jî xwezayî û girîngiya wê ve.

Wate di vî corê dîtina goşeyî de, agahiyên vebêj ji agahiyên karakterên nava romanê de kêmtire û pitir pişt bi pesindayîne ve girêdide. Pesnê liv û tevger, dengê karakteran û her dem şiyânên wê yekê nîne derbasî hundirê karakteran bibe û bizane çî di dil û derûnê wan de heye. Çavkaniya sereke ya peydakirina zanyariyên vebêj, tenê her dû organên dîtî û bihîstinê ne. Ji ber ku vebêj bi rêya hîsan nebe, nikare ti tiştê pêşkêş bike. Tenê ew jî nebe ku dibîne û dibihîse, eger na qet rêyeke din li pêşiya me nîne ji bo bizanîn çî di dil û derûnê karakteran de digere. Lê li gorî Todorof: (Nezanîn û bê agahî nivçeyî ya hemû vebêjê kêmtir di vê rewşê de rêkdikevin û qet, eger na têgihîştin ji çîrokekê bi vê şewaz zehmet e. Ji ber ku eşkere

²⁶ - Rêbaze Edebîyekan, Hîmdad Husên, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2007. R 305.

²⁷ - Teknîky Goşenîga le romanekani Bextîyar Elî de, Mistefa Xiwatani, weşan: Awêr, Hewlêr, 2015, R 268.

ye ku ew romanên ku vî corî goşenîgayeke bikartînin di nîva duwem ya sedeya 20'an de li ser destê romannivîsên nû serîhildaye.)²⁸ Ew romanane jî ku diçin di nava vî alî de jêre dibêjin "Romana Şitêtî," ji ber ku di wesifkirinê de hest û sozên derûnî, tenê hinek ji amrazên bûyerê jî valeyîn û piraniya demê wesfa derve bê aliya karakteran û axaftinên wan dike, yan wesfê dîmenê hestên wan dike bi bê ku ti şîrovekirinek û daxuyaniyek a me pêşkêş bike. Ji bo vê xwendevan, van core romanane rû be rû yê komek tiştên şelo û nediyar dibin û divê şiyaneke zor bikar bîni û westandineke zor pêşkêş bike ta digihe bi amajekarek diyarkirî. Dema romannivîs goşenîgaya hundir ji bo vegotinê bikartîne ji bo wê nîne romannivîs jiyana taybet a xwe bigire dest û yadaşt bike, belku ji bo wê ye rê bi kesayetiya xwe bide ku bûyeran vegeftînin li gorî goşenîgaya taybet. Ji ber wê (vebêj axaftinker serederî kirina ligel bûyeran cûdaye ligel vebêjê nediyar, ji ber ku rolê rengvedanê yan temaşekirina bûyeran nagire, belku rolê çêkirinê jî digire bi wateyeke din vebêj ligel bûyeran radiweste nek li dawiyê.)²⁹

Ev jî wê nagihîne nivîskar dibê pêgirê yek ji van bernavane be, ji bo ji goşenîgeyekê ve karê vegotinê bi vebêj bispêre, belku ji bo wê heye her du corên bernavekê bikarbîne. Bi taybet dema li goşenîgaya hundir a kesayetê sereke "mêrxwaz" dinêre tenê dikare bîr û baweriya xwe bigire. Lê belê li ast, bîr û baweriya derûnî ya kesayetiyên din radiwestîne, di şiyane de nabe rê pê bide ji bo vegotina bûyeran, di vê rewşê de bernavê "ew" cihê bernavê "min" digire û nivîskar dibe alîkar û tevlî dibe ligel mêrxwaz ji bo pêşkêşkirina kesayetiyên din yê di nava romanê de. Wate, nivîksar bi sedema bernavê nediyar "ew" dibe vebêjê duwem. (Eve jî zêdetir ji wan romanên ku diqewimin ku take gotare, bi wateya yek deng bûyeran vedibêjin.)³⁰ Lêbelê di romana nû de goşenîgaya hundir, ew kesayetiya sereke (mêrxwaz) rê bi kesayetiyên din dide ji bo derbirîn û di şiyane de rolê vebêj û mêrxwaz bibîne, ewa firehdengiya vebêj di vê romanê de peyda dibe û rê bi nivîskar nade tevlî têde bibe û zemînê ji bo şaşitiyê saz nake.

²⁸ - Nusîn u Berpirsiyarî, Rêbwar Sîweylî, Çapî duyam, weşan: Renc, Slêmanî, 2006. R 81.

²⁹ - Teory Binyatî Şarawe, Necat Hemîd Ehmed, Weşana Aras. Hwlêr, 2008. R 3014.

³⁰ - Çemk u Îstatîkay Şwên la Edeb de, Sebah Îsmâil. Weşana Aras. Hewlêr, 2009. R 21.

1.8 Dem

1.8.1 Dema Vegotinê

Rexneya wêjeya hevçerx weke yek ji amrazên pêkhênerê her tekstek wêjeyî û bi taybetî jî roman, girîngiyeke mezin bi 'dem'ê dide. Di rastiyê de hîç yek ji wan amrazên ku romanê pêktînin weke dem bi vegotinê ve girêdayî nîne. (Ji ber ku vegotin li gorî demê nayê afirandin. Girîngî dayîna bi demê di qonaxa vegotinê de ji wê çavkanî digire. Her tekstek xwe bi xwe teksteka dem fireh mijar û fireh alî heye.)³¹ Her ev girîngiye jî wisan li rexnegiran kiriye, ku weke peyameke asayî li demê nenêrin. Belku bi aliyên ve dem roman bi xwe ye.

Ya zelal û eşkere di pêvajoya vegotinê de herdem du demên me hene. Dema hîkayetî û dema vegotinê. Dema hîkayet yan dema romanê. Ew demên ku têde bûyerên romanê bi şeweyeke yek li dûv yek de hatînin diqewimin. Her çî dema vegotinê ye, ji wan demên ku têde vegotina bûyeran rêkdixe û vedibêj pêktê. Hêjayê gotinê ye di dema romanê de herdem ji berê dema vegotinê derdikeve, wate eger dema romanê nebe, dema vegotinê jî nîne.

Sadetirîn şewê di şeweyên hîkayetî de, şeweyê seretayîye ku her ji demên kevin ve jî hatiye peyrew kirin û bîrîtiye ji wê yaku bav û bapîr rûdinin û bi şeweyeke yek li pey yekê hatiye li ser yek xetê ku hîkayetan ji bo zarokan vebêjin weke çîrokên li ber agir. Ligel van jî piraniya vebêjan hest bi girîngî dîrxistina ji zincîra dema bûyeran kiriye. Ji bo vê dibînin destanên kevin di nîva bûyeran de destpê dike. (Weke destana Odesa ya Homeros, di demekê de destpê dike ku şerê Truwa temam bûye û mêrxwaz di rêya vegeerê de ye ji bo warê xwe.)³² Eve jî wateya têkdana zincîra demê bûyeran yan dema romanê ye ku di rastiyê de kareke hêsan nîne. Dibe ku pêwîstî bi jêhatin û kûrbûna nivîskare di wî karê de.

Diyare nivîskarên Şepola Hiş yekemîn kes bûn ku ew şewaza di romana nû de şikandin, peyrewa dema derûnî û bazinî parçe parçe kirin. Ku di yek demê de refer ligel borî, niha û demê bê de dikir. Ev jî bala Formalîstên Rûsî kêşa li ser xwe. Ji berê hemûyan jî Thomas Fisk ku zaraveyê 'dema hîkayet' ê afirandiye.

³¹ - Şunasî tewewnekraw, Edonîs, wergêr: Newzad Ahmed Eswed, weşana paşkoy Çawdêr, Slêmanî, 2008. R 64.

³² - Lenaw bazney deq da, Semed Ahmed, Weşana Wezarata rewşenbîry, Slêmanî, 2003. R 23.

Ji bo ku bizanîn romannivîs çawan serederiyê ligel wê şewaza jor dike, divê 3 xalan li berçav bigirin ku Mario Bargas Yosa di pirtûka xwe ya binavê 'Dazde Name Ji Bo Romanivîseke Ciwan' de behs kiriye:

1- Divê dema vegotinê û dema yê vedibêj cot bin. Yek dem pêktînin, di vê rewşê de vebêj firmana dema borî bikartîne ku ji bo dema niha derbas nebûye

2- Divê vebêj bi zimanê derbasbûyî bûyerê bigire dest ku di niha û bê de diqewimin.

3- Vebêj dikare biçe 'niha, borî yan jî dema bê' ka bûyeran ji bo me bigre dest ku di boriyê nêzîk de qewimîne.³³

Her çend dibe ku ev cûdahîye ku bi tenêti hatî amade kirin hinek aloz û giranî derbikevin, lê beşê wan êşkere ne. Dikare bi hêsanî werbigire. Her wisan di demê firmanê (ji aliyê rêziman ve) hûrgilî bûn, ew firman vebêjê çîrokê vedigerîne ew bi hêsanî şewaza bikaranîna dema çîrokê xwe ji dest dide û xwendevan dikare corê wê destnîşan bike.

Ew di hizra me de ye, ew jî hest pê dike, ew dema asayî ya ku em hest pê dikin sê core: Dema Niha, ku girîngtirîn deme ji bo mirov. Dema Derbazbûyî, ku em yan jî pêşiyên me têde jiyane. Dema Bê, demeke nehatî zanîn û hest pê nehatiye kirin û dibe ku piştê jî bê. Eger çi di warê hizir û di wan dîtinên ku li beramber demê de hene hevberîyekê temam nîne li ser çawaniya hebûna dem. Lê piranî li ser wê kokî ku (Dem heye û hebûna wê jî rastiye, bi şeweyekê dikarin jê agahdarin bin û di hemû diyarde, bûyer û rastiyan de hest pê dikin.)³⁴ Em di cihekê de dijîn, dem û cih jî herdem ji hev nayên qût kirin û her yek jî temamkerê yê dine. Her wiha (Dem nîşana guhertin û cih jî nîşana çespanîne ye.)³⁵

Dem wateya çemkeke rêjeyî werdigire û rast ligel felsefeya nû û felsefeya meteryal digunce. Her tiştek şiyana guhertinê hebe, şiyana mayîne jî heye û girêdayî ji nav çûna tiştek din ve nîne. Weke ewa îdealan bawerîyan pê hebû, berdewam li mirovbûnê nîne û tenê di hizra mirov de hest pê dike û dema ku mirov ji nav çû wê demê jî namîne. Her wiha eve jî wisan li fîlozofên îdealîstan kiriye çemkê demê ligel

³³ - Duazdah Name bo Romannwsêkî law, Marîo Bargas Yosa, wergêr: Şîrîn K. weşan: Paşkoç Çawdêr, silêmanî, 2008. R 92.

³⁴ - Çemk u Îstatîkay Şwên la Edeb de, Sebah Îsmâil. Weşana Aras. Hewlêr, 2009. R 48.

³⁵ - Fantazîyaî Gêranewe, Eta Qeradaxî, weşana Serdem, Silêmanî 2008. R 74.

çemkê heqîqetê dûr bigirin. Rehayiyê bidemê bidin. Li gorî wan heqîqet ji derveyî demê ye, tiştê ezeliye. Lê Meteryalist demê bi xwe bi ezel datînin. Bradlî dibêje: (Dem ne heqîqete û ne alîgirê heqîqetiyê ye jî.)³⁶ Lê eve egere ji bo tiştên rasteqîn û metefîzîkî rast be ew ji bo mirov ku "gelek caran wisan hest dikin ku xwe bi rêya dem dinasîn." ti sûdê nade me, ji ber ku em xwenasîna me çavkaniya xwe ji dem digire û girîngtirîn tiştê jî di jiyana mirov de xwe nasînti ye.

Di çarçoveya girîngî dana bi rêxistina dema bûyeran, li gorî Forster çîrok vegotina wan bûyerên ku ji aliyê demê ve bi zincîrekê bi hev ve girêdayî hatiye. Lê Mîşîl Botor 3 dem destnîşankirîye. Dema nivîsînê, dema serkêşî û dema nivîskar. Gelek caran jî dema nivîsandinê bi rêya dema nivîskar, di dema serkêşiyê de reng dide. Bi vî rengî nivîskar kurtiyekê pêşkêşî me dike ku di dema du deqîqeyan yan ji demjimêran dixwînin. Her çende bûyerên wê kurtiyê dikare du roj yan zêdetir qewimî be. Berûvajî jî dibe ku bûyereka di çend deqîqeyan de qewimî be ku vegotina wê çendî demjimêr yan çendî roj bidome.

Samoyl Aleksander tîkildarî çemka dem û corên wê gotiye: (Dem du core, Dema Hiş û Dema Xwezayî.)³⁷ Paşê tekez li ser wê yekê kiriye ku dema yekem rengdana dema duweme.

Wê demê ew hişê ku heye û hest pê dikin ji (peywendiya pêşî û paşî çêbûye ku du corên xweyîne û dixin li ser demê)³⁸. Li vir pêşî ew dema ku borî û paşî jî ew deme ku tê, çavkaniyan her duyan jî hişê mirove û ew dema ku niha têde ye.

Yek ji berjengên herî diyar û neguher ên pêşî û paşî ewe ku her dem lihev nakin, ji ber ku dem dûbare nabe û heta di demê bê de borî biçe nav dema bê yan bibe demeke bê ya din.

Eve eger ji bo jiyana rojane û wê demê rast be ku em hest pê dikin, ewe dibe di berhemê wêjeyî de bi wî şeweyî nebe û bi sedema sîstema tîkşikandina demê û ew teknîkên ji ber demê çêbûyî û di nava tekstên wêjeyî de bikartên. Ev kare ji hewldanê bû kareke kirdarî. Dem xwedî berjengekê ye ku (ji hemû tiştêkê zêdetir di bin deshilata xeyal de ye)³⁹. Ji bo wêjeyê yek ji amrazên herî sereke hebûna xeyalê ye ku her dem bûye sedema berdewamî û nemirin bêbexşîn û cûdakirin ji mijaran.

³⁶ - Ziman, Edeb û Nasname, Haşim Ehmedzade, Weşana Aras. Hwlêr, 2012. R 59.

³⁷ - Fantazîyaî Gêranewe, Eta Qeradaxî, weşana Serdem, Slêmanî 2008. R 127.

³⁸ - Goran û Nîma Yûşîc, Ebûbekir Xoşnaw, Weşana Wezarata rewşenbîry, Slêmanî, 2008. R 264.

³⁹ - Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî, Îzaddîn Mistefa Resul, weşan: zankoy Slêmanî, 1982. R 82.

Bûye hemû amrazên wêjeyî karîne bi baştirîn şêwe xwe ligel dem û guhertinên demê biguncîn û herdem demê weke amrazêke sereke temaşe bikin. Bi vî corî dikarin dema vegotinê bi vî rengî dabeş bikin:

1.8.2 Beşên Dema Vegotinê:

1- Dema Dîrokî: Ji wan dem û wextên ku têde bûyer diqewimin pêktê. Piranî jî di romanên klasîkî de bikar hatiye, ku romannivîs wisan lêhatibû gelek bi hûrgilî behsa dema bûyeran dike. Weke sal, meh û roj tenê hinek çaran behsa demijmêra qewimîna bûyerê dikir. Ji bilî wê jî divê dema bûyeran bi şêweyeke zincîrî bi hişmendiya xwedî destpêk, naverast û dawî biçe. Li cem romannivîsên nûjen jî em core demane raste rast hinek car jî ne raste rast bikar tê. Lê di romana **(Grewî Bextî Helale)** de, heta dawiyê çend carekê ev core demane hatiye bikaranîn. Ji bo mînak; (Rojekê ewê gotî pêkve diçin ji derve, roja yekşemê bû, şeva pêştir Helale bi telefonê jêre gotibû spêdê serê demjimêr 10 li navenda bajarê li rawestgeha şemendefîran li benda te dimînim. Sibê demjimêr 10:30 ku hev dîtibûn.)⁴⁰

2- Dema Derûnî: Ev core deme pitir di romanên herikîna hiş de bikar hatiye yan ew romane ye ku aliyê derûnî heye. Di vî core demê de zincîre dema vegotinê ji rûyê dîrokê ve bi şêweyeke nerêkûpêk û nehiş têk dişkîne. Teknîka pêkhênerên vê demê ji (bîranîn, metelok, xewn û xeyan pêktê.)⁴¹ Her wiha pîvana vî core demî kareke hêsan nîne. Ji ber ku li gorî rewşa derûnî karakter kurt yan dirêj dibe. Dema derûnî alîkariya xwendevan dike ku di nava hişê karakter de biçe xwarê. (Her wiha alîkariya nivîskar bixwe jî dike ku soz, xeyidîn û helwesta karakteran weke çawan di jiyana rojane de diqewime her bi wî şêweyî jî nîşan bide, weke komê bûyerên cûda cûda ber belav.)⁴² Wêne girtina dema derûnî bi hûrgilî û jêhatî, karek gelek giran û erkeke zor jî dixê stûyê xwendevan, ji ber ku westabûneke zor divê ji bo şopandina bûyeran. Divê wê jî bêjîn, dema derûnî di hunerê de û bi taybetî jî di romanê de ji hemû corên din dem girîngtir e.

⁴⁰ -Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, weûana Renc, Slêmanî. 2007. R 137.

⁴¹ - Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî, Îzaddîn Mistefa Resul, weşan: zankoy Slêmanî, 1982. R 42.

⁴² - Şwnas u Alozî, Merîwan Wirya Qanî, weşana Rehend, Slêmanî, 2004. R 157.

1.9 Girîngiya Demê di Tekstên Wêjeyî de

Ji ber ku dem girêdayîye bi jiyana mirov û qonaxên temen ve, ew jî wisan kiriye dem bibe doza hemû tişteke zindî ku dengvedaneke girîng hebe. Ne tenê di helbest, çîrok, roman û heta di şepêlên wêjeyî de jî bi şêweyekî giştî dem di romanê de cih û rol hem di pêkanîn û hem jî di wateyê de heye. Hemû tekstên wêjeyî bi wî rengî hatine behs kirin, di bûyerekê de hemû bûyer jî destpêk, naverok û dawî heye. Eve li pey yek hatine jî ji derbasgeheke dîrokî demî pêktê. Her çende cih çarçoveyeke serekeye ji bo bûyeran, di hamahengiyê de jî dem pêdiviyeyeke di bûyeran de û di çarçoveyek de bi hev ve girê dide û li pey hev rêk dixe.

Yek ji wan taybetmendiyan bihêz ku teksta wêjeyî li xwe digire ewe ku çemkên dawiyê ji bo cor û wateyê bicih dihêle. (Ji ber ku teksta wêjeyî di binçîne de bawerî bi hebûna çemka sînordar, dawî ji bo wate û balkêşandin nîne.)⁴³ Ji ber ku vekirineke bê dawî û pêkhateya hilweşandinê heye û li ser bingehe asoya nû û asta livîna tekstê şîrovekirinên wê werdigire.

Dem bi xwe baldariya dem û guhertinane, ji ber ku tiş ligel tekstên wêjeyî jî pêwîstî bi deme û xwediyê demê jî pêwîstî bi rêkxistinê heye. Ev rêkxistin jî mirov wisan tîne li ser hizirkirinê, gotûbêj û aramiyê.. Evane jî kar li ser tamamkirina tiştan dike, wate peywendiya wêjeyê jî bi demê ve û peywendiya mirov jî bi demê ve heye.

Armanca çemka demê di tekstên wêjeyî de (ew amrazên serekeyane ku pal didin bi amrazên hunerî ji bo livandin û geşekirina hemû bingehe hunera romanê, ji ber ku weke fezayek hemû pêkhate û amrazên din têde diyar dike.)⁴⁴ Ji ber ku romana her bûyerek pêwîste bi wê dema ku têde qewimiye, bi sedemê çawaniya rola aliyên din di cihê erk û peywendiyên bi demê ve tê xwendin. Zimanê wêjeyê her wiha bi asanî xwe ranabe, ji ber ku ne derbirînek yek wateyî ye. Dibe ku wateya pir û pir alî hebe, hinek caran wisane peyvek zêdetir di wateyekê de li xwe digire. Di wateya rasteqîne de û xwesteke û wata amajekar jî di navbera amajepêkiriye rastî û xwestekî binyad datîne. (Ziman çawan bixwaze, wisan kar bike û cih dike û ji cih ber bi demê ve diçe.)⁴⁵ Dem jî wisan lê dike ku nîşan be ji bo cih. Ziman dikare rolek bibandor di vî cihî xwazeyî de hebe.

⁴³ - Pêkenîn u Bîrçunewe, Mîlan kondêra, wergêr: Awat Ehmed, weşana: Serdem. Slêmanî, 2002. R 61.

⁴⁴ - Derbarey Eqlî Morêrn, komelêk nivîskar, wergêr: Awat Ehmed u Azad berzincî, weşana: Serdem. Slêmanî, 2004. R 96.

⁴⁵ - Menfa u Xwêndnewe, Twana Emîn, weşana Çawdêr, Slêmanî, 2008. R 218.

Bêgûman dem û cih ji ziman venabin û têde her dem, eger wisan dane ku jêdibin, ew ji dem û cih namîne. (Ziman bikaranîn jî ligel dem û cih binyata axaftin wate derxistinekê datîne.)⁴⁶ Her bi wê jî wate dide axaftinan. Ji xwe eger ziman tenê weke dem, yan tenê weke cih temaşe bikin, wê demê aliyê peyrewayetiya wê şaş dibe û ji wê yekê derdikeve ku şiyana guhertina bîr yan gihandinê bimîne. Wate hebûna ziman ji van her du aliyan ve hatiye behs kirin û her evê jî wa kiriye ku di yek demê de bi du hêma û dû nîşan bihêjmêr e. Dişê di çîrok yan romanê de dem bi cûda tevger bikin, her yek ji van demane peywendî bi nivîskar, tekst, yan xwendevan ve hebe. Lê ew dema ku cihê baldarî û lêhûrbûna dema derûnî û dema xwezayî nînin.

Hemû çîrok, roman, şanogeriyeke xwediyê demê xwe ne û hemû pişt bi pêşkevînekê girêdidin ku ligel guhertinên demê bigûncin. Her çende hinek aliyên wêjeyî bi şêweyê sereke pişt bi bingeha demê girêdidin. (Ev girîngîdane bi demê wê derdixê holê ku îro di nava teksta wêjeyî de bi bê cûdahî û li ser asta cîhanê, dem girîngiya xwe heye, ne tenê di romanê de, yan her tekstek û berhemek din, eve jî dem rolek girîng di nava wan berheman de heye û di niha de dîrok û girêdangenek rewşenbîrî û jiyana e.)⁴⁷ Dem di ezmûna dîrokê de berdewamiye, destpêkeke û ji dawiyê nayê birîn. (Destpêk rêgeha dem û jiyana ye, dawiya wan jî yekîtiye, di destpêkê de dibêje dawiya min, di dawiyê de jî dibêje destpêka min.)⁴⁸

Di tekstên wêjeyî de, nivîskar dikişîne li ser hestên hundir. Bûye divê di hemû ew tiştên lêbinere de ku em hest pê dikin yan nivîskar li gorî deman hest bi guhertin û hevguhertina rewşa xelkê dike. Bi vê jî peywendiyek derûnî ligel tekstê çêdike û guncandineke demkî ya derûnî tîne holê.

1.10 Cih û Rolê Cih di Vegotina Romanê de

Girîngî dana bi cih di romanê de dîrokeke kevnar heye. Ji kevin ve romannivîsan girîngî bi cih û zîndîkirina wê daye, wesfa xwezayî, pêkanîn, alavên

⁴⁶ - Rwange u Yaran u Neyaranî, Husên Arif, weşana: Serdem. Slêmanî, 2005. R 174.

⁴⁷ - Bîry rexney Hawçerx, komele wtar, wergêr: Newzad Ehmed Eswed, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2001. R 82.

⁴⁸ - Pêkenîn u Azadî, Mîxayl Baxtîn, wergêr: Bextîyar Secadî, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2008. R 13.

avî, lê bi şêweyek giştî li gorî serdem, qonax û corê romanê guhertin bi ser girîngî dan bi cih û şêwaza zindîkirina wê de hatiye.

Di nava teksta Îngilîzî de li ser destê Danyel Dîvo, Rîçard Son û Hinrî Fîliniç piştgiriya romanê û geşeya romana Îngilîzî dikir, ku ronahiyê dixê li ser cih û wesfê xwezayê dikir. (Divo yekem kes bû ku jîngeha cihê karekteran zelal dikir. Bi rêya encamdana corek ji peywendiya organî di navbera karekter û ew jîngeha ku têde tevger dike. Richard Son jî bi pêngavekê ev hewl pêş ve bir.)⁴⁹ Li ba Fîlindnîç wesfa jîngeha xwezayê gişhişte rêjeyê zor. Armanca vê diyardeyê jî li ba navborî bexşîna wêneyê rastî karê wan bû, zimanê nivîsandina tekstên wan jî têde wesfa cih û pêşkêşkirina cih, bi zimanek sade û hêsan bexşî bû, dûr li dirêjkirinê û xemilandina lehîstina bi peyvan derxistina şîyan ziman, ji ber ku ziman li ba faktora gihandinê ve bû ne amancek bû bi xwe.

Di sedeya 19'an de, ku sedeya çîrokane, sedeya hewldanê bû ji bo temamkirina qalibê temam ê hunera romanê, yek ji herîkana diyarên romana wê sedeyê ye ku girîngî da bû bi cih. (Romanivîsên wê sedeyê, wê cîhanê hestên gelek hûrgilî û bibaldar zindî dikirin ku karekter û bûyer li xwe girti bû.)⁵⁰ Stindal û Belzak girîngiyek wisan didan jîngehê û wênekeşana ku gelek rastiyan nêzik dikir. Baştirîn şêwazê zindîkirina cih jî ligel wan wesif bû.

Armanca sereke ya ezmûnên Stindal, Emîl Zola, Floberd, Belzak û nivîskarên Rûsî gihandina romanê bû bi asta temam, ji aliyê avakirina hunerî û hemû aliyên din ve jî ta astekê jî encamê ezmûna wêjeyî de karîn ji giyanê destanê û xûdawend Homeros dûr bikevin û tişk bixin li ser civak û peywendiyên civakî. (Weke wêne girtina cih û tiştên avî û wesifkirina wan ji aliyê Floper û Belzak ve.)⁵¹ Bi taybetî Belzak dema wesfê cih dikir û tişt bi hûr û baldar û dirêjî wesif dikir. Armanca wesifê jî liba dîtinan xwendevanan bû ji bo hemû ew dîmen û bûyerên ku di romanê de xistine rû. (Belzak yekem kes bû ku xwendevan dixite nava wê cîhana pêşîneyek taybet ji bo cih karekteran pêşkêşê xwendevan dikir.)⁵² Rastgeran jî rêya Belzak şopandi bûn, çend rûpelek di destpêka romanên xwe de ji bo wesifkirina cih

⁴⁹ - Marîfa u Îman, Hêmin Qeredaxî, weşana Endêşe, Slêmanî, 2012. R 38.

⁵⁰ - Modêrnekan, Ramîn Cehanbeglu, wergêr, Azad Berzincî, weşana Serdem. Slêmanî, 2003. R 179.

⁵¹ - Surrî Mana, Nezand Begîxanî, weşana Renc, Slêmanî, 2008. R 75.

⁵² - Mefhum El Mekan Welzeman fî Felsefa El Zahîra wel Heqîqe, Muhemmed Tofîq, Munşa El Mearîf, El Eskenderîye, 2003, R 50.

vediqetandin. Ev diyardeye berevajiyê romanên klasîkî bi çend şêwazek ne sereke behsa cih dikir bi şêweyekî giştî wesfa cih dikirin.

Wesifkirin di romana waqî de, erkeke berçav û girîng heye, li ser destê hunermendên bikar weke Belzak û Flober gihiştine wê demê ku armanca dekor û destnîşankirina çivarçove, wênegirtina şêweyê fizîkî ya palewan û karakterên sereke bû. (Danîna tiştên giran jî bi vî şêweyê hûr, cîhaneke serbixwe ava dikir, ew cîhane ku dubareya hevşêweye ligel cîhana waqî dikir, di rastiye de bûyer û peyv, ew tevgera ku nivîskar wê çarçoveyê pê dadigirt.)⁵³

Gostaf Flober jî gelek bi baldarî ve serederî ligel cih dikir, wêneyeke gelek diyar û xwezayî, cih û wêne binesaziyê pêşkêş dikir, bi corêk ku xwendevan tirsê waqîbûn û dîroka cihan liba çêdibû. Romana Madam Bovarî belgeya vê rastiye ye. Emîl Zola wêneyê cihan dikêşe pêş dest bi qonaxa nivîsînê bike. Hinrî Ceyms di romana destpêkê de ku di bin bandora Belzak de nivîsî bû, wesfê mal û dîmenên siruştî dikir. Di romanên dawiyê de hewarê ji bo wesfê dîmenan dibir her weke çawan dibînin bi şêweyê balkêş û hêmadar.

Romannivîsên wê sedeyê bi giştî û bi taybetî Balzak gelek caran zanyariyên girîng û belgeyên derbarê cihê sereke ku bûyera romanê têde diqewime pêşkêşê xwendevan dikir. (Çend jî karakteran cih biguhertiba, zanyariyên nû derbarê cihê nû de dixist rû. Ev ji bilî destpêka romanên xwe ku bi wesfê karakter û cih destpê kir.)⁵⁴ Belzak navdartirîn kes bû ku teknîka destpêkê bikaranî û distûrên wê darişt. Ewên li dûv wî jî hatin heman rêbaza wî bikaranîne. Babeta destpêkê bû cihê girîngî pê dana nivîskaran û çend rûpelek di destpêka romanên xwe de ji bo wesfê karakter û cih pêşkêşkirina borî vediqetandin. Ji bo pêşgotinekê bide xwendevan bikêşe nava cîhana taybet a romana xwe. Di romanên waqî de ev destpêk beşeke girîng danaye û herîkîna çîrokên xwe li ser rêkdixistin.

Her çend di vê sedeyê de roman di wêne girtina jiyana karakteran de nekarî xwe ji zend û bendên demê rizgar bike, ji bo mînak di romana destanî de wek ("Şer û Aştî" ya Tolstoy, "Bêsemyan" ya Victor Hugo û di romanên civakî de weke "Madam Bovarî", "Filomêr" bi berhemên Belzak û di romana derûnî de "Tawan û Ceza" ya

⁵³ - Gêranewe le Romanî Xewnî Pîyawe Îrannîyekan, Haşim Serac, Raman, jmare 114, Hewlêr, 2006, R 107.

⁵⁴ - Dijî Bêdengî, Rêbîn Herdî, weşan: Renc, Slêmanî, 2001. R 94.

Dostoveski, mirov di van romanene de candarek bi tevgere di nava demê de, cih jî têde ciwankariyeke girînge di nava demê de.)⁵⁵

Di romana Klasîkî de nivîskar hewl dide cîhaneke cih girtî ku guhertinê napejirîne pêşkêşî xwendevan bike hemû ew tiştên ku pêşkêş dike sedemekin ji bo sedeman. Peywendiyêke hişmendî tund bi hev ve girêdide, weke ew romannivîs di pencereyeke teng re temeşayî cîhanê bike. (Ew wê dibîne ji karakter û bûyer û ewên tîn dîtî pêşkêş dike. Ev jî wisan lê dike şewaza wesif û vegotina hundir bikarbîne.)⁵⁶ Hemû ew rastiyên ku yên xweyî ku hene li paş cîhana dîtîne ve ku dikare bi rêya dîtîna hundir bigihê û paşguh dixê.

Di dawiya sedeya 19'an de di encama şoreşa girîng a romanê de ku ta dawiya şerê cîhanê yê duwem ajot, di cîhana romanê de dîtîna nestî mirov û derketina dibistanên derûnî derketin holê, (piştguhixistina cîhana derve û veguhestina arasteya romanê bû ji bo hundirê mirov, hundirê mirov bû şanoya mezin û temam veqetiyayî ji cîhana derve.⁵⁷ Bi giştî romanên dibistanên ku dem û cih bandoriya wan nîne, bi giştî hatine paşguhixistin. Di dibistana herîkîna hiş de jî ku şaxek ji şaxên dibistana nestîye ev gerdûna mezin ku mirov têde dijî dibe hiş û hebûna hundir, cih jî babet nîne û hatiye paşguhixistin.

Di dibistanên romana nû de di encama veguhestina şanoya bûyeran ji hundir ve ji bo cîhana derve girîngî bi cîhana derve daye, divê dibistanê de cîhana derve hebûneke serbixwe heye ji hebûna mirov, pîvan di romana nû de tenê kiryar ne mirov e di tiştêkê de belku demeke kiryarî têdeye, ew role girînge û tirsî wî ku cîhana derve vedigere weke maddeyeke bingehîn di hunera romanê de. (Evê jê wisan li Alan Rob kiriye û aligirên dibistana romana nû zend û bendên demê dişkînin û cihê wê li cîhanê danin ji ber ku hebûna tiştan di cih de diyartir û selmandîtire ji hebûna demê.)⁵⁸

Li gorî vê dîroka romanê ku xistiye rû, cih di wêjeyê de dîrokek a xwe ya dirêj heye û li di sedeya 19'an de li ser destê Belzak û hewlên wî de bûye amrazek ê çîrokan bi wateyekî din jîngeha romanê bû pêkhênerê bingehîn di amrazên hikayetî de.

⁵⁵ - Gorc Lokaş, Îmbrî Gorc, wergêr: Mensur Teyfurî, wezaretî Roşinbîry, Slêmanî, 2004. R 173.

⁵⁶ - Teknîk le Kurte çîrok de, Azad Mhammed, Wate, jmare 3, Hewlêr, R 53.

⁵⁷ - Nersîsî Kujraw. Bextîyar Elî, weşan: Endêşe, Slêmanî, 2015. R 315.

⁵⁸ - Endêşe Cwanekan, Reuf Hesên, weşan: Roşinbîry, Hewlêr, 2005. R 58.

Di derbarê romana kurdî de jî her di (Destpêka sedeya 20'an de morkî Riyalîzmê bi aşkira li ser diyar e.)⁵⁹ Di aliyê zindîkirina cihê waqîf de ku yek ji sîmayên romana Riyalîzmê, zindîkirina cih bi mebesta zindîkirina waqîf û jîngeha karakteran çawaniya jiyana rojane ya cihê niştecihbûna wan, (ji ber ku ew karakter mînak û rengdaneya çendîn çîn û nişên civakê ne, her weke çawan di romana Realîzmê de tomar kiriye, nivîskar hewl dide wêneyeke rasteqîne yê waqîf tomar bike û ronahiyê bixe li ser hemû beşên hûr ên jiyane bi tevî cih.)⁶⁰

Di romana Kurdî de her dem zindîkirina waqîf ya jiyana Benî Adem wêne girtina waqîf rewşa civaka Kurd û jîngeha rasteqîne ya karakteran, babeta sereke ya romana Kurd bûye, dikarin bêjin romana Kurdî di destpêka serhildanê ve ta niha zêdetirî bergê realîzmê poşîye. Wate çavkaniya romanên me zêdetir waqîf, civakî babatên sereke yên romanê ne û têde hewl jî dane jîngeha karakter û meydana bûyeran diyar bike, hinek car jî romannivîsên Kurd ew sînor derbas kirine ku tenê cih şanoya bûyer û karakter bin. Belku amraza hunerî tevî avakirina romanê bûye.

1.11 Corên Cih di Romanê de

Rexnegir di diyarkirina corê cihê romanê de û di navan de ji hev cûda dihizirin. Her yek ji aliyekê ve yan jî li gorî ew romana wergirtî ji bo lêkolînên xwe, cihê romanê dabeş kiriye, lê em di vir de ew cihên gelek dubare dibin li cem romannivîs û rexnegiran gelek bikartên ronahiyê dixin li ser.

1.11.1 Cihê Waqîf:

Cihê waqîf, wêneyeke wekheve ya cihê rasteqîne. Li ser zeviyê hebûneke waqîf heye û dikare bibîne û biselmîne. Cihê diyarkirî bibîne, yan li cihê cografî yan di cihê dîrokî yên kevna de, lê nikarin bêjin wêneyeke tekst û tekst cihê waqîf ye, ji ber ku cihê tekstê cûdaye ji cihê waqîf. (Ev cihe xeyaliye bîngehê taybetî û dûrî diyar ê xwe heye. Cihê roman jî waqîf be yan xeyalî be her cihek rasteqîne nîne û ji tiştên hene ne hatiye çêkirin. Belku ciheke xeyalî ji cihê çêdike.)⁶¹

⁵⁹ - Roman u Şar, Mensur Teyfury, Aynde, jmare, 76, Slêmanî, 2002, R 58.

⁶⁰ - Hunerî Gêranewe, Helkewt Ebdulla, Edeb u Huner, jmare 531, Slêmanî, 2008, R 7.

⁶¹ - Bînay Hunerî Çîroky Kurdî, Perêz Sabîr, Hewlêr, 2009. R162.

Hinek ji romannivîsan ji bo zêdetir guncandin û hevşêwekirina cihan ligel waqî û zindîkirina şunwarên ew waqî di xeyal û wijdan de, hewarê dibe li ber bikaranîna cihê waqî. Zindîkirina ew armanc û xwesteke bi çend rêyekê dibe:

1- Navê Rasteqîne yê Cih: Bikaranîna navê راستeqîne yê cihê li ser zeviyê ji bo romanê, gelek caran divê nasnameya diyar a cih û xwendevan bê rawestan dinase weke navê bajar, navçe, gund, tax, cade, avahî, çiya, dol, girav, derya, rûbar û wk. ⁶²

2- Taybetmendiya Cih: Bikaranîna taybetmendiya xwezayî yan ew taybetmendiya peywendî bi bûyera siyasî yan çandî ve heyîn û li gorî navdariyê bûye nasname û xala cûdakirinê ji cihên din.

3- Wesfê Dûr û Dirêjîya Cih: Gelek caran romannivîs ji bo çêkirina tirsaya waqiyetî kirokiya tekstê, bi rêya cih û waqî ve tirsê li ba xwendevan çêdike. Ji bo vê hewarê ji bo wesifê hûr û baldar, dûr û dirêjîya cih, sînore coxrafî yê xwezayî û rewşa hewayê wesif dika yan wesfê dûr û dirêj ya alavên di nav de dika ta bi vê rêyê cihên heveng bikin rastî û bergek rastiyan bikin li ber tekstê.

Cihê waqî çî bi sedema navê راستeqîne, yan bi sedema taybetmendî yan wesifê dûr û dirêj binasîne, hebûna waqî dîrokî heye. Dema avabûn û firehbûnê heye. Sedema avabûna û damezirandina wê diyar e. (Ji bo vê peywendîya wan jî karakterên nava tekstê ve, peywendî bi hebûna dîrok û waqî ve heye.) ⁶³ Li gorî vê jî hebûn û çarenivîsa wan, peywendiyekî germî bi cihan ve heye. Di encam de jî ew cîhane ye ku karakter tede dilivin û tede kar dikan.

Cihê waqî zêdetir di romanên dîrokî de û waqî de bikar tê, ji ber ku romanên bi vî corî ew corên romanê ne waqîne. Ji ber vê wisan pêwîst dika heman cihê waqî yê xwe bikarbîne. (Eger çî hinek car romannivîs ji ber her sedemekê be navê cihê waqî nabe, yan diguhere, yan bi hêmayeke yan bi şêweyê nesereke behsa wê dika.) ⁶⁴

Di serdemekê de jî cih pêwîstiyêke hizrî bû, ji bo zanîna rastbêjîya romannivîsî, yek ji pîvanên rexnegir ji bo vê babetê cih bû. Gelo ta çî astekê bûyerên waqî ne? Eger cih bi şêweyê waqî bikar hatiba, ew li gorî wê yekê bûyer jî bi hûrgilî bi baldarî û wesfî kirine, nivîskar întîma cografî divegerîne ji bo wî cihî.

⁶² - Studying the Novel, Jerney Hawthron, Edward Arnold, Great Britain. 1985. P 184.

⁶³ - Teknîky Gêranewey le romanî (Êwarey Perwane)y Bextîyar Elî de, weşan: Berêweberayeti Roşinbîry, Slêmanî, 2009. R 38.

⁶⁴ - Rwdawakanî Kurdîstan le Awêney Edeb de, Îsmâîl Îbrahîm Seîd, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2010. R 49.

1.11.2 Cihê Xeyalî:

Ew cihên ku hebûna rasteqîneyan li ser zeviyê hene, nikare bên dîtî û hebûna wan biselmînin an dest li ser hebûna rasteqîneyan dane. Wêneyeke hizriye û çavkaniyek a xeyala ne. Cih û dem waqîf nîne. (Cihê xeyalî yê wan cihan ku mejî hest pê dike lê di nav de najîn, dizanîn di dem û cih de hebû, lê dem û cihê me nîne, romannivîs ji ber xeyalan ve tîne pêş çav û wêneyê wê dikêşe.)⁶⁵ Eve xala cûdakere di navbera afirandina cihê xeyalî û wênekêşana cihê waqîi de. Di wênekêşana cihê waqîi de romannivîs bawerî dixê li ser hestên dîtî, çawaniya cih dibîne, piştî wênekêşe. Lê belê di wênekêşana cihê xeyalî yan fantazî de bawerî dixê li ser xeyal, çawan wêneyê cih di bîr û xeyal de zindî bûye, bi vî rengî wênekêşe. Bi danîna nav ji bo cihê xeyalî û wesifkirin li cihê waqîf nêzîk dibe. Hinek car romannivîs bê nav lê bike wesfê giştî yê cih dike. Hinek car jî navê rasteqîne yê cihê waqîi ji bo cihê xeyalî bikartîne. Eve jî tenê hêmayeke û coreke ji bikaranîna nû û taybet, girêdayîye bi dîtîna taybetî û ezmûnî ya xwediyê romanê ve.

Pêwîstiya çîrokê wisan li romannivîs dike hewarê bibe li ber afirandina cihê xeyalî yan fantazî. Ji bo gûncandina ligel bûyer û karakteran ji ber ku her bûyereke an karek ku karakter pê radibe û encam dide, pêwîstî bi fezayekî coxrafî ya taybet heye. Ev pêwîstîye wisan li romannivîs dike ku cihê hemû cor biafirîne û mora taybetî û cûda li cihê din pê bibexşîne. Heman pêwîstî wisan dixwaze ku cihê xeyalî xweş be yan nexweş be, hogir be yan jî dijber be, vekirîbe yan daxistî be.. Ya girîng di vir de ewe ku ta çî radeyekê ligel bûyeran bigûnce. (Şîyan û mezinahiya romannivîs di wir de derdikeve, ku ka ta çî astekê kariye cihê xeyalî biafirîne û kariye xwe têde bikarbîne û ziman jî rolê xwe bibîne di zindîkirina ew fezaya coxrafî de ji ber ku afirandina dahênerên xeyalî piştî bi xeyal û şîyanên hunerî û zimanî ve girê didin.)⁶⁶

Bêgûman gelek caran ev cîhana xeyalî ya li ser bingehê cîhana waqîi hatî avakirin, wate sûd ji çavkaniyên waqîi werdigire, ji bo kêşana wêneyê cîhana xeyalî. Ji bo vê ev core cihên xeyalî ji waqîi ve nêzîkin, ligel wê jî ku hebûna wan di waqîi de nîne lê hevşeweyê wan di waqîi de heye. Berevajî cihên fantazî, eger çî cihê fanatazî jî ciheke xeyalî ye lê belê di wêneyan de jî sûd ji çavkaniyên waqîi werdigirin. Belku zor dîr e ji waqîi ta astekê bergê efsaneyî bipoşîne. Bi wateyeke din

⁶⁵ - Şêwaz le kurte çîrokî nwêy kurdî de, Selîm Reşîd. Weşan: Serdem, Slêmanî, 2004. R 218.

⁶⁶ - Berew Estaney Roman u Goşenîgakan. Ebdulla Serac, weşan: Serdem, Slêmanî, 2007. R138.

cihê fantazî xewn û xeyala nivîskar, ew cihên ku tovê hez û xwestekên ku negengaze di zeviya waqî de bîn çandin tede tîn çandin .

Wate, dikare bê gotin du cor cihên xeyalî hene:

Yekem: Cihê xeyalî pêkhatiye li ser bingehê waqî.

1.11.3 Cihê Fantazî

Cihê xeyalî erênîya xwe heye, ew biware li ber romannivîs dixemilîne ku bi azadî û serbestî serederî ligel karakter û bûyeran bike. Her wiha li dûv xewn, xeyal, xwestek, peyama xwe, cihê hemû cor û afirêner çêbike. Ji ber ku cihê xeyalî, meydanî, serbestî û afirandin, pitir di cihê waqî de aliyêke din başiya cihê xeyalî ew cihê firehe ji bo romannivîs dixemilîne ku serbest be di guhertin û nûkirina cihan de, ew guhertin û nûkirine ku ligel peyam û mebestê digunce.⁶⁷

(Yek ji sîmayên cihê xeyalî ji aliyê bikarhêner ve ew ku bi tenê bikar tê, wate eger ew cihê ku pehnaheke mezin heye komek cihek biçûk li xwe girtiye, xeyalî be, ew beşên biçûkên din jî xeyalî dibin, eve berevajî, cihê waqî, ku nikare bi tenê bikarbîne, her bûye gelek car her dû cih, waqî û xeyalî pêkve bikartîne.)⁶⁸

1.11.4 Cihê Hogir:

Mebest li wî cihê ku mirov tede jiyaye. Li gorî hogir û naskirinê, tede hestê bi soz û germ û gûrî, aramî û dilniyayî kiriye. Hest û pêwîstiyên giyanî di wî cihê de têr bûye hogirê xweş û nexweş, kêr û kurtiyên wê jîngêyê bû, girêka bîranînan pêve girêdaye. Wate bihayê hogir û naskirin û girêya nava mirov û cihê hogir her dimîne. Heta eger ew cihên têkildarî bi wî takekesê ku gelek nexweş tede tam kiribe.

Wateya wî cihê hogir di romanê de ku takekes tede beşek ji civaka mirovî û peywendî pêve heye, hest û pêwîstiyên giyanî yên di wî cihê de têr bûye hizir, (Bîranînan û xewnên wan tede tîn tevlîlîhev kirin, peywendiyên civakî di wê jîngêyê

⁶⁷ - Roman u Pîşay Roman nusîn, Dayanda Bitgayer, wergêr: Ejî Goran, Dezgay Roşinbîry, Bexda, 1982. R 237.

⁶⁸ - Teknîky Gêranewe le romanekanî Ebdulla Serac de, Rêzan Ehmed Xidir, weşan: Rojhelat, Hewlêr, 2012. R 161.

de serfihildane û geşe bûne, xweşî û nexweşî, talî û şîrîniya jiyane di wê de hatiye avakirin.)⁶⁹

Cih peywendî bi cehwerê karê hunerî ve heye, wate wêneyeke huneriye, wêjeya cîhanê jî ew wêjeyeye ku bi wêne derdibire. Cih jî di wêneyên hunerî de cihê hogir e. Cihê hogir jî mala zarokatiyê, ew cihê xewnên zindî yên me tede praktik dikin û xeyalên me tede pêktên. Wêneyê hunerî di romanê de jî ew cihê ku bîranînên zarokatiyê tede bibîrtînin. (Cih di wêjeyê de ji wî wêneyê hunerî ku bîranînên me yên zarokatiyê tînin, cihê wêjeyî yê mezin di vê li ser xeta elîpsê dizivire.)⁷⁰ Hinek car serkevtina romanê jî di zindîkirina mala zarokatiyê de dibire, ku gelo ta çi astekê kariye xwendevan ber bi mala xwe ve bivegerîne û di hizir de bimîne. Yek ji meseleyên sereke di zanistên ciwaniyê de, babeta peywendî di navbera afirîner û wergir de ye, çawan ew wêneyê hunerî romannivîs afirandiye, dibe milkê xwendevan. Wate xwendina cih wisan li xwendevan dike bivegere ji bo hizirkirina ji mala zarokatiya xwe. Ji ber ku bihayê hogir baldariyek wisan heye ku wisan li xwendevan dike, xwendina romanê rawestîne û vegere ji bo mala zarokatiya xwe û bîne berçav.

Di derbarê cihê hogir de aloziyeke mezin di navbera rexnegiran de heye, hemû jî tekezê li ser wê dikin ku mala zarokatiyê cihê hogir, ev dîtine rast e, lê ya rasttir wisane bêje mal bi şeweyeke giştî cihê hogir e. Mala zarokatiyê jî bi şeweyeke taybetî hogirtirîn corê cih e.

(Rolê girîngiya cihê hogir û bandora wê li ser mirov, wisan li çîroknivîs û romannivîsan kiriye girîngiyê bidin bi cihê hogir ê karakterên xwe bi taybetî karakterên sereke û di tekstên xwe de zindî bikin. Diyare ev girîngi dana wan jî hêma û amaje pê kirin û armanca xwe heye.)⁷¹ Eve ji bilî wê ya ku bi rêya cihê hogir romannivîs goşenîgaya xwe di derbarê cîhan û jiyane de derdixe. Her bûye cihê hogir di romanê de roleke girîng heye di avakirinê de, di pêkanîna karakter û avakirina vegotinê de.

⁶⁹ - Komelêk Babety Tîory, Walter Binyamîn, komalêk wergêr, wezarety Perwerde, Hewlêr, 2004. R 20.

⁷⁰ - Azadiye Bçkolekan, Goran Baba Elî, Rehend, jmare 3, Stokholm, 1997, R 178.

⁷¹ - Îstakîka, Kemal Mîrawdelî, weşanxaney Qaniî, Slêmanî, 2005. R 318.

1.11.5 Cihê Nehogir

Hinek ji lêkolîner li cihê zaraveyê nahogir zaraveyê dijber bikaranîne, ku eve jî ta astek mezin negûncawe. Ji ber ku merc nîne hemû cihên nehogir cihê dijber bin. Li gorî hestên karekteran bi cihê nehogir, dikare du corên cihên nahogir di romanê de destnîşan bikin:

a- Ew cihên ku karekter têde nejiyaye, pê hogir û nasandin nebûye û têde hest bi xerîbî û ne aramî dike. (Ji ber dûrketina ji malê û jîngeha bingehîn, ji cihê din ê nû de dijî, încâ çî bi şêweyekî demkî be yan bi şêweyeke berdewam be.)⁷² Ji ber ku ev cihe peywendiya întîmayî bi karekteran ve nîne. Têde hest bi xerîbî dike, gelek caran jî hewl dide bi şêweyek ji şêweyan wêneyeke malê û jîngeha bingehîn têde ava bike ta hogir û nas bike. Bi vî karekterê jî reng ta astekê hestê nahogirî li beramberî kêmbike, yan berevajî encameke xwestî jê bi dest nekeve. (Her bûye karek hêsan nîne hestê nahogirî biguhere ji bo hogir.)⁷³ Hevdem zehmet jî nîne, bi taybetî li beramber bi wan cihên ku cihê bingehîn û întîmayî nîne û ji gelek aliyan ve jê cûdaye, ba ew cihe nû ye gelek ji cihên bingehîn xweştir be û aliyê baş zêdetir têde be û rewşa jiyanê baştir be têde. Hêj li beramberî hest bi xerîbî û na aramî dike. (Baştirîn belge jî ji bo vê nêrînê, xewn û xewnên zindî ku herdem bi şêweyeke nestî vedigere ji bo hembêza germ û gûrê cihê yekem ji bo mal, gund, bajar û welat wê.)⁷⁴

b- Cihê dijber: Mebest ew cihin ku karekter li beramberî hestan bi rik û kîn dijminatîyê dikin, yan hest bi metirsî, êş, eşkence û hinek caran jî tirsî mergê xwe lê dikin. Wate, li gorî vê pênaseyê dikarin du cor cihên dijber diyar bikin:

1- Ew cihên ku weke sizayekê sepanîye li ser karekeraan, weke girtîgeh, cihê dîrxistin û binçavkirinan.

2- Ew cihên ku metirsiya rû bi rûbûna merg têde dike, weke cihê çol, ku çiya û zinarên asteng û tirsnak an cihê lawirên dirinde.

Derbarê cihê duwem; di hinek romanên de ev core cihane bi cih dike û kiriye şanoya bûyer, karekter, li ber çav digirin di avakirina tekstê de, yan cihê mîlmilanêya mirove ligel jiyanê ji bo maye. Ev jî ew heskirine ku nediyar û veşartî ya nava mirov ji bo jiyanê, ku renga di dem û cihê hêsanî de diyar nekeve. Wate xala cûdakere di navbera ev du core cihane de, ew metirsiye, eşkence û êşên ku di cihê

⁷² - Rexne le Bextyar Elî, Teha Ehmed Resul, Rênma, Slêmanî, 2005. R 51.

⁷³ - Teknîky Gêranewe le romanekani Ebdulla Serac de, Rêzan Ehmed Xidir, weşan: Rojhelat, Hewlêr, 2012. R 82.

⁷⁴ - Xitab El Hîkaye, Cîrart Cînet, wergêr: Muhemmed Mutasem, Dar El Hîkme, Beyrut, 2000, R 32.

dijber de rûberûyê xwendevan dibin, an hest pê dike. Berevajî cihê nehogir ku bi şêweyeke hêsanî û dûr ji hestkirina bi metirsiyê têde dijî, lê belê têde ne aramî hest bi soz û germ û gûrî nake. Ji ber ku bi mal û jîngeh, welatê xwe nizane yan ew cihe nîne ku li destpêka jiyana wî de têde jiyaye û bi şêweyeke xweristî pêre hatiye û hogirê wî bû.

Peywendiya karakteran bi mal û cihê hogiran ve li gorî li hemû corên demên xwe aloz e, wate li gorî rewşa derûnî yên şadî û xweşî diguhere. Di derbarê şadî û kêliyên bexteweriya karakteran de zêdetir dibin hogirê cihê xwe. (Di kêliyên trajedî û nexweşiyên de bi neçarî bi cih dihêlin û xwe jê nenas dikin. Gelek çaran jî di bin givaşên nehametî, pirsgirêk û giriftan de dibe cihekî nehogir û li ciheke din digere.)⁷⁵ Renge ewa di cihê nû de dest dikeve, bextewerî, xweşiyê têde bibîne û ta astekê bibe hogir. Ev jî wê rastiyê diselmîne ku merc nîne di hemû rewşekê de cihê hogir, aram û bi şêweyeke germ û gûr be. Hestê hogir beramber cih ji rewşekê ji bo rewşeke din diguher e.

1.11.6 Cihê Vekirî:

Ji cihên derve pêktê ku ji aliyê karhêneran ve taybet nîne bi kesek yan komek ya kesan ve. Dibe ku di rûyê hemû kesekê de vekiribe. Ji bo vê divê hemû kesek dikare bikar bîne û bi xwesteke xwe têde bîn û biçin, şêweyekî giştî heye, weke: Kolan, tax, şeqam (cade), gund, bajar, mizgeft, çayxane, serşû, sazî û fermangeh (daîre). Evane çêkiriyên mirov in. Ji aliyê milk ve jî hinek milkê takeksan in weke: çayxane, serşû, mizgeft, hinek din jî milkê hikûmetê ne weke mizgeft û saziyên gund û bajaran wkd. (Avakirin û nûjenkirin karê hikûmetê ye lê ji aliyê bikaranînê ve hemû kesek dikare biçiyê û bikar bîne.)⁷⁶

Coreke din jî ji cihê vekirî cihên xwezayî ne, wek: Deşt, şikeft, çol.. Evane jî dîsa hemû kes dikare bikar bîne, dibe ku destê mirî pê ghiştî be û kiribe cihê niştecihbûnê û hatibe avakirin. Dibe ku bi berevajî jî cihên ji dest dûr bin û nehatibe avakirin. Dibe ku cihê nahogir û dijber bin ji bo xelk û têde rû bi rûyê metirsî û aramiyê bibin.

Cihê vekirî di rastiyê de bi dest hatibe çêkirin çî xwezayî be ti wateyekê nade. Ji bilî wê çarçoveya li xwe girtina xelkê yan cih di hebûnê de, lê dikare, di

⁷⁵ - Plot le Romanî Kurdî de, Cemal Ehmed, Serdemî Rexne, jmare 9, Slêmanî, R 53.

⁷⁶ - Mêjuy Serhêdanî Roman, Sîamend Hadî, weşan: Tîşk, Slîmanî, 2004. R 38.

romanê de sûd jê bibînin û bike amejekar û hêmaya azadî û serbestiyê. (Ew azadiya ku deshilateke siyasî di sînoreke coxrafi berteng daxistî de ji mirov zevt û dorpêç dikin. Yan hêmayek be ji bo rizgarbûna karakter ji pirsgirêkên rewşa taybet di nava cihên daxistî de ku rewşa derûnî ya mirov radiwestîne û ber bi cihê vekirî ve diçin.)⁷⁷ Yan diyarkerên pêkhatiya çîn û tebeqeyên civakê ne, reftar, nêrîn û astên rewşenbîrî û rewşa aborî cûdahiya xelkê li xwe digire û derdixe holê.

Hebûna cihê vekirî û daxistî di romanê de peywendî bi xwezayî aloz û du aliya mirove ve heye ku heman demê de du aliyên êşkere û ne êşker e, diyar yan ne diyar pêhatiye wate rûhsarî êşkere û diyar ê cîhana hundir a mirov ku depoya hes, xwestek, raz û nihêniyan ne. Her weke Ashton Bashlar dibêje: (Mirov hebûneke nîv vekiriye.)⁷⁸ Ji aliyêke din ve peywendî bi jiyana mirov ve heye, mirov beşeke jiyana xwe li cihê daxistî derbas dike, beşek din jî li cihê vekirî. Rûyê veşartî yê jiyana li cihên daxistî derbas dike û rûyê diyar û êşkere jî li cihê vekirî derbas dike. Nivê vekirina mirov di cihê vekirî de pitir ji nivê veşartiyên amedbûnê wê heye.

Cihê vekirî ew şiyar hene bi tenê bikar bê lê zehmete cihê daxistî bi tenê bikar bê. Eger bûyer di yek cihî daxistî de biqewimin, ew bi sedema flashbag (vedigere ji bo berê) ve karakterê ji bo cihê vekirî vedigere. Her ji ber wê ew sedemên ku beşek ji pêkhatiyên cihê bûyerên romanê li cihên vekirî pêktînin.

1.11.7 Cihê Daxistî

Ew cih ku ji aliyê bikarhêner ve taybetin bi kesekê, yan komê a kesan, di rûyê xelkê de daxistîne. Hemû kes nikare bikarbîne, şeweyeke taybet heye weke: Mal, jor, zevî, girtîgeh wkd.. Hemû ciheke daxistî hatiye çêkirin, ev cihên vekirî, cihên giştî ne ji komê cih pêhatiye, wate ji beşan. Hebûna wan di bingeh de nehatiye parvekirin lê mirov li gorî qonaxên jiyana xwe kiriye beş. Ewe meseleyek giştî û başe, bi giştî vekiriye, beş daxistiye. Zehmete beşan ji giştî qût bike. Bi wateyeke din mehale qûtkirina ew peywendiyê ku hemû tiştêke bi giştî ve girêdide. Her bi vî rengî cihê daxistî ji cihê vekirî cûda nake û hevdem hemû ciheke daxistî beşeke ji cihên vekirî. Cihê romanê jî pêkhatiye ji giştî û beş, ji vekirî, daxistî hemû daxistiye jî ji vekiriye, bûye daxistî ew şiyar nînin bi tenê bikar bîne.

⁷⁷ - Cwanînasî Şikist, Murad Ferhad Pur, wergêr: Mensur Teyeurî, weşan: Ranc, Slêmanî, 2006. R 46.

⁷⁸ - Nîhîhîzm u Rehendekanî bîrkrdinewe, Mhemed Kemal, weşana Serdem. Slêmanî, 2005. R 108.

Cihê daxistî û vekirî cûdahiyeye ew çend nîne di hunerê de, tenê cûdahiyek di navbera wan de ewe du navên cihin di xwezayê de. Lê belê ligel hunermend cihê daxistî çend jî rûbereke diyarkirî hebe jî, bihayeye hunerî û ciwankarî heye. Dibe ku ligel nivîskarek xeyalî lewaz gelek tengtir bibe ji wê ya ku heye.

Bikaranîna cihê daxistî ligel hinek romannivîs di encama rewşa civakî taybetî karekterên têde dijîn û taybetmendiyeye civakî, siyasî heye. Ew karekterane di wan cihên daxistî de daxistîne, hinek jî ew cihin ku kirine cihê asayî ku di şiyanê de heye têde bijîn û hogir bin. Ji ber ku di qonaxeke demkî dijîn, yan dibe ciheke herdemî yê jiyana wan û wa pêwîst dike xwe ligel bi gûncin û derbas bikin. (Bi vê bi vî rengî cihên daxistî, cihên daxistî weke girtîgeh, rewşeke giştî disepîne. Ger çi girtîgeh bi rêya lînêrîn û hizir ve vekirîbe, cihê hizir giştî ye.)⁷⁹ Romannivîs bi rêya vî cihê daxistî dikare nexşeya diyarkirî ya mirovê dorpêçkirî bikêşe.

1.12 Corên Karkter û Rolên Wan di Vegotina Romanê de

Karekter amrazeke sereke yê romanê ye û di roleke bibandor di di avakirina romanê de digire. Ji ber vê sedemê jî bûyer hilkişan û dakişanê bi xwe ve dibînin. Her wiha ligel amrazên sereke yên romanê yên din bi her du aliyên negatîf û pozîtîf ve kar ji bo hev dikin û romanê ava dikin. Karekter hejmarek peyv û romannivîs saz dike, nav û amrazê wê diyar dike. Her wiha şêweyê gûncaw ji bo wê hildibijêre. Wisan lê dike bi şêweyek rêkûpêk reftar bike. Ew reftarên karekter jî wisan dike ku vebêj çêbibin. Ji bo vê jî Ebdilrehman Mûnif dibêje: (Armanca romanê avakirina kesayetî û bûyerane. Wate bandora karekteran li ser amrazên sereke yên romanê wisan li romannivîs dike girîngiyeye taybet bide karekter û di avakirina romanê de bi şêweyek hûr hesab ji bo bike.)⁸⁰

Dikarin bêjîn nêrîna kesan ji aliyê nivîskar ve ku her dem cihê girîngî pêdanê bû, ne ji rêbazekê ji bo rêbazeke din belku tenê ji nivîskarekê ji bo nivîskareke din jî cûdahî têde hebû. Her ew cûdahiyane jî di avakirina karekter û vebêj de wisan diyarkiriye, dîtî, nêrîn û pênaseya ciyewaz ji bo çemka vebêjê çêbibe. Her nivîskar û dibistanek dîtînen taybet ên xwe ji bo hebe û corek ciyewaz lê binêre. Diyare eve jî ji bo xwediyê hunera romanê digire ku (Wejeyek firehalî û ligel bi jiyane ve girêdayî, ligel pêşveçûn û guhertina jêrxan û serxana civakê. Ew jî di

⁷⁹ - Tiyorî Edebî, Pîter Halbîrg, wergêr: Enwer Qadir Muhammed, weşan: Melbendî Kurdolocî, Slêmanî, 2010. R 41.

⁸⁰ - Teşkek bo ser roman. Ebdulrehman Munîf, wergêr: Şîrîn K. weşana Serdem. Slêmanî 2006. R 174.

qalibekê de namîne û diguhere.)⁸¹ Di heman demê de nêrîn jî ligel wê diguherin. Amraza karakter jî yekemîn amrazê vegotinê ye ku li gorî sedem û rêbaza wêjeyê û amraza wêjeyê ketiye li ber pêleke tund û ya hêmayên guhertinê.

Eflaton ji aliyê sûd bexşînê ve temaşeyî karakteran kiriye û her ji ber vê sedemê jî cih bi tebeqan de ye ta cihek gûncaw di 'Komara' wî de bigire. Eger çî Eflaton bi şêweyê eşkere û raste rast behsa karakteran nekiriye. Lê li gorî dîtina wî ya li ser helbestê: (Huner her wiha helbest bi taybetî bandorek xirab li xwezaya mirovatiyê dike. Ew jî bi wan mînakên xirab ku pêşkêşî dikin, helbestvan kesayeta xwe di nava kesayetiyan din de winda dike. Bêgûman tiştê xirab jî şerkarî bi baştirîn şêwe balbikişînin li ser helwestên wan dike.)⁸² Ji ber vê jî bo me derdikeve holê ku Eflaton hest bi wê kiriye ku em destanên ku helbestvan dinivîsîn, axaftin û reftarên mêrxwazan rengdana nav û derûna helbestvanan nîne. Ew jî bilî aliyê hunerî yê helbestvan ku bi wan dibexşin û bala xwedevanan dikêşin li ser xwe. Arîsto ku xwendevanê Eflaton bû bi şêweyê zelal û vekirî behsa karakteran kiriye. Lê ewî zêdetir girîngî bi bûyeran daye. Încê nivîskarê tekstê li gorî pêwîst karakter hildibjêre ku ligel naveroka tekstê bigûnce. Her çende ligel Arîsto karakter ji şeş amrazên weke: Tebeqe, kesayeti, dariştin, hizir, dîmen û stiranên ku ji trajediyan pêktên lê li gorî wî: (Ji hemû amrazan girîngtir tebeqe, wate rêxistina bûyerane. Ji ber ku trajediya asayîkirina kesan nîne. Balku asayîkirina jiyane û bextewerî, bêbextî, bextewerî û bêşansiya mirovan jî bi kirinê ve girêdaye.)⁸³ Li vir, ji bo me derdikeve holê ku Arîsto di çavê bûyeran de ew hinde girîngî bi karakteran nedaye, xistiye xizmeta bûyeran, weke amrazek ji bo dagirtin û girêdana bûyeran temaşe kiriye. Ku derencam ew jî xwe ji bi destxistina armanekê dibîne. Ji bo vê jî dibêje: (Trajediyan ji bo wê pêşkêş nake kesayetiya kes bike belku kesayeti di rêya kiryar de be ger dextrê. Bi vî corî mebest ji trajediyan armanek ya xwe di hunandin û bûyerê de dibîne û aliyê herî girîng ji armanca wê ye.)⁸⁴ Ji berê serhildana romanê çemka karakter hemû di mêrxwaz de kom kiriye serdestî her ji bo mêrxwaz vegeyare. Her ewî jî bi tenê kariye bandorê li bûyerê bike û biguherîne. Heta tekst jî li ser piya heldan û bi derxistina mêrxwaz bû. Ji ber ku karê wisan kiriye ku xelkê asayî nekarin

⁸¹ - Şuênkarî yekem le duyem u êstay Segwer. Ebdulnutelîb Ebdulla, Weşana Nima, hewlêr. 2004. R 22.

⁸² - Ekrobatêkî Winbw, Îsmail Heme emîn, weşana wezaretê Rewşenbîrî, Slêmanî, 2012. R 43.

⁸³ - Hunery Helbest. Ersto, wergêr: Muhemmed Kemal, weşana: Serdem, Slêmanî, 2006, R 38.

⁸⁴ - Hunery Helbest. Ersto, wergêr: Muhemmed Kemal, weşana: Serdem, Slêmanî, 2006, R 39.

bikn. Ji bo vê xwendevan bi bê xwesteka xwe alîgirê mêrxwaz bû. Ew mêrxwaze jî piraniye, her wiha ew mêrxwaze şiyana bê sînor pê re hatine dayîn ku di şiyane mirovê asayî de nîne, weke mêrxwazên Îlyada û Odesa yên Homeros hinekan ji wan xwedawendan bûne weke: Zeos, Hîraw, Posîdan û Hirmiz.

Eger çî li gel derketina romanê guhertin bi ser de hatiye lê heta sedeya 18'an ji roman nekarî bû ji bendên çîrokî rizgar bibe. Lê tenê yek karakter tê de amade bû. Ew jî bi tevî ku di wê demê de wênekirina karakteran bi tiştêk bingehîn danîn, hikayetxwazan her dem li ser milên wan bûn ku di sedeya 19'an de cihek di hunera romanê de pêdaye wê demê ligel bûyerê bêhnek serbixwe wergirt. Ji ber wê sedemê wêneyê mêrxwaz li gorî qonaxên dîrokê hêdî hêdî guhertinek mezin û bingehîn biserde hatiye ta ku di wê demê de ew mêrxwaz bê sînor derket û guhert ji bo mirovê asayî di jiyana waqîf de dane yan jî mêrxwaz ji bo mirovê asayî.

Her wiha ji ber ku roman bi rêya avakirina karakteran ve ji wê hêza xûdayî û hilweşand hewl da wêneyê rasteqîne yê kesayet ji rastiyê werbigire û bi şêweyek xwezayî wêne bike. Wate, karakter di romanê de bû û bi vî amrazî nûnertiya mirov bike. (Bi wê yekê jî roman dixwaze di dîtina ji bo cîhanê de pişt bi peywendiyên civakê yên di navbera xelkê de girê dide.)⁸⁵ Eve jî bi xwe dîtineke cîhanî û girîngdane bi endamên civakî.

Dema karakter wek amrazek serbixwe mil bi milê amrazên din yên romanê derdikeve. Dîtina ji bo çemkê karakter û pênaseya karakter wisan lê hati bû ku renge roman bê karakter hebûna wê nebe. Ji bo vê hebûn romanê bi hebûna karakter ve girêdaye. Girîngiya karakter her ew çende nîne ku bi bê wê hiç romanek nanivîse. Dibe ku amrazên din yên romanê jî di xizmeta wê de dibin. Karakter yek ji amrazên sereke û vegotinê ber bi pêş ve dibin. (Ew karaktere wisan dike ew çîrokên di nava romanê de bi wî şêweyî biqewimin û ne bi şêweyeke din.)⁸⁶ Derxistina karakter jî bi zîrekî jêhatina romannivîs ve girêdayî ye. Ji ber ku çemkê karakter bi ciyewazî arasteya dîtina cîhanê ya romannivîs diguhere. Li gorî hinek lêkolînvanan jî mezintiya romannivîs di wênekêşana karakteran de pişt bi jêhatina romannivîs ve girê dide. Ev jêhatin ji xwe di hilbijartin, avakirin û pêşkêşkirina karakteran de dibîne. Eger avakirina û pêşkêşkirina karakter ji zêdetir peywendî bi aliyê hunerî yê

⁸⁵ - Nwnînekanm le Bwarî Rexne w Lêkolînwewda, Husên Arif, weşan: Serdem, Slêmanî, 2002. R 184.

⁸⁶ - Jîyan Cwane, Hîwa Qadir, wşana: Xaney Wergêran, Slêmanî, 2009. R 192.

romanê ve hebe, ew di hilibijartina karekterê yekê de ji binçîne û girîngiyek mezin ji bo bawerdaran û wergirtin ji aliyê xwedevan ve heye. (Ji van aliyane ve mezinî û biçûkî di karekteran de nîne, belku peywendî bi jêhatina romannivîs ve heye.)⁸⁷ Ku çawan hildibêjere ji ber ku karekter weke hizir, exlaq, reftar û rewşa derûnî nûnerê çînekê ye. Ji bo vê divê ev kesayetiyên ji bo gihandina bîranînên nivîskaran gûncaw bin. Divê nivîskar karekteran bi hûrgilî binasîne. Bi şêweyek baştir ji wan kesên ku birastî dinase. Di dawiyê de hest bi tirs û nihênî, hêvî û palneriya şerkariyê bike. Ew kare hêdî hêdî li beramber êşkere dibe û nivîskar jî bi temamî ji vî milî ve dinivîsîne û romana xwe ji bo wê sedemê vedibêje. Heta nivîskar karekterên baştir binase û agahdarî xewn û xeyalên wan be, ew çend vegotinek serkeftî dibe.

Karekter di romanên realîzmê de xwedî cihê xwe yê taybetin, wate kesek ji nava jiyana rasteqîne derdikeve, wesfê hûrgiliyên piralî yên romannivîs wisan li xwendevan dike weke kesek nêzîkî xwe yan ji weke rêhevalekê serederî ligel bike. Eeyan Wat dibêje: (Di romanê de du tiştên girîng û taybet hene. Ew jî girîngiya wêne ku karekter û wênegirtina bagrawend de, bêgûman roman ji corên din yên wêjeyî û çîrokên berê bi wê tîrê cûdakirin.)⁸⁸ Ji wan zêdetir girîngî bi karekteran dide û diyar dike weke ewa ew kesên rasteqîne bin. Her wiha wêneyê derdora wan karekteran ji bi hûrgilî dikêşe û morkek ê rastiyê dideyê.

Di romanên realîzmê de her hûrgiliyên avakirina hunera karekteran berçav dixin û pêşkêşî xwendevanan dikin. Balku ewa peywendî bi jiyana wî ve jî heye, weke aliyê cestayî, cil, berg û ew xaniyên têde dijî, bi rêya wesifkirinê nîşana xwendevanan dide. Her wiha jiyana karekter li gorî taybetmendiyên karekter behs dike, ew behskirine jî di çarçoveya wê jiyana dernakeve ku li ser wê civakê reng dide ku karekter têde dijîn. Ji ber ku karekter takek ê civakê ye. (Bi başî û xirabî nikare ji bin wê bandorê derbikeve ku raste rast yan hêdî hêdî li gorî derbasbûna demê nîşanên di serî de derdikevin û di dawiyê de jî encamên wê êşkere dibin.)⁸⁹ Her çende hemû aliyên jiyana tak ji ra û bandorê li jiyana hemûyan li ser heye. Lê jiyana hemûyan jî di girîngtirîn rewşê de jî bi şêweyek takekesî (ferd) li berçav digire. Li gorî vê ne jiyana karekter tê paşguhxistin û ne jî bandora civakê tê paşguhxistin. Ku ji nîşandana rastiya jiyana karekterên din û rengdana yek bi yekê ji aliyê tak û civakê

⁸⁷ - Le sêberî Pirsîyar de, Samed Ehmed, weşana Yaney Qelem, Slêmanî, 2007. R 66.

⁸⁸ - Malêkî Lêktrazaw u Wîjdanêkî Bîmar, Faruq Refîq, Weşana: Renc, Slêmanî, 2002. R 210.

⁸⁹ - Fîkr u Dunya, Merîwan Wirya Qanî, Bergî Yekem, weşana Endêşe, Slêmanî, 2013. R 74.

ji yê din.

Taybetmendiye karekter, taybetmendiye takbûnê ku çavkaniye wê vedigere ji bo bandorên hizrên Dikart û felsefeya wî jî di wê de ciyewazî dikeve di navbera tak û civakê de. Ji Dikart ve karekterên romanê serbixweyî werdigirin û xwesteka derbirîna xewnên xwe dike. Ev jî ne bi wê wateyê ku tak ti peywendî bi civakê ve namîne, ev kare peywendî bi civakê ve nîne lê piştî peydabûna hizra takbûnê çawaniya wan peywendiyên ku tak û civakê bi hev ve girê dide guhertiye û kar tenê di wî sînorî de nemaye ku civakê bi vê çî bipejirîne wê encam dide. Balku vê carê tak wî karî dike ku li gorî wî başe di çarçoveya sînorê civakê de ji dernakeve ji bo ku encamê karê wî nebe sedema qûtbûna wan peywendiyên tak bi wanên din ve heye û derencama hemûyan jî civakê pêktînin.

Hinek ji rexnegirên romanên wisan dibînin: (Karekterê romanê hebûneke rastiyanê nîne belku çemkek xeyalkirin û wateya çend derbirînekê bikaranîna di romanê de digihînin. Her yek ji van, her hizir bîranîna aliyên xwe yê erênî hene.)⁹⁰ Eger karekterê romanê bi giştî waqî be weke ewê çûne ava di jiyane de werbigire. Ew weke ewê ku lê tê romannivîs dîroka jiyana kesek jî me jî bo vebêje û teksta romanê jî derbixe, her çî ciwanî û îstatîkayek. Eger karekterê romanê karekterek xeyalî be û tenê jî bo mebesta wê çêkiribe a romannivîs bi rêya wê çend bîr û hizrek derixe, ew dibe bi karekterek mekanîkî bê giyan û hiş. Ji bo vê divê romannivîs karekterên wî nebi şeweyê waqî bin ku bi temamî jî civakê hinek kes biçin jî waqî ve wergirtibin jî bo romana wî nebe wêneyek fotografê jiyane, ne ev çend xeyale jî bin xwendevan hiç taybetmendiye wan di jiyane de nebîne.

Di romanê de mercê destpêkê jî bo romannivîs li holê nîne. Bi vê dibe karekterên wî tenê kesên oldar, yan dîrokî yan siyasî bin. (Romannivîs azad e karerter çî core kesayetiyek bin. Ji bo vê mînak: Dibe karekterên romanê, karekterên dîrokî, efsanewî, xeyalî, zanistî û hwd bin. Dikare her kesayetiyek din di nava civakê de bibe karekterê romanê.)⁹¹

Diyarkirina bandora takekesê karekter li ser civakê bi berevajî bêgûman yê duwem zêdetire û rengdana wê diyartir yek jî aliyên diyar yê romana realîzmê ye. Ew bandore jî bi sedema çêbûnê û di dawiyê de jî xortbûn yan têkçûna wê

⁹⁰ -Mana Şarawekanî Deq, Dana Mistefa, weşan: Rênma, Slêmanî, 2004. R 76.

⁹¹ - Çîrokî Nwêy Kurdî, Hesên Caf, weşan: Roşinbîry u Bilawkirdinewey Kurdî, Bexda, 1985. R 179.

peywendiya cor bi cor tevlîhev dibe. Ji bo rewşa civakî, aborî, ramiyarî û wdk di navbera karakteran de çêdibe. Bêgûman peywendî jî weke zincîrekê yek temamkerê ya dine.

Roman hebûna ew hemû aliyane û xwendina ji bo jiyana takesên civakê heye. Gav bi gav ligel guhertina jiyane, hezkirin, xwestek û pêşkeftinên mirov rêkdixe û li gorî yasa û distûran hatiye guhertin. Her dem di yek formê û qalib de namîne. Dîroka romanê qonaxên romanê ji demê berê ve ta niha ew rastiyan selmandiye. Karakter jî li gorî amrazêke sereke yê romanê ji wan guhertinan bêpar namîne û weke aliyeke diyar ê wan guhertinan derdikeve guhertinan û gelek arîşeyan çêdikin. (Di destpêka sedeya 20'an de romannivîsan di romanên xwe de deshîlata karakteran kêmkirîye, li gorî wan wisan bû nabe pênase û çemkê karakter di nava xwe bi xwe de bike belku dibe lêkolîn û analîz di çarçoveya amaje pê kirinê de ji bo bê kirin. Ji ber ku karakter jî weke hemû amrazên din ên romanê amrazêke formî û teknîkî ye.)⁹² Di romana nû de şanoya bûyeran di cîhana kargeh û malan de mala me û erebaneyên hêla hesinî û cîhana nimûneyî ku madî pêşkêşkirine ji bo nava mirov veguhest. Eve di romana Recharad Son, Cims Cowîs, Vîrincîna Wolf û gelek ên din de eve ji bo herikîna hiş hatiye nasîn.

Romannivîs di vê şêwazê romanê de rê bi xwendevan bide raste rast bi ser de bibe deshîlat bi hizr û hiş karakterên nava romanê bibe ji bo nimûne Cems Cowîs di romanê de (Wêneyê Hunermend Di tovê Lawî De) girîngî bi derûn, cîhana hundir, cîhana hiş û hest dide. Li paş romana Îngilizî ji bo demeke gelek girîng bi peywendiyên civakî yê peywendiyên tak bi cîhana derve re dide û cîhana hundir dihat paşguhxistin. Lê belê zanista derûnnaşî di destpêka sedeya nû de bi şêweyekî giştî girîngiya wê cîhanê ji bo jiyana mirov eşkere kir. Ceymes Cowîs di wê romanê de ku Stîfen karakterê serekeye, ew çend hundir di şor dibe hinek jî rexnegirên pêyan wisan bû hişê Stîfan karakterê sereke yê romanê ye.⁹³

Eger di romana klasîk de karakter xwedî navê taybet ê xwe yan nasnav be yan her du jî bi hev re hebe, ji ber ku ewa ku navê wî karakterekî diyar dike û wisan lê dike bênasîn û takîtiya xwe diparêze. Ev di romana nû de her nasnav belku nav ji

⁹² - Corekanî Karakter le çîrok u roman de, Xidir Mustefa Ehmed, Raman, jmare 105, Hewlêr, 2006, R 37.

⁹³ - Fen El Kîtabe El Rîwaye, Dîyan Wat, wergêr: Ebdulstar Cewad, wezare Seqafe, Dar El Şun, Bexdad, 1988, R 126.

dest jê berdaye û nîşaneke cihê wî girtiye. Ji bo mînak di romanên Koşk û Dadgeh yên Kafka de sînorê wê yê yasayî derbas kiriye.

Têkildarî romana Koşk a Kofha, Mîlan Kondira dibêje: (Min cara destpêkê di çarde saliyê de Koşk xwend, matmayî bûm bi lîstikvanê gokên li ser berfê ku nêzîkî me dijiya û wisan dikir ku "K" şêweyê wî ye. Ta îro jî wan dibînim. Dixwazim ji vê re bêjim xeyala xwendevan, xeyala nivîskar xweristî tamam dike.)⁹⁴

Ji ber kêmkirina deshilatên karakter û diyarkirinê tenê weke amrazek ji amrazên din ên romanê di romanên nû de romannivîs bi vê rewşenbiriya ku heye rêbere di pêkanîna û diyarkirina karakter de kêmkirina bike yan zêde bike yan mezin bike. Bi şêweyek ku negengaze ew karakterê kaxezî, xwedîk (awêne) û mirovî be. Ji ber ku karakterê mirovî berçavtir û pir bihatir bû. Ji bo mînak ew masiyê masîgir Hemengiwa dixwaze bigire di roman "Pîremêrd û Zerya" de qehremantiya wî jiya masîgir kêmtir nîne.

Her wiha di (Romana "Wîşiyên Xeyidînê" ya Con Şityanbikî de xweza qehremane, tewerê sereke ye)⁹⁵, bangeşe ji bo qehremantiya mirov dike û derdixe, eger ew zordariya xwezayê nebûya mêrxwaziya wê bi razayî dima yan nedikarî nêrîna ji xwe derbixe û bi zelalî derbikeve. Eger mirov yan dar û bar, cih ku evane hemû li ber destin û rolê karakter bibînin, ew karakterên wisan hene ku rolê sereke dilehîzin ku diçe çarçoveya navê wateyê weke di romana "Bêdengiya Deryayê" a Fêkor de ku (Bêdengî rolê karakterê sereke dibîne û bi vî corî nekirin dibe kirdar.)⁹⁶ Ev jî berevajiyê qonaxên berê ye û mêrxwazî jî kirdar zindî dike bi taybetî jî di kiriyarek bêsinor de.

Karakter di piraniya herî pira a karên vegotinê de (yekem pêkhatiya ku xwendevan dibîne û piştî pêkhatinê bicih dihêle.)⁹⁷ Her ev taybetmendiya girîng a karakter jî wisan kiriye ku bibe çavkaniya ciwanî û baldariya xwendevane. Ji ber ku yek ji xerîzeyên mirov ku hez dike, dûvçûnê bike, reftarên kesên din û zanyarî bidest bixe, û bizane û di dawiyê de çi bi ser tê. Bi taybetî dema xwendevan xwe bi beşek ji pêkhatiya bûyeran dibîne û alîgiriya karakter an çend karakterek din dike û hemû hêviya wî ewe ku serbikeve yan gelek caran dibe sembolek ji bo rêgeha jiyana rastî

⁹⁴ - Hûnerî roman, Mîlan kondêra. Wergêr: Kerîm pereng, Weşana serdem, Slêmanî 2008. R 111.

⁹⁵ - Rexney Edebî w Qutabxanekanî, Çarlîs Brîslêr, wergêr: Ebdulxaliq Yaqubî, weşan: Aras, Hewlêr, 2007. R 146.

⁹⁶ - Cîhanî Roman, Haşim Ehmedzade, weşana Endêşe. Slêmanî, 2015. R 49.

⁹⁷ - Fen El Rîwaye, wergêr: Mhemed Derwêş, Dar El Hurîye, Bexdad, 1986, R 124.

ya xwendevan ta astekekê ku çawan di xewn û xiyalên me li dûv xwe bigerînin. Di romanê de jî li dûv yek an çend karakterek dikevin ta ligel bibin yek. (Ev girêdana xwendevan jî bi karakter ve tevlihevûna hest û soza ligel ji bo aliyê mirovî digere.)⁹⁸ Ji ber ku karakter her corek ji coran be û bi her şêweyekî ji şêweyên bixêrê, ew jî hestê mirovatî bêbeş nebe. Di demekê de nivîskarê wê ku romannivîs ew jî mirov e. Ji bo vê ti karakterekê romanê ji valatîyê çênebe. Yan ew karakter rastî be yan xeyalî be, eger rastî be em bi komek destkarî ve aliyek yan çend aliyekê di jiyana kesayetiyê de ji bo karakter bikartînin. Eger bi temamî xeyalî jî be, afirandina wê raste rast yan ne raste rast peywendî bi wê bagrawendê ve heye ku weke tomarekê ji hizrên romannivîs rakirîye. Wate hemû ew wêne hizirîyaneyên ku di mejiyê nivîskar de karakterê kaxezî diafirîne.

Wate, afirandina karakter her çawan be, biçî şêweyî be sedan sed ji xeyalên romannivîs çêbike her peywendî bi civakê ve heye û jê qût nabe. Ji ber ku romannivîs takekê civakê ye û peywendî raste rast pêve heye.

Ew dema ku romanivîs weke takekê civakê ji civakê dixeyîde, di wê kevneşopî û yasayên ku ji aliyê bîr û bawariya wî ve nagûncin dijberiya wan dike, ew jî ji reftera û kirdarên karakter rengdaye. Wate ew rengdaneye beşek be ji bîr û bawerîya romannivîs û bi rêya wan tê birin yan helwest, bîr û baweriyên berevajî ye. Wan corên karakter ku bi şêweyek negatîf di hemû aliyên jiyana mirov de di nava romanê de derdikevin û di her du rewşan de jî karakter ji ber reftar, diyalogî û ew rolên ku dilehîze ji bo xwendevan derdikeve, her ev jî dibe mifteya zindîkirina karakter û komek kesayetiyên baş yan xirab, civaka me ji bo derdixe.

Têkildarî peywendiyên karakter û romannivîs Mîşal Boter gelek bi zelalî û eşkere dibêje: (Her yek ji me dizane ku romannivîs bi vê ya nevé, bizane yan nezane, karakterê romanê di jiyana taybet a xwe de diyar dike, hildibijêre û qehraman jî weke maske (demamîk) bikartîne ji paş ve. Çîroka vebêj jî ji vî alî ve xewn pêve dibîne.)⁹⁹

Romannivîs her dem hewl dide peywendîya xwe ligel karakteran veşêre û wisan biafirîne ku xwediyê jiyana taybet a xweyîn. Ew bûyerên ku diqewimin bi sedema kartêkirina karakterane li ser hev, ne deshilata romannivîs. Li ser vê derbarê Ebdûlrehman Mûnif dibêje: (Romannivîs wisan bi mirov dike ku hest bikin ku di paş

⁹⁸ - Bnemakanî Gêranewe le romanî Gulî Şoran de, Muhemad Îhsan, Gelawêjî Nwê, jmare 38, Slêmanî, 2008, R 107.

⁹⁹ - Le Rqewe ta Xoşewystî, Kameran Subhan, weşana: Serdem. Slêmanî, 2007. R 97.

perdeyek veşartî de û ji wê ve karakterên romanê dilivîne û arastayen dike, bîr û bawerî û helwesta wan derdibire.)¹⁰⁰ Wisan nîşan dide arasteker bi xwe karên xwe dikin. Bi bê ewa diyar bibe romanivîs livîn û tevgera wan encam dide. Her wiha baweriya me pêtê ku karakter serbixweyîyek taybetmendiyane heye. Bi xwestek û vîna xwe dilivin û bi bê arastekirina derve yan bi bê destwerdana ti kesekê bi xwe û karê xwe dikin. Ev jî ji bo wê dike ta zindûbûnê bi karakteran bibexşe û weke candareke normal ji xeyal û li ber çavê xwendevanan zindî dike. Ji bo vê divê romannivîs hewarê ji bo lihevkirina taybet û bername darêj ji bo afirandina karakteran bibe. Di dema arastekirina ku karakter ji bo her karekê yan çêkirina her bûyerekê yan ji bo guhertina karakter ji rewşekê ji bo rewşek din, zeminsaziyê ji bo dike, pile bi pile encam dide. Bi şêweyekî ew karakter şîyan û amadeyî ji bo wê guhertinê hebe. (Romannivîs peywendiya xwe ligel karakter li ser bingehê nasîne ava dike.)¹⁰¹ Çend nasînek kûr, dagirtî û bihêz be, ew çend bingehê karakteran ji bihêz dibe û li ba xwendevan ji zindî dimîne. Romannivîs ji berê hemû kesekê karakterê romanê dinase. Încê bi sedema teknîkî û amrazên din ên romanê bi wê şêwaza ku heyî pêşkêşê xwendevanan dike.

Eger çî di romanê de kerekter gelek bin û her yek ji wan rolekê digire. Di çarçoveya ew rola ku heyî karek yan çend karekê encam dide, wate ji aliyê çawaniyê ve di nava romanê de derdikeve û tevlî bûyeran dibe û ber bi pêş ve dibe. Her li ser vî bingehî jî rexnegir û teorizanan karakter li ser Karakterê Sereke û Karakterê Nesereke de dabeşkirine. Ev dabeşkirina karakter jî li ser bingehê çawaniya wî erkî kiriye ku karekterek di encama hevrikî, bi rêkeftin kartêkirin ligel karakterên din encam dide.

1.13 Bûyer û Peywendiya ligel Vegotinê

Peyvîna di derbarê çemkê bûyer û nasandina li rûyê teoriyan ve asan nîne. Ji ber ku her dem axaftina di derbarê çend aliyekê din de, hevpeywendê bi xwediyê bûyerê ve ku bi şêweyêke raste rast di peywendiyêke temamker de ne. Peywendiya temamker bi wateya, nebûna yek ji wan aliyane dibe sedema çêbûna kêmasiyên di pêkhatêya cesteyê naveroka vegotinê de.

Ji berê hemû tiştêkê di vê bûyer komek rastiyên rêkûpêk an berbelav di

¹⁰⁰ - Teşkêk bo ser roman. Abdulrehman Munîf, wergêr: Şîrîn K. weşana Serdem. Slêmanî 2006. R 109.

¹⁰¹ - Le Edebî Rusîyewe, komek nivîskar, wergêr: Enwer Qadir Mhemmed, weşana Serdem. Slêmanî, 2006. R 213.

çarçoveya demê de bi şêweyeke diyarkirî û taybetmendiyên xwe werbigire. Her wiha weke Arîsto di "Poytîka" de gotî: (Bûyer kirdareke destpêk, naverok û dawî heye.)¹⁰² Ligel wê jî bûyer di formîlê de û pêkhateya naveroka vegotina bendan de hem derencam û hem jî sedem e.

Bûyer derencamê kar, helwest û reftarê kesekê ye. Di dem û cihekî diyarkirî de ku cara dawî ew bûyer weke xala sereke yan xala sereke de çendîn bazin, tewer û tewerên din dikêşe û bi wî cihê ku berdewamî bi xwe dide. Ewe jî bi wateya ewan pêwîste karakter li paş encamdana her bûyerekê de amade be. Ji bo wêneyê yek li pey yekê hatina bûyeran di çarçoveya cih û dem de derdikeve. Ligel vê jî berjengê derketina zincira bûyerê derdikeve. Ji bo vê divê ji aliyê din ve dikarin bêjin bûyer: (Zîncîrek rastî waqî ji aliyê organî ve bi hev re peywendîdar in.)¹⁰³ Di rêya destpêk û dawî de xwe didin xuyakirin, her weke li gorî çemka Rolan Barit ji bo dariştin, ji komek erkên kartêkirî ji aliyê sedemek an çend sedemek taybet ve. Komkirina van haletane ligel wan karlêkirinên cûda cûda de cesteyê hunerê teksta romanê pêktînin. Lê belê ew cihê matmayînê ye amadeyiya her demê amraza romanê di nava wan pêkhateyan de ji ber ku hemû reftar, serederî û helwesta firehngî ya kesayetiyên di nava tekstên romanê de li gorî berdewamî û bi dirêjahiya zincîrebûnê, organîbûna bûyerê herdem dibin û dirêj dibin.

Ew amadeyî herdemiyiya bûyerê wisan dike qonaxa vegotinê bê holê. Ji ber ku bûyerek ji holê nebe, vegotin jî çênabe. Eta Qeredaxî dibêje: (Bûyera hûnerî ew zincîre ji nişka ve ku bi vegotineke hunerî vegerandine û çarçoveyek taybet bi xwe digire.)¹⁰⁴ Diyare ev dîtina Eta Qeredaxî me têdigihîne ku em baweriya xwediyê tekstê di derbarê nivîsandina bûyerekê de hildibijêre û piştî di tekstekê de ji berê nivîsandin û bi wê jî giyanê hûnerê peyda dike. Ji wê jî bûyer dibe ew atmosfera ku têde vegotina wê dikeve ser ku bi serê kesayetiyên hatiye. Ji bo vê bi bê yek û direwekê, bûyer movika piştê ya tekstê ye û vegotin jî bendîne.

Merc nîne hemû demekê bûyerên di nava teksta vegotinê de, roman û kurteçîrok ji waqî wergirtî bin, tekst bi teksts berhemê ewê bin, bi wê yekê peywendiya bûyerên di nava waqî de peywendiyêke rêjeyî neke rehayîye. Li ser wê

¹⁰² - Hunery Helbest. Ersto, wergêr: Muhemmed Kemal, weşana: Serdem, Slêmanî, 2006, R 56.

¹⁰³ - Duazdah Name bo Romannwsêkî law, Marîo Bargas Yosa, wergêr: Şîrîn K. weşan: Paşkooy Çawdêr, silêmanî, 2008. R 81.

¹⁰⁴ - Fantazîyaî Gêranewe, Eta Qeradaxî, weşana Serdem, Slêmanî 2008. R 37.

Osher Waîld dibêje: (Gelek caran jiyana zarvekirina hunerê dike.)¹⁰⁵ Helbet eve jî amajeyek başe ji bo wan dîtînên li jor ku merc nîne hemû demê xwediyê tekstê ji waqî ve hildiweşîne yan berevajî bibe. Ji bo wê heye kesekê ji me piştî xwendina romanekê yan çîrokekê berjeng û reftarên kesayetiyek ku bala me dikêşe, biçê dilê me û bandora me li ser çêbibe. Em jî biçin zarve bikin û zarvekirin hevdem bi zarvekirina heman ew bûyerên bi ser van kesayetiyên de hatin ligel wê jî em kesayetiyên waqî, zarvekirina kesayetiyêke hunerî yan xeyalî lê kiriye. Ji aliyeke din ve cûdahiyên di navbera bûyerên romanê û bûyerên jiyane de her ewe nîne ku rastî ewan biselmînin di demekê de nekarin ji ewên din têbigihin. Tenê di çarçoveya tekstê de nebe, dibe ku bûyerên romanê gelek balkêştirin ji bûyerên rastî. Sedema vê jî vedigere statîk û ciwankariya ku romannivîs bi rêya xeyalan ve di nava tekstê de çêdike.

Wate em xwendevan tam ji teksta romanê werdigrin ku bûyer amade be û lê li berçav hebe. Ji ber ku ji bîra me neçe yek ji wan aliyên biryara serkeftina tekstê bi ser de ji rêjeya ew tama ku xwendevan ji wî tekstê digre pêtkê. Her wiha Rolan Bart jî di tama tekstê de bi zelalî behsa wê kiriye. Her wiha ew teksta romanê ku dê bikare bala rexnegiran bikêşe li ser xwe. Ewe ku xwediyê tekstê kariye bi şeweyek zîrekane sereberî ligel bûyerên di nav de bike û bi teknîkek taybet xwe tevlihkêş û tevlihevkinê bike mil bi milê amrazên din bide xebitandin. Wate bûyer ku ji komek (serpêhatî hikayetxwazan di çarçoveyekî diyarkirî de rêk dixe, geşe dikin, kom dibin li gorî wê çarçoveya hunerî ya ku ji bo pirsgerêkan peywendiyek bihêz ligel karakteran heye û piştê jî ji bo xizmeta çînin û votinê karek dikin.)¹⁰⁶

Ew dîtînên li jor me têdigihîne ku bêjîn: Çînin weke beşek ji dest û çengên romanê, dewrek mezin di çawaniya xistina rû ya bûyeran de dilehîze. Her wiha di qonaxa xistina rû de jî bi berfireh nivîskar derdikeve û pêwîste xwedî şewazek baş be di wî warî de. Ji bo bikarin arasteye bûyeran bi aqarek saxlem de derbaz bikin. (Romannivîsê serkeftî pêgirê bîr, bawerî û dîtînên asayî nabe.)¹⁰⁷ Ji bo vê her li gorî gotina navborî ew dikeve qonaxa hizir teng. Eger daxwazê ji romannivîs bike, zelal û vekirî binvîse ji ber ku ew civat û civak fikaran (endeşeyê) diafirîne. Ji bo wê jî

¹⁰⁵ - Cîhanî Roman, Haşim Ehmed Zade, weşana: Endêşe, Silêmanî, 2015. R 126.

¹⁰⁶ - Çîrok u Taybetmendiyekanî, Risr Hêlz, Wergêr: Selah Omer, wezaretî Roşinbîry, Hewler, 2005. R 125.

¹⁰⁷ - Rmanî kurdî, Sabîr Reşîd, . Weşana Aras. Hwlêr, 2007. R 316.

hewarê dibe bi xewn û fanataziya efsane û pêşbînîyan, ca bi bernavê axaftinkerê yekem yan firedengî. Helbet ew ji bi wê wateyê nabe ku êdî bûyer jî pêgirê heman ew şewaza lênerîna romanivîs be, ji ber ku li piştî wê romanivîs dest bi nivîsandinê dike êdî ew nîne ku tevayî prose dibin dest de be. Dibe gelek caran kontrol ji dest derdikeve û xwediyê tekstê arasteyeke taybet ji bo xwe hildibijêre û nivîskar ji bi neçarî dikeve bin deshilata nexwestî ya tekstê. Bêgûman ew halete ji weke çawan beşek gelek bi saya bûyeran bi rê ve diçe. Hevdem xwediyê romanê ji senga bandor û rengdana wê li ser diyarkirina atmosfera giştî ya tekstê dibe. Bi wateyek din bêjin, Ew bûyerên ku romannivîs hildibijêre ji bo ewê tekstê kar li ser bike beşdariyeyeke tamam çalak dikin di fezaya giştî ya tekstê de. Ewe jî rêxweşkere ji bo bikarin bi ciwanî şûndestên xwe di herîkîna reftar û helwesta karakterên cûda cûda de derbixwe yan ewa bi herîkîna " hestên kesayet" bi nav dike. (Wate bûyer amrazekî serekeye ji bo pêkanîna cesteyê romanê, ji ber ku di bûyerê de xwendevan ev hilkişan, dakişan, serkeftin û şikestinê ku bi ser kesayetiyên de tînin dinase. Diyarê ev hemû ewên pêdayî di encama qonaxa vegotinê de derdikevin holê.)¹⁰⁸

Bi wê yekê roman yek ji şewazên girîng ên teksta vogotinê, weke hemû cor û şewazên din ev core tekstane bûye pêwîstî jî bêsinor bê vegotinê heye. Her bûye romannivîs ji bo nivîsandina romana xwe pêwîstî bi hebûna bûyerê heye ta bikare di çarçoveya kiryara vegotinê de dirêj bi kiryara nivîsandinê bide. Teksta xwe di astên avakirina teksteke vegotina tamam de derbas dibe. Ev astane jî ji destpêk, girê, lûtke û dawiyê pêketên. Ew ji di qonaxa vegotinê de romannivîs şewaza xwe têde dixwe rû. Weke di hemû romanekê de û li gorî sîstemek diyarkirî komek bûyer diqewimin, madem bûyerê ji hebû, ew vegotinê jî çêdike. Berevajî jî raste ji ber ku sadetirîn şeweyê vegotinê ji ewa ku bûyereke an zincîreke bûyeran ji bo me vebêje pêktê. Bi şeweyekî giştî vegotina bûyerê di romanê de li ser bingehê çar astên cûda dadinin. Dibe pêkve yan bi cûda bikarbîne di heman teksta romanê de. Ew jî evin:

- 1- Bûyereke ku qewimî be.
- 2- Bûyereke di dem û kêliyên qewiminê de be.
- 3- Bûyereke ku egera qewimînê di seberojê de hebe.
- 4- Hinek car jî xwediyê vegotinê jî dibe bûyer û bixwe dibe çîrok.¹⁰⁹

¹⁰⁸ - pêkhate û Ravey deq, Babek Ehmedî, werger, Mesud Babaiy, Weşana Nima, hewlêr. 2007. R 79.

¹⁰⁹ - Le Staiyîşî Edeb de, komek nivîskar, wergêr: Şêrzad Hesên, Weşana Aras. Hewlêr, 2001. R

Wate, bi ti corekê nabe û nikarîn wêneyê romanekê yan çîrokekê bigirin bi bê hebûna bûyerekê yan zêdetir. Her weke bûyer jî bê cih nabe, roman yan çîrok, wate bûyer jî pêwîstî bi vegotinekê heye ku qonaxa vegotinê cîbicî bike û bike çîrok. Helbet hemû bûyerek dema qewimînê ciyewaze ji dema vegotinê û dema vegotinê jî ciyewaze ji dema nivîsandinê, belavkirin û xwendinê. Wisan bû egera wê yekê heye di heman tekstê de zêdetir ji demeke amadeyî berçav hebe. Yan komek dem bi hev re hebûniyan hebe, bi asta cûda cûda derdikevin û dibin beşek ji teknîk û teknîka tekstê, ev demane jî di çarçoveya vegotinê de derdikevin. Ewên vedibêjin jî behsa bûyeran dikin, bûye zincîra vegotina bûyeran, deman radikêşe û wê nîşan didin ku dem di nava tevgera bûyeran de, dem jî bê coxrafya û cih nabe. Bûye dikarin bêjin, bikarxerê hemû evane bûyere, ligel xwendevan jî ku ew jî dema xwe ya ciyewaze ji hemû demên din.

Weke ji berê jî me behs kir, girîngî dana Arîsto bi vê şêwazê berçave bi bûyera vegotinê, vedigere ji bo wê ku ev duwane pêkhatyên serekeyîn di avakirina trajedî û hevdem (Di nava amrazên din de weke: Keseyat, dariştin, hizir, dîmen, stîran. Bi şêweyê diyar giranî daye bi bûyera vegotinê.)¹¹⁰ Ji hemû amrazên din girîngtir bûyere, ji ber ku bêgûman trajediya zarevekirina kesan nîne, belku di zarvekirina kiyar, jiyar û bextewerî û bêbextî de mirov bi kiryarê ve girêdayiye. Mebest ji jiyarê encamdana core kirinekê ya diyarkiriye ne taybetmendiyeke, kes bi wê taybetmendiya ku heye, kesayetiya wan derdikeve. Lê belê bextewerî û bêbextî bi sedema kirinê ve dibîne. Wate em li ber formîleke alozin ku dikarin ji bo şîrovekirina vê formîlê bêjin: (Jiyar bûyere, xwediyê bûyerê jî jiyane. Bi vê jî digihîn wê baweriyê ku mirov di nava bazineke daxistî (jiyar-bûyer) de ye û di cara dawiyê de jî ew formîle arasteya mirov diyar dike, ji ber ku mirov xwediyê her taybetmendiyeke bin ji aliyê biyolojî, kesayeti û derûnî ve, ew taybetmendiyanê tiştêkin li sînoreke berteng yê kesan de dizivire.)¹¹¹ Lê belê reftar û kirdarên wan di jiyarê de arasteya dahatû û çarenivîsa bi her dû rewşa bextewerî û bêbextî de diyar dike û di paşeroja wan de reng dide.

Ligel berfirehbûn û pêşkeftina aliyên cûda cûda jiyana civaka mirovatiyê, lêkolîn li ser romanê weke hunerek bi bandor ê wêjeyê, berdewam bûn. Bûye dibînin

¹¹⁰ - Kodî Davînşî, Amadekirdin u wergêran: Elî Osman Yaqub, weşana Serdem. Slêmanî, 2007. R 13.

¹¹¹ - Arkolojîyay Zanista mirovayetîyekan, Haşim Salih, wergêr: Şwan Ehmed, weşana: Serdem. Slêmanî, 2004. R 51.

Formalistên Rûsî girîngiyek dane bi derxistina girîngiya bûyer di romanê de bi taybetî û di di tekstên vegotinê de bi şêweyeke giştî, ew hatin di çarçoveya lêkolînên xwe de ew şêwaz diyar kir ku bûyer li ser pêk hatine, pişt girê didin bi yasayên rêzimanî ve, dabeşkirinek zanistî ji bo wan şêwazan bingehe bûyerê xiste rû. (Eve jî rolê zimanê me derdixe, di çawaniya avakirina bûyerê di teksta romanê de.)¹¹² Ji ber ku ziman xwedî deshilatek firehe di sîstema vegotinê de bi wê wateya ku ziman pêktê ji dem, kirdarên demê, tak, kom, bingehe rêzimanî, danîn û derxistin di sîstema peyvan de bi vê yekê wisan diyare ziman di romanê de beramberkirina ligel huneran, gelek sereketir bê û qonaxa xwediyê romanê jî zêdetir di rêya wesifê hemû aliyan de ta vegotina mecasî li ser aliyeke taybetî lê belê ev şêweyê serederîkirinê ligel Formalistên Rûsî ligel ziman bi corekê ji corên girîng amrazên din pêkhatiyên romanê kêmkir.

Bûyer di romanê de çiyê civakan bi temamî bi ciyewaziya wê kirin. Ev jî nêzîkatiyeke pitir bi romanê bexşiyê û di rastî û mijara hîlbijartina bûyeran de jî rastiyan zêdetir kirine. (Romannivîs dikare jiyana paşa an mîrek bike bûyer û babeta romana xwe jî di heman demê de dikare jiyana koleyekê, karkerekê yan her keseke din yê nava civakê bike mijara romana xwe.)¹¹³ Çend bûyereke di jiyana wan kesan de hildibijêre û bi şêwazeke wêjeyî dadirêje û romana xwe jê çêdike. Her wiha dikare ewan bûyerên ku behsa wan dike komek ya bûyeran bin ku bi ser keseke dîrokî de hatibîn, lê belê ya bûyeran ciwan dike û rengîn dike, xeyalên xwediyê romannivîse ku dêt û girîngî bi alî hûr yê jiyana dide û diyar dike û ronahiyê dixê li ser, ew aliyên ku di xwendinê de nediyarin bi wateye wê romannivîs tê kar li ser ew aliyên veşartî û nihênî dike, ku bi hêsanî dernakevin û em xwendevan hest pê nakin heta ewa di romanê de bikarnayînin, romannivîs jî hewarê ji bo derxistina bûyera xeyalî ne sereke ya kesayetiyên dibe, eve jî di xizmeta pêkve girêdanê beşên cûda cûda yê romanê de ye.

Eger bûyera nesereke ji bo pêkeve girêdana beşên cûda cûda yê romanê be, romannivîs li pal wê sûdê ve jî aliyê îstatîkî ya tekstê pê derdixe, ew bêgûman dibe ev bûyera nesereke di çarçoveyeke giştî de bi rêya ziman ve bêne vegotin, ku helbet divê ew çarçoveya giştî jî tenê û tenê bûyereke sereke be, wate ew bûyere

¹¹² - Kitêb u Dunya, Merîwan Wirya Qanî, weşana Endêşe, Slêmanî, 2011. R 94.

¹¹³ - Sofîstekan, Rêbwar Sîweylî, weşana: Serdem. Slêmanî, 2000. R 33.

giştîye ku tewer û beşên romanê li derdorê dicivin û babeta sereke ya tekstê pêk tîne, bûyera sereke teksteke wêjeyî û bi berfireh û hemû alî helbestvan yan nivîskar serederiyê ligel dike. (Piraniya herî zêde teknîkên romanê di wê tekstê de praktîze dike. Her çi bûyer paşgir yan neserekene ewa nivîskar azade li wê ku çawan behs bike û çend dirêj bike.)¹¹⁴ Ew bûyerane erkê sereke bexşîne zanyarî zêdetir bi xwendevan li ser bûyerên din, ligel bexşîna corek ji hemerengî bi babetên tekstê û berfirehkirinê. Fezaya tekstê li ber romannivîs bibandor û jêhatî de vekiriye, eve jî wisan dike bikare sûd ji çawaniya bikaranîna corên bûyerê werbigire.

Diyare mebesta me ji vekirina fezaya tekstê vedigire ji bo firehîya regez û organên hunerî di tekstên vegotinê de ku eve jî wisan li roman dike bibe yek ji herî nermtirînn huner û amrazên wêjeyî. (Ev taybetmendiye jî wisan dike, ev taybetmendiye jî wisan dike romannivîs azad be ku çend bûyera sereke di nava romana xwe de bikarbîne.)¹¹⁵ Her wiha azade li wê jî gelo ew bûyerên bikartîne bûyerên rastîne yan komek bûyerin ku romanivîs bi xwe çêkiriye.

Bûyer di romanê de weke regezên din pêhatiya cesteyê tekstê, şewaza binyat danîna taybet bi xwe heye. Armanc ji diyarkirina binyata bûyerê jî vedigere ji bo wê ku romanivîs bikare bi rê û şewazeke gûncaw bîr û hizrên xwe bigihîne xwendevan. Diyare eve jî piştî derketina holê ya çemkê binyatgerî serîhildaye bi taybetî jî girîngîdan bi lêkolîn di derbarê binyata bûyerê û teksta çîrok hembêzên din, ligel serhildana lêkolînên Formalîstên Rûsî derdikeve.

Renge ew diyarkirina Viktor Şilovskî yek be ji baştirîn ew şewazên binyata bûyerê di romanê de, Şilovskî dibêje: (Karî bi çend rêyekê amraza bûyerê avakir, ew jî ji bingehen şopger û tevlîkarî li xwe girtin, hevsengî, bazinî, tikel, ev dûwaneyên dawiyê zêdetir ji çîrokên sêhîrbazî bikartînin.)¹¹⁶ Helbest weke Şilovskî behsa wê kirî, ew cûdahî di astên wê de ji bo biwarê lêkolînê jî digûnce li ser vegotinê, dibe qûtbûn ji qonaxa pêkhate li aliyekê û bûyerên rastî jî li aliyê din çêbike. Sîstem yek li dûv yekê astên di tekstê de, piştî praktîkirina bi temamî weke xwe, neke ligel rijêmî şîrovevî, rexeneyî de, ku projeya wêjeyî bi xwe dixe li bin teza lêkolînê, armanc jî

¹¹⁴ - Dilnawaîyekanî Felsefe, Alan de Batin, wergêr: Selah Hesên Palewan, Serdem. Slêmanî, 2013. R 79.

¹¹⁵ - Teknîky Dîalog le Kurte çîrokî Kurdî de, Necm Elwenî, weşan: Şefeq, Kerkuk, 2006. R 95.

¹¹⁶ - Wergêranî Rwxsarî Ewanîtir, wergêr: Hendrên. weşana wezateta rewşenbîry, Slêmanî, 2010. R 21.

derxistina peywendiyê di navbera beşan de pişt girêdan bi arman û wergirtina wan ji zanyariyên ziman.

Li paş hemû evane jî romannivîs dikare ji bo xistina rû ya bûyeran, sûd ji teknîkên cûda yê vegotinê werbigire. Me mînakê gelek ya romanên heye ku bi şêweyekî berçav sûd ji flashbak (vegera paş) û nûstalojiya wergirtine. (Rûyeke îstatîkî bi tekstê dibexşin û xwendevan jî tameke rasteqîne jê werdigirin.)¹¹⁷ Yek ji aliyên balkêş, li dûv yêk hatin û kronojî ye, ku tede bûyeran ji zincîrek yek li dûv yek tên lê belê li gorî pêwîstî û xwezaya çîrokê dikare arasteya xwe biguhere. Ji bo mînak: Dema bûyereke encamê wê berhem anîna bûyereke nû be, ji bilî rêgeha xwezayî ya xwe yan di heman demê de rû bi rûya zêde ji waqîf û refetarek bûye, ku şansê paşguhixistinê nebe, hewarê bibîne li ber alîgirên din ji bo berdewamî dan bi çîroka xwe û gihandina rêgeha bûyeran bi wî encamê ku ew tekst di bin nav de berhem anîye. (Teksta vegotinê ji bo berhem anîna ew gotarên ku di bin navê xwe de afirandine, bi pileya yekem pişt bi amraza bûyerê ve girêdidin.)¹¹⁸ Ji ber ku bûyer ew keresteyên ku di wê tekstê de zortirîn destkeftî heye û bi sedema ew amrazên ku avakirina arasteya wê peyamê diyar dikin û armanca tekstê ye.

Ji berê me gotibû ku peywendiya tekst û romanê ji aliyê pêkhatinê ve ji beşên din: Destpêk, berfirehbûn, ji lûtke û dawî pêtê. Her yek ji vane jî taybetmendiyên xwe hene hevdem çend amrazeke sereke jî hene ku raste rast beşdarî dikin di avakirina wê de pêkhatê û ew amrazane jî pal amraza bûyerê ve ji 'kesayetî, cih û dem' pêktê. Hemûyan jî peywendiyên raste raste bi hev ve hene. Diyare eve jî pêwîstiyêke bingehîne ji bo romanê û hemû tekstên vegotinê yê din weke çîrok, kurteçîrok û hwkd. (Ji ber ku ev core tekstane hunerîne pişt bi vegotinê ve girêdidin, ji bo behskirina bûyeran û qonaxa vegotinê jî bi rêya bikarxistina hevokên rêzimanî û amaje pê dike.)¹¹⁹ Bûye hevdem dikarin wan du pêwîstiyane weke du taybetmendî ji bo hemû teksteke romanê danîn. Bi vî yekê ev du taybetmendiyê bandor heye li ser movika bingehîn yê romanê ku ew jî sêgoşeyî 'romannivîs + nêrîn + hêma ye her wiha bandorê jî li ser teknîkên cûda cûda yê

¹¹⁷ - Derbarey Roman u Çîrok, Heme Kerîm Arif, Yekêtî Nuseranî Kurd, Kerkuk, 2008. R 95.

¹¹⁸ - Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî, Perêz Sabîr, weşan: Serdem, Slêmanî, 2001, R 42.

¹¹⁹ - Teknîky Goşenîga le romanekani Bextiyar Elî de, Mistefa Xiwatanî, weşan: Awêr, Hewlêr, 2015, R 268.

romanê weke nîgarkêşî û mûzîkê heye. Yan dîtina şêwaza nû weke: Şepola Hiş, monolog, montaj, flashbak ku dibe pîvana ciwansaziya hunerî ya romana nû.



2 VEGOTIN DI ROMANA GRÊWEYA BEXTÊ HELALEYÊ

2.1 Rol û Bandora Kesayeta Serekî di pêkhateya Vegotina Romanê de

Kesayetî wek rêgezêkî din ê romanê xwedî bandorekî berfirehe di nivîsa pêkanîna romanê de, ji ber wek kesayetî mirovek xwedî xasîyetekî bi taybet ê girêdayî wî bi xwe heye, ku ji ber beşdarbûna wî li gel pêkhateyên din ên romanê de diyar dibe. Ev jî dikare bi çend rêyan ve ji aliyê roman nivîs ve bê aşkera kirin. Giringbûna kesayetekî di nav romanê de dibe sedem ku rêgezên pêkhateyên din ên romanê li gel yek bîr girêdan û ber bi pêş de biçin, wek cîh, dem, bûyer, pirs..hwd. Ji ber tu yek ji wan rêgezane bê hebûna kesayetiyeke pêknayên, bi taybet bûyer. Ji ber diyar kirina rol û bandora kesayetiyan, sedem bo destnîşan kirina bûyeran, herwaha rola bûyerê jî sedemeke bo stranên kesayetan û pêşketina wan. Bi wateya kesayetiya wê bûyerê derdixin holê û bi awayekê pêktînin, ku hêvî ecêbmanê ye. Bi heman awayî cîh û bûyer jî eger kesek nebe tê de niştêcîh bibe û têde tevger bike, wê demê wê ji hev qutbibe û bê wate bibe, lê li gel vê jî her yek ji wan rêgezane nikarin cîhê yek bigrin. Ji ber vê giringiya roman bi rêya pişt girêdana bi çawaniya vegotina kesayetiyan ve çavkaniya xwe digre û bi rêya goşenîgaya yek ji kesayetên romanê ve hemû rêgezin din tîr pêşkeş kirin. (Roman nivîs dema ku kesayetiyan heldibêjêre ji aliyê rasteqînî û aloziyê ve wan heyiyên destxwe de tîkelî yek dike, ku wêneyê li ti mirovekî rasteqîn de tunebe, lê sifetên karakterê pêkhatiyê bi çend sifetê hin kesan din ên jiyana rasteqîn ve dike yek.)¹²⁰ Di vê derê de nivîskar hewldana dehfdan ango tehrîk kirina kesayetiyan dide û bal dikêşe ser hiş û milmilane û hêza wan û bi wî rengî dixwaze kar bigehîne encamekê. Bi armanca bi hev ve girêdana bi taybetî roman û karê tê kirin, ew roman nivîsane xwedî ponijandin û behrekî mezinin ku dema kesayetên nav romanê vedigoherînin û wek kesayetekî mirov pêşkeş dikin, ku nimûneyên wan di nav jiyana de hene. Ew kesayetiyan bi awayekî xwezayî û xasîyetên taybet girêdayî wan bixwe hene, bi awayekê ku hêza dengê wan di nav derûniya wan de dimîne. Ji aliyê din ve pênase kirina azad a kesayetiyan ji aliyê nivîskar ve, bi rêya vegotekirina wî bixwe ve û êş û zihemetiyên derdikevin û li gel wê jî pêkhateya romanê teji dike û wek li xwe mukir hatinekê ye. (Derveyê vê jî roman nivîs di karê xwe de çend kesayetekî din ên xeyalî ava dike û dixwe nav

¹²⁰ - Çîrok u Taybetmendîyekanî, Rîst Hîlz, wergêr: Selah Omer, weşan: Roşenbîry, Hewlêr, 2005. R

helwêstê rawekirina şanoya xwe.)¹²¹ Ji bo vê jî ew kesayetiyane helgirê zimanhal û nûnerê hizir û ponijandin û hêza vegotekirina roman nivîs bixwe ne bo pêşxistinê û bihêzbûna girêya bûyerên romanê ne, lê tiştê ku wek têbinî tê kirin, ji aliyê hin roman nivîsan ve ew e ku çavkaniya serekî ya ji bo pêkhateya wan kesayetiyên awayên cuda vergirtine, hin ji wan giringî didin aliyên derûnî, lê hin ji wan jî giringiyê didin aliyên navxweyî ve û heman demê de hin ji wan jî nixr û giringiyê bi her du aliyên kesayetiyê didin. Ev yek jî vedigere bo wê goşe nîgaya ku roman nivîs bi dîtina xwe li kesayetan dinêre.

Kesayet wek rêgezekî xwedî bandorekî serekiye, di piroseya vegotekirinê de, ji ber bi rêya wan ve bûyer tîn vegote kirin, ev jî peywendiya xwe bi hêza dahênana roman nivîs ve heye, dema ku kesayetiya nav romanê li gel kesayeta dervey romanê ku di rastiyê de ango waqîf de heye, peyvendî li gel ava dike, ji aliyê başî û xirabiyê ve ku kesayet hatibe pejirandin û kesayeta mirov pênase bike, bi awayekî ku hest bi tevgera kiryarî ya kesayeta zindî em bikin, ku em bikarin di dema vegoteya romanê de. Wê demê ew tê wateya ku roman nivîs çawaniya avakirina kesayetê divê baş lê hişyar be, aliyê awayê xwe û babeta xwe û bikare li gel yek li hev bîne, bikare danûstandina kesayetê û bandora wê li ser rewşê û peyvendiyan digoherin bi rêyekî diyar ve bikare pêşkeş bike, ji bo ku ew rola ji kesayêtê re dibexşe bi awayekî herî baş bikare nîşan bide. Ji ber her yek ji kesayetan rolekî xwe yê taybet a xwe heye di vegoteyê de û vebîjîna bûyera romanê de, ew rol jî bi coreya kesayetiyên ve diyar dibe.

Coreyên kesayêtî di vegotina romanê de li gor ew roleye ku wan bi xwe de heye û jê re hatiye dayîn bi wî awayî derdikeve pêş, ji bo vê jî dikare coreyên kesayetan bi awayê du beşan bê dabeş kirin.

2.1.1 Coreyên Kesayêtî li Gor Rol û Bandora Wan di Vegoteya Romanê de

Coreyê kesayetiyên waha di pêşdebirina vegoteyên bûyer û pêşandana wan a di nav romanê de, dikare bi du awayan be. Ya yekem kesayeta serekî ye, ya duyem jî kesayeta ku ne serekî ye. Lê bi awayekî giştî dervey wan her du coreyên kesayetan, kesayetekî din jî rolê vegotina di nav romanê de dibîne heye, ew jî kesayeta vebêjê çîrokê ye, ku heman ew kesayete ku serekî û neserekî xwedî rola kesayeta vebêj

¹²¹ - Le Peroşekanî Jîanewe, Mesud Mhemmad, weşan: Aras, Hewler, 2007. R 34.

dibîne di nav vegotekirina romanê de. Her yek ji wan xwedî bandorekiye di pêşdebirina çawaniya wî armanca hizrî ya romanê de, wê demê rola wan kesayetiyan li gor wî armançê ku roman nivîs dixweze bi encam bike pêktê. Bo zêdetir ronahî kirina wan coreyên kesayetiyan, di beşên peyvendîdar de emê zêdetir behsa wan bikin.

2.1.2 Coreyê Kesayeta li Gor Xwezayî rol di Pêkhateya Awahiya Kesayetan de
Giringiya kesayetan di romanê de ji ber bikaranîna awayê roman nivîs pêktê û dema hewlê diyar kirina wan rola dide, ku bûyeran dixê sitûyê kesayetên nav romanê de, ew jî li gor xwezaya rolên pêkhateya awahiya kesayetan li du awayan çavkaniya xwe verdigre, ku pêktên ji kesayetên geşê dikin û kesayetên sade. Wekî ku (E. M. Forster) derbarê diyar kirina wan kesayetan de dibêje: (Ji ber wî erkê ku di helwesta wan kesayetan de derdikeve, dikare biryar bê dayîn ku ew kese, kesayetekî geşê dike, yan sade ye. Elbet dema ku ew kesayet bi awayekî têr û tejjî derdikeve pêş ev yek pêktê. Eger me bawer kir ku ew kesayetiye pêş dikeve ango geşê dike dikarin bibêjin ew kesayet di nav romanê de kesayeta geşê dike ye, lê eger me bawer nekir wê demê ew kesayet sade ye.)¹²²

2.1.2.1 Kesayeta Geşê Dike

Ev coreyê kesayetiye wek hemû kesayetiyeke û miroveke (Xwedî hin bîr û ramanên taybet ên xwe ye, sifet û pêkhateya kesayeta wî di encama bandora hin bûyeran ve pêkhatiyê.)¹²³ Gelek helwêst û kar û kiryarên nû jê tî hêvîkirin, bi taybet di dema vegotekirina romanê birêve diçe, lê dema roman nivîs dixwaze kesayeta serekî wek kesayeta geşê dike nîşan bide, destpêkê hemû aliyan aşkera nake, ji ber hêdî hêdî li gor pêşketina bûyeran aşkera dibin û geşek dikin û di encama bandora berdewam a bûyeran li ser yek dibe û heta bi temamî hebûna pakhatiya kesayetiya xwe li gel xwandevan di pejirîne, ev yek jî dibe sedem ku berdewam pêşketin û gohertin di rola xwe de pêkbîne di pêgeha vegotekirina romanê de. Di vê derê de ev kesayetiye awayekî aloz dibe, ji ber berdewam kar û çalakiyên nû li benda wî ne.

¹²² - Aspects of the Novel, E. M. Forster. A Pelican Book, Great Britain. 1971. P 36.

¹²³ - Bînay Hunerî le kurte Çîrokî Kurdî de, 1970-1980, Serdem, Slêmanî, 1999. R 64.

2.1.2.2 Kesayetiya Sade

Roman nivîs kesayetiya sade wek pêwîstiyekê pêktîne, ji ber vê jî her di destpêka amadebûnê de xwedî yek sifetêye ku ti helwestekî xwe nabe li hember bûyerên romanê. (Ji ber ku wek kesayetekî pêşnekevî û ne goher rola xwe pêktîne, ku bi rêya vegotekirina romanê de tenê giringî ji rol û nêrîna xwe re dide)¹²⁴ Ji aliyê din ve ti pêwîstiya wî bi taybetmendî û sifetên xwe ber bi pêş de bibe tune. Ji ber bûyer bandore lê nakin, nivîskar ji destpêkê de wêneyekî temam û tejtî bo me dikşîne ku hêza pêşketin û geşekirina wê tune, ji bo vê jî wek bersiva derbarê bûyeran tê zanîn, ev jî tê wateya ku bi awayekî ronî û aşkera hest bi hebûna bûyeran tê kirin. sadebûna wan kesayetiyan pir caran vedigere bo sedemê wênekêşîna kesayeta geşe dike, ji ber pêşketin û geşe kirina kesayetiyan serekî ji ber rola kesayetiyan sade encam dide, di dema vegotinê de jî ev yek diyar dibe. Ji aliyê pêkhatiya awahiya hûnerî ve dikare bi awayek asanî kesayeta wê bê ava kirin, ev jî dihêle ku aliyên derûnî û nerînên bi temamî nayên aşkera kirin, tenê bi çend risteyekî kurt a nav dilê wan core kesayetiyan tê aşkera kirin.

(Mebest ji kesayeta sade nayê wê wateyê ku ti rolekî giring di nav vegotekirina romanê cîh nagrin)¹²⁵ Ji ber rola wan kesayetiyan wek alîkariyeke bo nivîskar di bingehe kirina kesayetiya pêşdikeve de, pir caran ji wêneyê çinekê de civak tê dîtin, wê demê bi kesayetiya sade wek bingehe giring ê hûnera romanê bixwe tê danîn.

2.1.3 Rola Kesayetiya Serekî di Vebêjîna Romanê de

Kesayetiya serekî xwedî rolekî giring û bi bandore di pêşketinê bûyer û vegotekirina romanê de. Ew kesayetiye pir caran ji aliyê hin roman nivîsan ve erkê vebêjîne jê re tê dayîn, ev jî tê wateya ku hem vebêje, hem jî kesayetiya serekî û qehremane, lê hin caran roman nivîs wek vebêjekî bixwe behsa rol û kar û kiryarên kesayeta serekî dike, ew jî tê wateya ku çawaniya vebêjîna bûyeran ji ber kesayeta serekî pêşkeş dike. Rola vê kesayetiye peywendiya xwe bi kesayetiyan li kêlekê ango pir bi bandor re tune, ji ber ew jî keseke ji kesayetiyan û ti cudayiyekî wî li gel kesayetên din tune, lê ew kesayetiya serekî serevan ango babetekê pêktîne ku kesayetên din li derdora wî dizivirin û ew role serekî dilîze. (Li gel vê yekê jî

¹²⁴ - Nusîn u Dahênan, Mhemed Îsmail, Aynde, jmare, 72, Slêmanî, 2002, R 126.

¹²⁵ - El Waqîiye Fî Edeb El Kurdî, Îzeddîn Mistefa Resul, Aras, Erbil, 2010, R 176.

nivîskar ew tiştê di zîhnê wî de heye ku wan tiştan hemûya di kesayeta wî de komdike û bi rêya wî ve aşkera dike)¹²⁶. Bi vê yekê ve bûyerên di hizra nivîskar de, di navbera nivîskar û kesayetiya serekî de dewirdayîm dike. Ji bo vê jî kesayetiya serekî di romanê de bûyerên pêktên di teqîne û wek benekî ku zîncîra di nav romanê de tevdigerîne ye.

2.1.4 Rola Karakterê Serekî di Romana (Grewî Bextî Helale) ya Eta Nehayî de
karakterê serekî di romanê de (Grewî Bextî Helale) a Eta Nehayî de Helale ye. Helale keça zilamekî tê naskirin ê rojhilatê Kurdistanê yê bi navê Heme Reşîd Axa ye. Helale di navenda bûyerên romanê de piraniya çîrok di derdora wê de dizivirin. Buyer piraniyên xwe li Ewropa û bi taybetî li Swêd pêktên. Vegoteyekî pir heye di dema vebêjîna serdema jiyana Helela li Kurdistanê de. Ew Vebêjîna di romanê de gelek balkêşe û nivîskar bi zimanekî pir ronî û gelek car helbestvanane çîrokan vedibêje. Helale qurbanê hizir û aqiliyeta çanda zilam salarî ya kurd e. Beşek piraniya romanê ji rexnekirinê re hatiye cuda kirin û ew aqiliyeta zilam salarî ku rêz ji jinê re nagre û heta li welatekî wek Swêdê jî kuştina jinê ranaweste. Roman ji vê derê ve destpê dike, ku Şêzadê zilamê Helale xencerekê, ji xencerên rojhilatî li ser singê Helalê diçeçîne û dixwaze ew şerefa wî ya ji destê wî çûye carekedin bidest bixe, bi kuştina Helale vex we ji dilpîsî û xewnên nexwaş rizgar bike. Roman bi wan vegoteyan ve destpê dike.

(Ev çarenivîsa te ye Helale, ku xencerek çiya bi çiya, bajar bi bajar û welat bi welat bikeve dû te, heta li vê derê, li Stocholmê li taxa Fleminsiberg, nehemîn û çarem awahiya hejmara hejdehê de li singê te de bi çeçe)¹²⁷. Wek em dibînin Helale dibe mifteya vebêjîna bûyeran û di yekemîn hevokê de nivîskar navê Helalê tîne û çawaniya lêdana wê ya bi xencerê li ser dilê wê vegote dike, wê demê dema roman destpê dike, û vedibêje buyer pêkhatine, dem ew deme ku Helale li ser textê nexwaşxanê ye, xwandevan li benda mirina wê ye, ji ber navnîşana duyem a romanê (Paşeroja jiyana baskdareke koçer e). wê demê Helale ew baskdara koçer e, ku li hemû dem û çirkeyan de li benda mirina wê tê kirin e. Helale di jiyana xwe de wek baskdarekî koçer azad bûye, hin caran xortên jiyana kirine pir zêde ji xortên hemtemenê xwe şerm û netirsîne, bavê wê rêz lê girtiye û bi awayekî azad perwerde

¹²⁶ - Pêkhate u Ravey Deq, Babek Ehmedî, wergêr: Mesud Babayî, Nima, Hewlêr, 2005. R 92.

¹²⁷ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, weşana Renc, Slêmanî. 2007. R 7.

bûye, li Swêdê li zankoyê xwandiye û li radyoya Swêdê beşa zimanê rojhilatîyan de karmend bûye, berevanî li mafên xwe kiriye û serê xwe ne tewandiye ji daxwazên ne rewa yên kesên derdora xwe re, li gel zarok û hevjinê xwe xwestiye bê pirsgirêk bijî û hewldana xwe gehandin û pêşxistinê di gelek alîyan de daye. (Wê rojê Helale gotina xwe ya dawiyê kir û biryara xwe ya dawiyê da. Got: Ez û Arezû ne bo mehekê, yan du mehan, bo rojekê, heta bo yek demjimêr jî na vegerin, dema betlaneya havînê de emê biçin bo Avustralya, emê biçin bo Romanya, Misir û Efganîstanê... çî dizanim êdî her bo kîderê be lê bila dervey vî cîhê kawilbûyî be ku, tu jê re dibêjî niştiman.)¹²⁸. Wek em dibînin Helale çen berevanî li bîr û ramanên xwe dike, serê xwe ji derdora xwe re na tewîne, ku jê daxwaz dikin vegere niştiman û pirsgirêkên xwe yên li gel Şêrzadê hevjinê xwe çareser bike. Di cîhekî de ku hîn keçekî biçûke û li niştiman de dijî û wek kurekê jiyan dike (Helale digot: xwe ez ne keç im, ez kur im!)¹²⁹

Herwaha bo ku îspat bike ku kur e, cilûbergê kuran li ber xwe dikir, kiras û pantolekî kuran ê rengê xakî, di rengê cilûbergê wan çekdarên ku ref bi ref dihatin mala wan. Çekdaran çekên wan bi dîwarê odeya bavê wî ve daliqand. Helale li çekên wan dinêrî. Carna jî destê xwe didayê û têkeli bi tirs û keyfxweşiyê ve lê dinêrî û destê xwe sera tîna. Çek hemû jî sar bûn, tund û qahîm û teji bûn. Yek ji mêvanan ku zilamekî di temenê bavê wê de bû, jê re got:

(Heme Reşîd Axa ev kurê te yê biçûk jî, her di naha de keyfa wî ji çek tê û berê xwe da Helale û got: Helgire kurê min, rake bizane ka girane yan sivike?

Giran bû

Heman zîlamî got: (Kurê min navê te çiye?)

(Navê min)

xwest bibêje Helale. Lê bavê wê xwe di bera kir û got(Helmet)¹³⁰

Gelek kesayetên din hene ku rolên li kêlekê û xwedî kesayeta pêşketinê ne, berdewam li tenişt Helale kesayeta Şêrzad heye, Şêrzad wek sîbera berdewam a Helale amade ye, Şêrzad xwedî kesayetekî ne qahîme, bingehêkî resen û xwedî îradeyekî bihêz nîne, ji aliyekê ve dibe çekdar û zîrevanê Heme Reşîd axayê bavê

¹²⁸ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 43.

¹²⁹ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 61.

¹³⁰ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 48.

Helale, piştire jî dervey îrade û biryara wî, rêdikine Swêd, wê demê dikare bê gotin Şêzad kesayetekî bê biryar û şikest xware. Ew qas sal li Swêd dimîne lê hîn jî ziman nizane, (Şêzad heft sal bû hatiye Swêd û hîn jî Swêdî baş nedizani. Hîn jî karê xwe yê pîşeyî de ne pispor bû. Gelek tiştên din jî di wî de nebû...) ¹³¹. Aşkera diyare Şêzad xwedî piraniya sifetên negatîf ango neyênî tê de kom bibûn, li hember vê yekê Helale berevajî vê yekê xuyaye hewl dide ku li ser pirsgirêkên jiyane serkeftî be û hewl bo paşerojekî baştir dide. Çi tiştekan wan nayne gel yek lê tenê ew zewac û hevsergerî nebe ku di çarçoveyekî civakî de biryar li ser hatiye dayîn.

Helale wek kesayetekî serekî, wek jin, wek qurbanî, nûnerê jinên xwedî bela yên rojhilate. Ji ber vê jî bûyerên romanê ber bi pêş ve diçin û dibe diyardeyeke serekî di navenda romanê de rawestayê û heta dawiyê jî li berxwe dide.

Kesayeta serekî berdewam rolekî giring dibîne di vegoteya romanê de, bûyerên giring di çavdêriya wê de pêktên û her ew jî destê wê di piraniya stranan de heye, Helale wek kesayeta serekî ya di romanê de di gelek bûyerên naxweş re derbas dibe û gelek astengî tene ser rêya wê, lê ew berdewam rêyekê dibîne bo ku ji wan astengan rizgar bibe. Helale kesayetekî paşde gav navêje ye û jinekî bihêz e. Di nav tiştekan ne pêkan de kar dike û dixwaze bigehe xewnên xwe. Qurbaniyê dide, alîkarê kesên din dibe, dayîke, hevjinê başe, xwedî kar û wezîfe ye, lê ev hemû tiştane li gel yek ne asan in, ji ber hevjinê wî li gel wê baş nîne. Pirsgirêka serekî ya Helale li Swêdê tenê jiyana hevseriyê. Helale dilê wê, bi wê peymanî civakî ya ku nabe ser re bibûre û serê bavê xwe û eşîreta xwe şor bike, tenê ji bo navûbangê civakê li gel jiyaneke teji li êş û zilamekî dil req çareser bike. (Helale êdî ti tiştekan negot. Fikirî berê jî gelek car bo çend tiştên cuda li gel bavê xwe grêw ango ketibû rikberiyê. Fikirî û hat bîra wê her carekê jî li hember bavê xwe binkevtibû û bavê wê serkeftibû. Gelo vê carê jî eger li gel bavê grêw bike dîsa wê binkeve, an wê ji bavê xwe bibe. Lê piştirast bû ku vê carê berevajî carên din ewê ji bavê xwe bibe û bavê wê dê binkeve. De başe çima grew li gel bavê xwe neke? Başe çawa grew li gel bigre?) ¹³². Helale berdewam di grêw de bindikeve, heta li di grêwa bextê xwede jî, wek di navnîşan romanê de jî amaje pê hatiye kirin de. Helale peyvendiyan wê li gel bavê wê pir başin, berdewam wek kurekî danûstandin li gel kiriye, heta astekî şerm

¹³¹ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 15.

¹³² - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 235.

jê nake, lê dîsa jî ew biryar dide Helale li gel kê bizewice, yan ne zewice. Ev grêw ango rikberiya ku Helale li ser wê ye ku eger çend rojekan xwe li Braymok dût bigre peyvendiya wê bi dawî nayê û Braymok na vegere bajêr? Ev rikberiya bavê wê bo wê ye ku ji Helale re bibêje dest li Braymok berde û ez naxwazim tu li gel wî bizewicî. Wek piştî jî ronî dibe ku bavê wê xwedî plan û nexşeyekê bûye bo zewicandina keça xwe. Şêzad wan gotinan vedibêje: (Got pir hewlda, hewlda di wê heyamê de ku Helale li vê derê bû ji bîra xwe bibe, lê nekarî. Got şev û rojan bîra wê kir ku divê jibîr bike û nekir. Heta ku rojekê Heme Reşîd axa wek ferîşteyekê ku ji esman ve hatibe xwarê û peyamekî mezin li gel be pêşneyarek bo kir, ku welat bihêlê û bête bo vê derê. Got wê ferîşteyê dervey wê peyamê, mûcîzeyek ji li gel hebû. Got ji bo zû û bi silametî bigehe, rêya herî baş ew e ku Helale re bizewice û mara wê li gel xwe bike. Got...) ¹³³. Wek diyar dibe Helale bixwe hevserê xwe ne helbijartiyê. Ji ber bavê wê zilamek wek hevser ji Kurdistanê ve bo rêdike Swêd, ku ev jî dijî bîr û ramanên azad ên Helale ye, wek kesayetek wek cemedê û ji xwe bawer. Helale raste di navenda bûyeran de ye û beşekî piraniya çîrokê peyvendiya xwe bi wê ve heye, lê li gel wê Şêzadê hevserê wê û mamosta Seîd Rehmanî hene, piranî ew dibin mijara romanê, Şêzad bê sifetiya xwe ve hevserê Helalê ye, Seîd jî hem mamostayê Helalêye hem jî vebêjê romanê ye. Ji bo vê ne asane kesayeta serekî ya vê romanê bê destnîşan kirin, dibe her sê jî wek yek kesayeta serekî bîn destnîşan kirin.

2.1.5 Rola Kesayetiya Kêlegê di Vebêjîna Romanê de

Rola kesayetiya kêlegê heta astekî ji rola serekî ya romanê kêmtir nîne, ji ber pir car wek kesayeta serekî derdikeve pêş û teşfîq dike ku kar bi awayekî baş bi encam bibe, herwaha ew bîr û ramanên di derûniya kesayetiya serekî de heye, di dema peyvendî kirina vê kesayetê ya li gel kesayetên derdora xwe aşkera dike, wekî ku radibe bi hin karên giring pêktîne, ji wane beşdar kirina awahiya bûyeran an jî pêkhateya kesayetiya serekî re alîkar e. (wê demê dikare bê gotin gur û germeke giring ji kesayetiya serekî re dibexşe ku, kesayetiya serekî karê vebêjîna bûyeran bikarê encam bide) ¹³⁴. Li gel wê jî her çend kesayetiya kêlegê xwedî rolekî serekî nebe jî di vegotinê de, lê wek alîkarekî derdikeve pêş, ku alîgirê dahênana roman nivîse bixwe ye, bi tayber di rol û pêkhateya kesayetiya serekî de. Li gel vê yekê jî li

¹³³ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 258.

¹³⁴ - Teknîky Gêranewê le çîrokekanî (Marf Xeznedar)de, Şukirye Resul, wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2010. R 163.

hin cîha de wek berdevkê nivîskar derdikeve pêş û erkê vegotinê piroseyê de vedibêje, ev jî vê yekê pênase dike ku ew kesane ji ber zêdetir li kêlega jiyane de dijîn û kar û kiryarên wan ne mezinin, heman taybetmendiyên wan kesane ye û wêneyekî din ên wan kesane derdixin pêş. Li gel vê yekê jî pir caran ew kesayetiye wek kesayetên ne zindî tîn dîtin, dema ku hewl dide wêneyê kesayeta serekî bikşîne, ca çî bi sifetekî baş be, yan jî xirap be zêde ne girînge, ji ber tiştê li vê derê girîng ew rola ku dibîne ye di vebêjîna nivîsa romanê de ye, ji ber dervey rolekî ne serekî ti rolekî din di çîrokê na vebêje û ti cudayiyekî wî jî nîne li gel kesayetên din, lê coreya rola wî ku kesayeta kêlegê ye wê pêktîne û ji goşeya xwe ve li bûyer û kesayetên din ên di nav romanê de dinêre, di vê derê de awayê bikartê, derbarê nêrînek an sifetekê de hewldanên wî hebin jî, hinek astek jêrîn de ne û pêşnakeve, hewayê xweşiyê her bixwe di xulqînê, vê derê de giraniyekî ronîbûna ya berê li berçav hatiye derbas kirin xwe dide derve, lê ev yek nayê wê wateyê ku kesayetiya li tenîştê berdewam xwedî rol û bandorekî nayê gohertine û di çarçoveya qalibên hatî diyar kirin de tevdi gere di vegoteya romanê de, ji ber ev rol û bandor hin car û deman de pêşdikeve û mil bi milê kesayeta serekî ve piroseyê vebêjîna birêve dibe, ev jî wê demê derdikeve ku li gor pêkhateya awahiya kesayetan rol û bandor tê lîskandin.

2.1.6 Rola Kesayetiya tenîştê di Vegotina Romana ‘‘Grewî Bextî Helale’’ ya Eta Nehayî de

Kesayetên li tenîştê rol digrin di romana Grewî Bextî Helale de hejmara wan pirin, hin ji wan çend carekan kêr derdikevin pêş û beşdarî li rêveçûna romanê dikin û piştê jî wînda dibin. Wek (Braymok û Seîd Rehmanî) ew du kesayetiyanê dî karakterên cuda ne û di du qonaxên cuda yê Helalê de derdikevin pêş. Braymok li Kurdistanê, Seîd Rehmanî jî li Swêdê, her du jî kesayetên balkêşin li gel Helalê. Helale ji herduyan jî hesdike û rêz li wan digre. Şêrzad ji her du yan jî acize û ji wan hesnake. Beşekî zêde di romanê de derbarê nakokiyên wan kesayetiyan digre navxwe.

(Helale bîranîna Braymî dikir, bîrhateya Braymok ku ciwanekî esmer û kras û şaleke rengê xakî li ber xwe dikir. Cemedanî û egal li serê xwe girênedida, lê cemedanî li ser milên xwe re berdida. Berçavkek dida berçavên xwe û çantekî biçûk li milê xwe dikir. Çanteyê Braymok ti tiştêk têde tunebû, tenê defterek û çend pirtûk û filûtek, li gel qotiyekî ku sabûnek biçûk têde bû, herwaha amûrên rih traşînê, li gel

amûrên didan şîştinê têdebûn. Albûmeke biçûk di pêşîra wî de bû, li gel çend wêneyan. Braymok wê demê nebû, demek bû çobû...Helalê digot ‘‘Braymok çûye berfa ser zozanan bi helîne. Bila zozan hemû belek belek bibin wê demê ew jî dê vegere.’’ Bi devekî ken wisa gotibû, dev û çavên dibiriqin ve wisa gotibû. Na... Ewrekî pêş çavên wî yên dibiriqin girtibû, ewrekî awis û bi giryan ve)¹³⁵. Lê Braym ne vejeriya. Ne vejeriya, sê çar mehan piştî çûna xwe vejeriya, bi bedenê xwe yê sar û req reviyê. Braymok kesayetekî xwedî rolê teniştê ye, lê bandorekî kûr li ser Helalê kiriye. Elbet çîroka Braymok û Helalê dûr û dirêje, li gor giraniya derketina cîhê destê xwe li ser romanê ango şopekê dihêle. Seîd Rehmanî karakterekî din ê xwedî rola teniştê ye ku li Swêdê jiyan dike û bi rêgez jî xelkê Îranê ye û li Swêdê mamostaye, temenekî zêde jiyan kiriye û nivîskar û akademîsyene. (Di rastiyê de xwande van heta naveroka romanê nizanibe, ku vebêjeya Seîd Rehmanî bi xwe aşkera dike û bixwe di nav romanê de heta astekî vegoteyê pêktîne û ev jî tê wateya ku Seîd hem karakterekî teniştê ye, hem jî vebêjê romanê ye. Piştî di beşa rola kesê çîrokê dixwîne de em li ser vê behsê jî rawestin.) Şêzad ji Seîd acize, ji ber xwe nêzîkî Helalê dike, li gor wî dervey mamostayê dibistanê, tiştêkî din di navbera wan de heye, Seadeta dayîka Helale telefonê bo Helale vedike û gazindan lê dike ji ber vê karakterî:

(- Tu dixwazî bo pîremêrekî beredayî haşa li wî zilamê kilole bikey?

- Kîjan zilamê kilole?

- Şêzadê bê dev û ziman. Ew...Ew pîremêrê ecem ê sebab ew qasê tîne ku haşa tu ji mêr û zarokê xwe dûr bikevî? Ma wê hindê tîne...

- Ew pîremêrê sebab mamostayê min e... ji dayîka xwe re negotibû ji Şêzad re gotibû. Gelek jê re gotibû. Gotibû mamostame, dervê wê jî hemwelatiyê me ye.)¹³⁶

Wekî diyare xalên nakokî yên Helale û Şêzad (mamosta Seîd Rehmanî) ye, li gor kêmbûna xwe ya wek karakterekî xwedî rolê teniştê, lê gelek hatûçûn û gengeşe di navbera wan de ye.

¹³⁵ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 18.

¹³⁶ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 221.

Mecîd kesek dine ji kesayetiyan xwedî rol û bandorên tenîştê û birayê Helalê ye. Mecîd pîrsgirêkên wî li gel bavê wî heye û nêrînên wan ên siyasî cuda ne, Mecîd ser bi partiyeke çep ê komînîst e, ev yek jî li gel bavê wî Heme Reşîd axa ve nayê pejirandin. Ev nakokiyane beşekê vegoteya romanê li gel xwe dibin. Li gel jiyana Helale û hevjinê wê, ew çîrokane jî amaje pê tînin kirin. herçend Mecîd kêma derdikeve pêş di nav romanê de, lê pêgeh û giraniya xwe heye û berdewam li gel derketina tiştan di goherin. (Ji wê dema ve Mecîd rêbaza xwe ya siyasî jî bavê xwe cuda kiribû. Bav û kur her yek ji wan li ser partiyek û rêxistinekê bûn, nêrînên yek ne di pejirandin û li gel yek pêknedikirin. Dema ku li gel yek ban li gel yek şer dikirin. Bavê wî digot; kurê bela, cîha ku bikeve cîhê bavê xwe, ketiye dû çend ecemên komînîstên beredayî. Cîha kuEw ecemên beredayî ku Heme Reşîd axa behs dikir, rêveberên partiya Mecîd bûn. Heme Reşîd axa digot: tu dixwazî çek rakî û xwe bidî kuştin, welatê xwe, ji bo gel û netewe û xelkê bajarê xwe re tu çima xwe nadî kuştin? Mecîd digot: Ez ji bo mafê karker û zihmetkêşan şer dikim.)¹³⁷. Bi wî awayî şerê bav û kur berdewam dibû û dibûne beşek ji pêkhateya romanê û bûyerên nav romanê ber bi pêşde dibin. Dikare em karakterê Mecîd wek karakterê ku cemedî çav lê bikin, ku îdeolojiya bavê xwe di cemedîne. Ew bixwe xwedî bîr û bawerî û îdeolojiya xwe heldibijêre, ne ku dervey îradeya wî tiştêk li ser bê ferz kirinê bi pejirîne. Mecîd, raste xwedî karakterekî rola tenîşte, lê di her derketinekî wî ya pêş de dikare xwe ferz bike û bala xwandevanan bikşîne.

Kesayeta xwedî rolên tenîştê di romana Grewî Bextê Helale de pir hene û em nikarin û derfetên me tuneye ku li ser hemûyan rawekirinê bikin û erk û rolên wan em diyar bikin. Heme Reşîd axa û Seadeta hevjinê wî, herwaha Gulaleya xwîşka Helale car car derdikevine pêş û nivîskar nîşanî pîrsgirêkên wan jî dide. Heme Reşîd axa wê demê çavê wî li Gulale bû, bi devkeniyekî bavikî û bi mîlhrebanî ve li wê dinêrî. Dibe ji ber dizanî ku ew li hemûyan zêdetir jiyana bajar û nav bajêr hesdikir. Lê berevajî wê yekê nêrînên Gulale pir zêde ji bo wî pir giring nebûn. Bajar an jî gund, piştî demekî din wê Şehab rêkiriban xwastina wê û bo berdewam ji malbata xwe dê cuda biba. (Şehab gotibû: Kekê Mecîdê birayê xwe li xwe aciz neke. Li gel dayîk û zarokên wê here gel bavê xwe. Gotibû: Du yan jî sê mehên din êzê

¹³⁷ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 167.

rêbikime xwazgîniya te û bo berdewam êdî tu dê li bajar bimînî.)¹³⁸. Wek em dibînin kesayetiya xwedî rolên tenîştê wek Gulale û Şehab beşekî ku nayên qutkirinê ne di romanê de. Ew jî bi qasî giraniya xwe xwedî bandorin di projeya vegotinê de. Kesayeta tenîşt ku dema têne pêş, bala xwandevanan zêdetir bo bûyeran, an jî çîrokekî din a tenîştê dikşîne û ji babeta serekî yan jî ji bûyerên serekî xwandevan qutdike. Hin caran kesayeta xwedî rola tenîştê babeta serekî ji bîra xwandevan dibe û bixwe dibe figurê ku nivîskar bi çend rûpelan cîh jê re veqetandiye de dibe diyardeyek, wê demê berdewam rolê kesayetiya tenîşt di vegotinê de nabe bê jibîr kirin. Kesayetiya tenîşt wek sitûnekî bi cîh kirina çîrokê pir pêwîste, hin caran kesayetiya tenîşt alîkarê kesayetiya serekî dike ku berdewam be, berdewam be di pêşkeşkirina çîroka nû, ceribandînen nû û serkêşiyên nû de. Pir caran karakterê tenîşt em ji karakterê serekî baştir dinasin. Wekî ku di vê romanê de, em Helale ji ber Seîd Rehmanî dinasin. (Helale di nivê gotinên xwe de rabû parkê xwe li ber xwe kir. Ez jî li dû wê de rabûm û em li gel yek çûn derve. Li derve em mil bi milê yek, di meşiyên û Helale behsa ew pîrsgirêk û zihmetiyên heyî behs dikir, ku rastî birayê Şêzad û Şêzad bixwe hatibûn. Min bêdeng bîr dibire ser. Her bîr û nêrînekî bi dehan pîrs li gel min ava dikir. Helale bo çî gotibû di pasê angoyê otobûsê de ye, ber bi malê diçe? Çima negotibû li gel min e? çima li gel daxwaz û pêdaçûn ji aliyê min ve jî ne pîrsî bû? Çima ti îşaretek ji min re jî nekir? Ew helwêstê Helale ne asayî bû. Ew derewa bi qesdî bû. Wê dema ku derew kir rûyê wê ji şerma re sor bibû. Bê ku li min binêre kenekî tewanbarane li ser rûyê wê dev û lêvên wê rûniştibû.)¹³⁹. Wek em dibînin xwandevan bi rêya kesayetiya xwedî rola tenîştê ve wek (Seîd Rehmanî) baştir Helale dinase, hest bi pîrsgirêkên derûnî û jiyana civakî dike û baştir dinase. Ji bo vê jî kesayeta tenîşt pir caran wek eynikekî wêneyekî ronahî ya kesayetiya serekî nîşanî xwandevanan dide ye.

Giringî dana roman nivîs ya bi karakterên serekî û zêdetir derxistina pêş a di nav bûyeran de, nayê wateya ku karakterê tenîşt li kêlegekê bihêle û ji aliyê din ve jî ne girînge. Ji ber li gel roman nivîs hemû karakter hem serekî ne, hem jî karakterên tenîştin, bi erênê û neyênîyên xwe ve girîngin û cîhê xwedî nîrxin. Ew jî ne li ser bîngehê karê wan û dehf dana wan, yan jî çêkirina bûyeran, ji ber di dahênana xwe

¹³⁸ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 111.

¹³⁹ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 343-344.

de, bê guman herkesek dahêneriyekê daytîne, bila biçûk jî be, dixwazê dîsa jî bi awayê herî baş ava bike û kesên verger pêşwaziyekî baş lê bikin. Roman nivîs jî ji ber karakteran ji jiyanê verdigre û bixwe çawa ji jiyanê hesdike û mirinê naxwaze, bi heman awayî dixwaze karakterên xwe jî wê rêyê de bibe ku mirinê nexwazin û wan bi zindî bihêle. Zindî hiştina karakter jî bi jêhatî û giringîdana roman nivîs ve girêdayî ye, ku çend bi bingeş kirina de serkeftinan bidest tîne.

Elbet di vê romanê de kesayetên serekî hejmara wan pir e, em di vê derê de tenê dikarin vê behsê bikin ku, cîhê destê wan di vegoteyê ber bi pêşde birina romanê de diyar e.

2.1.7 Rola Çîrokbêj di Vebêjîna Romanê de

Awayê vebêjîna çîrokan peywendiya xwe bi ziman ve heye, ku têde roman nivîs radibe, bi çîrokbêjiya kesayet û kirina çîrokekî bûyera romanê, lê çîrokbêj ne taybete bo kesayetek ku romanê vebêje, ji ber pir caran kesayeta serekî û kesayeta tenişt, rolên çîrokbêjiyê dibînin, lewma Rîst Hîlz dibêje (Çîrok kiryare, kiryar jî avêtina derve ya çend kesekane û di encamê de peywendiya navbera wan bixwe de hêdî hêdî pêşdikeve û tiştên din di derdorê de tîn çandin û heta pêlên wê jê dibin û aloz dibe)¹⁴⁰

Herçend formalîstên Rûsî li gor wan naveroka çîrokê û pêkhatiya çîrokê li hember yek radiwestin û têkel yek dibin jî, ji ber naveroka çîrokê (Hin bûyer li dû yek tîn û di navbera wan bixwe de, ku bi rêya çalak kirinê ve ji me re tê ragehandin, navroka çîrokê dikare bi rêya kiryarî ve bê pêşkeş kirin, bi rêya sîstema xwezayî ve li ser bingeşê: Sîstema dem û sedmên bûyerê, li hember naveroka çîrokê, bingeşê çîrokê bixwe heye ku ji heman bûyerê pêktê, dikare sîstema derketina wan di kar bixwe de bê parastin.)¹⁴¹

Çîrokbêj keseke bi awayê şewirmend derdikeve pêş, bi bend û amajeyên xwe ve me di dema vegote û vebêjîna xwe de fêr dike. Ew şewaz jî zêdetir jî di romanên teqlîdî de derdikeve pêş, lê ev nayê wê wateyê ku kesayeta çîrokbêj ji şewazê romanê nû bê beşe di vebêjîna çîrok û fêrkirina xwandevanan de. Em dikarin bibêjin peywendiyekî herêma çîrokên kevin de cîh bûye, tê de fêrkirineke exlaqî yê pir giring û dibe dîwarek di derdora bûyera behsê de, lûl dibe û li yek di alê. Eger em

¹⁴⁰- Çîrok u Taybetmendîyekanî, Rîst Hîlz, wergêr: Selah Omer, weşan: Roşenbîry, Hewlêr, 2005. R 16.

¹⁴¹- Le Edebî Rusîyewe, komek nivîskar, wergêr: Enwer Qadir Mhemmed, weşana Serdem. Slêmanî, 2006. R 204.

ji vî alî ve lê binêrin, divê em çîrokbêj wek fêrker û hekîmekî çav lê bikin, berevajî pend, fêrkeriya çîrokbêj wek fêkirina çend rewşekî kêm û teng nagre navxwe, ji ber gelek rewş û tiştan li xwe digre. Ji ber rê ji çîrokbêj re hatiye dayîn ku çavekî bi giştî li ser bûyerên ecêb û xerîb ên jiyane re derbas bike. Di vê demê de çîrokbêj berdewam bi mezinî di dilê xelkê de dimîne, ji ber ew tiştên ku vedibêje, ezmûnên jiyane ne, wê demê ezmûnên jiyana xwe û yê xelkên din jî bi awayekî berfireh vedibêje, lê yek ji awayên çîrokbêjiyê ve dadirjîne, ku hin caran rûpelek an jî du rûpelan ji bo yek tiştî vediqetîne û çîrok nivîsî bi hêz û teknîkê nû de, ku bi çend risteyekî di dest wî de ye vedibêje û ji vê re jî tê gotin awayê bruskeyî ango şiroveyî di dariştinê de.

Giringiya rola çîrokbêj di vegotina romanê de pir caran dibe sedem ku ew kesê ku bi taybet çîrokê jî dixwîne, beşdarî vê vegoteyê bike, ji bo vê jî xwandevanê çîrokê hemû demê wî aliyê guncaw ji xwandevan û guhdar re ava dike û wî aliyê derûnî derdixe derve, bi vê yekê jî vebêjîna dixêrîyê ku li ser diçe bo danûstandin di goşeyan de vergire û bi bandor bibe, herwaha di navber ziman û zîhin de vê ava dike û dibe pirek. (Lewma vebêjin bi wî awayî desthilata darijandinê û xwe ferz kirinê ve bandore li ser derûniya xwandevan ava dike.)¹⁴² wê demê hemû bûyer û çîroke di dema vegotinê de dema ku bi awayekî ronî tê vebêjîn, dibin sedem ku aliyê hûnerî yê pêkhateya çîrokê çêbibin, lê ev rewşa ku çîrokbêj di vegotina xwe ya taybet de, dema derbarê çîrokê de vedibêje û dema vegoteya nivîsa çîrokê de beşeke ji wê çîrokê bixwe. Ev jî wê yekê bi me têdigehe ku çîrok û vebêjîn pêkhateyên pêwîstin bo hemû vegoteyekê, lê tiştên ku di romana teqlîdî de wek têbîniyekê bê kirin, berdewam giringî tê dayîn ji dîtina goşeyî ya roman nivîs an jî ew goşeya ku roman nivîs tê de çav li bûyera çîrokê bixwe dike. Ji ber çîrokbêj amûrê xawî yê ezmûnê nivîskar xwandiye, awahiya vegotinê ya çîrokê çêkiriye, yan jî ya baş ew e ku em bibêjin zêdetir damezrandina sînorê dîtina çîrokê ew bixwe ye.

2.1.8 Rola Çîrokbêj di Vegotina Romana (Grewî Bextî Helale) ya Eta Nehayî de

Çîrokbêj di vê romanê de wek berî naha jî me amaje pê kir, kesê ji karakterên romanê bixwe ye (Seîd Rehmanî), ev çîrokbêje hem kesayetekî nav romanê bixwe ye, hem jî şahidê beşekê bûyerane û ji kesayeta serekî re jî nêzîke û ji

¹⁴² - Kobendî Çend Babetêkî Edebî, Kameran Salih, weşan: Minare, Hewlêr, 2007. R48.

aliyê din ve jî vebêjê romanê ye. Ew kesayetî kesayetekî aloz û sirke, ji ber bi wateyeke din ne asane bikarî pênaseyekî diyar bo wî bê kirin, ji ber yek demê de gelek rolên cuda dibîne, ew zêdetirî erkekê li ser milê wî ye û berdewam di hemû bûyeran de amade ye. Wê demê Seîd Rehmanî wek çîrokbêj, cudaye ji mamosta Seîdê li zanko yê, Seîdê hevalê Helalê cudaye ji Seîdê çîrok nivîs... Bi wî awayî em li gel zêdetirî karakterekê danûstandinê li gel dikin.

Seîd bixwe jî çîrok nivîse, ji ber vê jî nivîskar bo ku xwandevan de baweriyê ava bike Seîd Rehmanî bo nivîsandina çîrokê helbijartiye, ji ber ew bixwe şarezaye li teknîk û awayên hûnerî yên vebêjîna çîrokan, herwaha ezmûnekî wî yê zêde di mamostayî, nivîs, jîyan û têkelbûna wî ya çandên cuda heye, lewma bijardeya herî baş ew eku vebêjîna çîrokê bi kesekî xwandevan û şareza re bispêre bû. (Helale di dema vebêjîna parçe parçe bîranînên xwe bo Seîd de, êdî ew keça bi coş û şad a wek serxweşan a wan rojên borî nebû. Ew keça çalak û tejjî bi bernamê û kar nebû, ku heta dawiyê li xwe bawer be, bi herî aliyekê ve xwezî li awat û xeyalên xwe dianî û li dû wan de dibezî. Li dû xewn û xeyalên reng bi reng de bo paşerojê direvî. Ew wê demê de jinek bû ku li gor wê di xewnekî nexwaş de ye, di kabûsekî metirsîdar de ye. Car caran ku radibû, çavê wê bi çavên mîhrebana Seîd heltîna. Bi dîtinek kûr û tejjî bi hemxemî kirinê ve. Seîd di tarîbûn û ronahiya odê ve, li teniştê wê rûnişt. Li hember wê anişka xwe dida ser mobilyayê, milê xwe dida ber serê xwe û aliyekê rûyê xwe di nav lepê xwe da vedişart. Helale li bêdengiya navbera vebêjîna xwe de bi çav û dîtînan xwe ve hûr serde diçû. Ew çav û nêrînan çend rengî çav û nêrînan Braymok didan. Braymok?... Digot: Seîd ez teqez dibêjim eger Braymok ma ba wekî te dibû, zilamek wek te bû...) ¹⁴³. Seîd her demekî bixwaze dibû çîrokbêj û herdemekî bixwaze jî karakterekî nav romanê ye. Di vê paragrafa serê de Seîd ji ber bixwe hemxem û raziye ji Helale, wek çîrokbêj derdikeve pêş, wê demê vebêjîna wan beşane vedigere ku Seîd Rehmanî re tê spartin.

Ji goşeya dîtîna çîrokbêj ve li hin aliyên dem û cîh kêma an jî zêde derdikeve ku bi rêya bûyeran ve em dikarin pêgeha vebêj ji aliyê dem û cîh de destnîşan bikin. Wê demê her yek j idem û cîh dikare bi goşeya dîtîna vebêj ve bê diyar kirin, gelo vebêj ji aliyê pêgeh ve yeksane li gel kesayetên din ên di nav nivîsê yan ji wan cuda ye? Vebêjîna di vê romanê de piştî ketina Helale ya naxwaşxaneyê tê

¹⁴³ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 268.

vegote kirin, wê demê dema vebêjîne cuda ye ji dema pêkhatina bûyeran. Seîd Rehmanî di heyamekî hatî diyar kirin de çîroka xwe ji Helale guhdar kiriye, Şêzad asêbûneke di singê Helalê de û piştî wê êdî mamosta Seîd ê çîrok nivîs biryara vebêjîne dide. Aşkeraye hin caran Seîd wek çîrokbêj pêgehekî yeksan û pir caran ji wê jî nizimtir astekî wî heye li gel karakterên din, bi taybetî li gel karakterê serekî, lê piştî ku dibe çîrokbêj, desthilata wî li ser temamê karakterên din û temamê projeya vebêjîne heye.

Çîrokbêj ku yekem car ronî dibe ku (Seîd Rehmanî)ye, di dawiya beşa pêncem a romanê de, ber bi pêş ve tê û xwe dide nasandin, ku xwandevan li benda tişteki waha nîne. (Helale destpêkê ew çîrok ji bo Şêzad vegotibû. Demjimêr bi demjimêrên wê rojê bo Şêzad vegotibû, ku ji Braymok pir heskiribû. Piştî cudabûna ji Şêzad ji min re ew babet vegote kir. Bo min Seîdê Rehmanî piştî ku em bûne cîran û şev an li mala min an jî li mala wî li salonê em rûdiniştin, Helale heta direng bîranînên xwe yên dema borî û raboriyên xwe vedigot. Çîroka jiyan û serpêhatiyên keçekî kurd ku çarenivîs di çiya û dol û geliyên Kurdistanê re derbasbûye û xwe gehandiye vî welatî.

Wê demê ew tişt ne dihate bîra min ku rojek li rojan dê vê çîrokê binivînim, an jî bo keseke din vebêjim. Lê naha ew bûyerane pêkhatine û Helale li ser textê nexwaşxaneyê razaye, naha radio û televîzyonên vê derê hemû raportên rast û nerast li ser wê belav dikin, lê naha ez piştrastim ku divê ev çîroke bê vegote kirin. Naha ku rojname, kovar û malper hemû wan tiştên waqîf û derew di nav yek de li ser nivîsîne...) ¹⁴⁴. Seîd Rehmanî yekem car ti niyetekî wî yê vegotekirina çîroka Helelê tinebû, wî digot wek piraniya çîrokan din ew jî winda dibe û xwe lê nake xwedî. Vebêj heta wê demê jî kiyê ne diyar e, rû û rengê ti kesekî ronî nîne, lê ji vê derê û pê de, bo yekem car derdikeve û xwe bi me dide nasandin û sedemê vebêjîna çîrokê aşkera dike.

Berê naha vê derbarê de dîtînen ji goşeyê ve cîhê vebêj li gel dîtînen goşeyî yên kesayetek an jî çen kesayeteke din ên di nav nivîsa vebêjê de yeksan be, lê rewşeke din heye, her çend dîtînen goşeyî di cîhê vebêjîne de bi hûrgilî diyar aşkera be jî, lê li gel ti yek ji kesayetan yeksan nîne, wê demê vebêjî bi dîtînen goşeyî yên cuda ji nêrînen goşeyî yên kesayetên din verdigre. Dikare bê gotin nêrînen goşeyî di

¹⁴⁴ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 202.

wî alî de pêktê ji sîstem ango pergalek bo nîşandana cîhê sê yan çar rehendan, bi alîkariya hin amûrên hûnerî yê taybet ve, bi awayekî hûnerî yê cîh jê re hatî diyar kirî ve erkên xwe bi cîh tîne. Diyare vê derê de armanc ji rehendên cîh û ew nêrînên goşeyî ku vebêj an jî çîrokbêj lê radiwestê û dîmenan ji bo me vegote dike ye. Çîrokbêj di romana (Grewî bextî Helale) de cîh gohertinê dike û tenê bi nêrînên goşeyî ve li gel dîmenan na veguhêze, bixwe nabe eynika dîtina dîmenan, ji ber karakteran û bûyeran komdike ku heta bixwe çawanin wekî heyî derdikevin. Ev jî tê wateya ku çîrokbêj di gelek nêrînên goşeyî yê cuda ve vegoteyê dike. Seîd Rehmanî we dizane ku wek çîrokbêj xwedî rol û bandorekî serekiye di awahiya çîrokê de, wa dizane bê wî ev çîroke bi wî awayê naha nedibû, ku ew gotinane gelek rastî tê de hene. Vê derê de giringiya çîrokbêj di vegote kirina bûyeran de derdikeve holê. Seîd tenê çîrokbêjiya wî asan nîne, ne zilameke ku tenê xwedî rolekî tenişt bibîne û bandorekî wî ya zêde li ser bûyeran nebe, ji ber hin çaran li gel nivîskar bixwe cudakirina wan ji hev du ne pêkane û heta bi awayekî xwandeve gelek car wa dizane ku Seîd Rehmanî nivîskar bixwe ye. (Ez ne wek Doktor Seîd Rehmanî, mamostayê zankoyê, dost û hevalê Helale, zilamek ku Şêzad wa dizanî jiyana wî min têkdabû û haşayî bi jina xwe kiriye- berevajî wê wek bêjer û nivîskarê vê çîrokê xwedî rolê serekî me, di hemû bûyer û karesatan de hebûna wî heye me. Bi taybet di bûyer û karesata wê rojê de jî. Ez li hember hemû bûyer û karesatan berpîrsim. Bi taybet li hember mêrkujîya wê rojê ya Şêzad. Ew roja ku Şêzad kirasekî binevşî û şelvarekî jeans ve li ber deriyê mala Helale destê xwe bo zengê dirêj kir û yek ...dû...sê...) ¹⁴⁵. Em bi wî awayî dibînin zêdetir ji (Seîd Rehmanî) kesek di holê de ye. Lê hemû jî çîrokbêjê romanê ne, bê vê çîrokê vegote kirin jî ne pêkane. Ew agahiyên hûr pêkhatiya çîrokê ye û heta astekê xwe jî wek kesekî xwedî xeta û kêmasî dizane ji ber wan bûyerên di serê Helale de hatine. Dikare ev hewla vebêjîna nivîsandina çîrokê wek nirxekî pîroz, wek daxwazekî lê xweşbûnê ji aliyê çîrokbêj ve bê dîtin. Wê demê çîrokbêj hest bi tewanbariyê dike û dixwaze bi vê rêyê ve asûdeyî û rihetiya derûnî bidest bîne. Îdeya wê pir ne giringe ka kiye dawiyê de lêborîn dike û çîrokê dinivîsîne, gelo Seîdê çîrokbêj, an roman nivîs bixwe ye.

Derbarê peyvendiyan roman nivîs û çîrokbêj de du nêrînên serekî li holê ne. Ya yekem ew baweriya ku çîrokbêj kesê duyem ê roman nivîse û di cîha wî de karê

¹⁴⁵ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 329.

vêbêjînê pêktîne. Lê ya dûyem ew baweriye ku çîrokbêj bixwe nivîskar nîne û ew kese xeyaliye ku gotarekî xeyalî bo xwandevan pêşkeş dike. Tenê bi gotina yan jî nivîsandinê ve yê yekem peyvan bi armanca dahênana nivîsa romanekî wan her duyane li gel yek girêdide. Eger ev du nêrîna ne, çîrokbêj ji roman nivîs em cuda bikin, li ser bingehe xeyal kirina kesayetiyê wî û taybetmendiyên biyolojîk ên roman nivîs, lê di romanên îdeolojîk de çîrokbêj ne tenê di cîhê roman nivîs karê vebêjînê pêktîne, ji ber di heman demê de dikare bibe helgirê nêrînên goşeyî yê nivîskar û di nivîsa romanê de agahî li ser bîr û nêrînên wî jî bide. Peywendiyên di navbera çîrokbêj û vegotevan de jî wê tiştî tê digehîne ku ji ber nêrînên goşeyî ve çîrokbêj re tê gotin vegotevanê bûyeran, ji ber vê jî bi her du zareve li gel yek hatine girêdan û di nav hev de bûne yek. (Bê çîrokbêj nêrînên goşeyî nayên damezrandin û bê nêrînên goşeyî jî çîrokbêj têkdiçe.)¹⁴⁶

2.2 Awayê Nêrînên Goşeyî yê Vebêjînê

Dema behsa nêrînên goşeyî tê kirin, yekser tişteki ku hatî bihîstin û wêneyî hatî dîtin tê bîra mirov, ku di goşeya dîtina mirov de bi awayekî heye ava dibe. Bo nimûne di hûnerên xweşikiyê yê wek wênekêşiyê de peyv û zaraveya rewangeh tê bikar anîn. Di vê derê de tablo xwe dayîna derve ya xeyalên wênekêşe. (Zaraveya nêrînên goşeyî wekî xwe di aliyê teoriyên destpêkê de û bi awayekî belav di zanistê endazyarî de bikar hatiye.)¹⁴⁷ Herwaha zaraveyê nêrîn di zanistên felsefeya ramyarî û civaknasî de bikar tê. Nêrîna felsefî, nêrîna civaknasî..hwd.

Roman wek coreyekî hûnerên bilind ên bihêze û daxwazên mirov ên guhdarkî û çîrokê teji dike, roman xwedî pergal û sîstemekî organîk a tejiye ku bi awayê wek xetekî bi plan hatiye bi bingehe kirin û bi coreyekî ku di temam kirin û bi yek ve girêdanê de ti parçeyek ji parçeyên din ên bingehe kirî nizimtir nîne.

Di rexneya wêjeyî de kesê yekemîn hewl bo nasandina vê rehenda serekî, li her hûnerêkî çîrok nivîsînê de û bi taybet jî di romanê de (Bo zanayê Amerîkî (Henry Jeyms) 1843-1916 vedigere û li ser destê wî gohertin di cevher de hatine kirin, ku bûye sedemê xulqandina formekî nû di romanê de, ku rexneya wêjeyî de wek romana dîtînen goşeyî tê naskirin. Derbarê aşkera kirina çemkê nêrînên goşeyî de piraniya nivîskar û rexnegirên (Anglo-Amerîkayî) li ser Henry Jeyms rêkeftin ku ew yekem

¹⁴⁶ - Fîkr u Dunya, Merîwan Wirya, weşan: Endêşe, Slêmanî, 2014. R 119.

¹⁴⁷ -Hizir u Şêwaz le Çîrokî Kurdî de, Hemeseîd Hesên, weşan: Aras, Hewlêr, 2005. R 118.

kese, ew nêzîkatî û çemk aniye nav cîhana rexneyên romanê.)¹⁴⁸. Lê nivîskarên pirtûka (Cîhana roman) ew rêkeftin bezandine û derbarê wê rêkeftinê de xwedî bîr û ramanên cuda ne. (Henry Jeys) bi awayekî çîrokên xwe vedibêje ku bixwe jî keseke ji kesayetên nav çîrokê, wê demê li gel wî û bi çavê wî rûnişkandina vegotina çîrokê li aliyekê û ketina nav dilê karakter jî aliyeke din e. piştî (Henry Jeys) beşek din ji rexnegirên din ên derbarê dîtinên goşeyî bîr û nêrînên xwe di vê derbarê de aşkera kirin, (Berî hemûyan jî (Lobok) ku li gor wî di romanê de tiştê herî giring pirsên aloziya taybet derbarê şewazê de ye, mehkûme bi pirskirina nêrînên goşeyî.)¹⁴⁹. Wê demê pirskirin di peyvendiya de ye li gel vebêjîna çîroka çîrokê ye, dibêje eger dikare bi awayekî xweşik gotin li ser vebêjîna çîrokê bê kirin, wê demê dikarî li ser romanê jî bi axivî. Başbûna romanê jî bi hêvî û bi dîtinê girêdide ku ji me re tê pêşkeş kirin, herwaha hêza dengê axaftvan, yan jî ew bingehe asta xwe, xwe pê ve girêdide û hin taybetmendiyên pêkhatina xeyalan jî aşkera dike, ji ber em di wêjeyê de rastî bûyer û tiştên bi awayên destpêkê nabin, ji ber em rastî wan bûyeran tîn ku bi awayekî hatine diyar kirin tîn pêşkeş kirin. her tiştêk jî, diyardeyên wê li gor wê dîtinê ve tê pêşkeş kirin û destnîşan kirin.

Divê em vê yekê bibêjin ku biryara herî giring a ku roman nivîs bide, helbijartina wê nêrîna goşeyî ye ku bi wê rêyê ve roman tê pêşkeş kirin, ji ber ew pêngav bandorekî cevherî bi wê rêyê ve ku xwandevan bersivên hestyarî û exlaqî li hember karakteran û wan karên ku tîn kirin dide. (Wê demê vebêjîna divê bi nêrînên goşeyî ve behsa bûyer û dem û cîh ji bo me bike, ku agahiyan derbarê nêrînên xwe yên rêgeza hûnerî de bide)¹⁵⁰. Ew peyvendiya ku vebêjîna vê regeza hûnerî ve, gelek pirs derbarê vê (çiyetî-mahye) tîne holê.

Rexnegirê Ereba (Elah Fazil) ji coreya yekem re dibêje (Nêrîna goşeyî ya derbasbûnê) û ya düyem (nêrîna goşeyî ya heval), ya sêyem jî (nêrîna goşeyî ya derve)¹⁵¹. Berî ku em bînin ser behsa coreyan Û pratîka li ser romana Grewî Bextî Helale, divê em amaje bi vê bikin ku coreyên vebêjîna jî li gor coreyên nêrînên goşeyî yên vebêjîna hatine destnîşan kirin.

¹⁴⁸ -Cîhanî Roman, Haşim Ehmed Zade, weşana: Endêşe, Silêmanî, 2015. R 88.

¹⁴⁹ - Gftugo legel Necîb Mehruz, Wergêr: Mhemed Şawêsi, Ruberî Dahênan, jmare 29. Hewlêr, R 3.

¹⁵⁰ - Romanî Nwêy kurdî, Hejar Xidir, Edeb u Huner, jmare 548, Slêmanî, 2008, R 7.

¹⁵¹ - Dîd u Dîdga, Kerîm Deştî, weşan: Mukiryan. Hewler, 2002. R 33.

2.3 Dîtin ji Paşve:

Di coreyê vê nêrîna goşeyî de, zanyariyên vebêj ên derbarê karakter de, ji zanyariyên karakter zêdetire di derbarê xwe de, ji ber vebêj xwedî serbestiyekî temamî ye û dikarê bikeve nav dil û derûna karakteran û hest, soz û bîr û ramanan jî bixwîne û bê ku karakter ji xwe agahdar be, rewşekî wî ya waha heye. Bi vê dîtinê ve di nêrînên goşeyî yên wî awayî re tê gotin (vebêjîna hertişt zanînê) ku yek ji taybetiyên wê yên herî giring ew ku ne naçare çavkaniya wan hemû zanyariyan ji me re bibêje ku dizane. (Vebêjiya hertişt zanînê de vebêjê kesê sêyam ne diyar e (wî) bikartîne û zêdetir jî di romanên teqlîdî de bikarhatiye û gelek berhem jî pê hatine nivîsandin)¹⁵². Li gel vê yekê jî em dibînin ku ev vebêjîna di romanên sedsala bîstem de bikar hatiye. Di romana (Grewî Bextî Helale) de ev coreye bikar hatiye, hin caran vebêj baştir nav dilê Helaleya karakterê me yê serekî nîşandide. Vebêj derbarê hemû karakteran de her tiştî dizane, bi coreyekê em hin caran bi rêya wî ve karakteran dinasin û şarazayî rabûn û rûniştin û fikirandina wan dibin, lê ne bi rêya karakteran bixwe ve, (Teslîm nebe Helale. Ne raweste Helê. Wekî wan hemû salên ku reviyayî, çawa revîbûy wê berdewam bike. Ji ber wê sî û bayê reş ê dixwast te têkbibe. Naha jî dixwaze te aloz bike Helale, bi lingên dirêj û gavên bilind ve, bi destên mezin lêk belav ve. Her tu bixwe bûy te digot destên wan ên mezin hemû ji yek belavin, li hestê sing an jî di jor de hertişt jê birine...)¹⁵³. Yan jî (Helale dema ku diaxift û digot, dest û tiliyên xwe li ser gerdena xwe dianî û dibir. Min hest dikir bi awayê herî zîrekî ve dixwaze û bê perwa bûna xwe di axaftin û aşkera kirina bîr û ramanan xwe bibêje. Min li pişt wê zîrekî û bê perwabûnê ve, li pişt rihetiya tevgera dest, tilî û bedena wî de tişteki din jî didît. Tişteki bû ku bi hişyarî, yan jî ne hişyarî hewl dida hin tiştan jî veşêre. Tişteki î wek guman û du dilî, wek şerm û tirs bû. Şerm û tirsek di kûrayiya giyana wî de bû, ku min gelek car di herikandina dest, beden û tevgera wî ya çav û nêrînên wî de ew yek didît. Di wan deman de çav û nêrîna wî dişîbî wek ya çav û nêrîna xezalekî sawa. Bixweşî xezalekî sawa bû...)¹⁵⁴. Aşkeraye vebêjînekî pir kûr ketiye nav dile karakterê serekî de, ew hemû risteyên veşartî yên Helale vedike, agahdariya bîr û fikirandinê, şerm û tirs ku Helale çend bixwaze veşêre jî, dîsa jî vedibêje û her aliyekê ve îşaret pê dike. di coreya nêrînên goşeyî yên waha de ti

¹⁵²- Teknîky Goşenîga le romanekanî Bextîyar Elî de, Mistefa Xiwatanî, weşan: Awêr, Hewlêr, 2015, R 261.

¹⁵³- Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 249.

¹⁵⁴- Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 338.

tişteki di vebêjînê de winda nabe, ew agahdarê her tiştî ye. Gelek car ew tiştê ku karakter nikarin derbarê xwe de bibêjin ji aliyê vebêj ve ji me re tê gotin.

Bikaranîna kesê sêyem ê ne diyar de jî, ji aliyê vebêjê ku her tiştî dizane ve, ji ber wê sedemê ye ku alîkariyê de dide ku her tişteki bizane û hêza behskirina her tişteki di wî de hebe û derbarê hemû bûyer û karakteran de bikare vegote bike. (Bê ku girêdayî bi cîh û dem be ji vî serî bo serê din ê romanê tê û diçe. Ji vê jî giringtir ew e ku vebêj bixwe bi xwesteka xwe rêjeya wan zanyariyan destnîşan dike ku dide xwandevanan)¹⁵⁵. Bê ku kes bikare wî naçar bike zanyariyên zêdetir bibexşe. Xwandevan jî divê girêdayî wî awayê vebêjîne be, ji ber di vegoteyên waha de xwandevan berdewam li dû vebêj ve biçe. Ev serbestiya vebêjê her tiştî dizane ji behs kirina her tişteki de, rastî du helwêstên dijî yek û cuda dike, ya yekem bi hûrgilî û dirêj li ronahî kirina bûyeran, a duyem jî destlê berdana vegotekirina wan tiştên ku vebêj naxwaze behsa wan bike. Di helwêsta yekem de vebêj navber û moletêki dide xwandevan ku di dema vegotinê de ne weste, ji bo vê em dibînin ku vebêj pir zêde xeyalên xwandevan westîne û bala wan hemûyê komdike, ku xwesteka wan a keşif kirina tiştan li gel wan ava bike. Ji ber (Vebêj bixwe her tişteki pêşkeşî xwandevan dike û bi wî awayî jî role xwandevan di piroseya vebêjînê de ber bi têkçûnê diçe, berevajî vê yekê rola vebêj zêdetir dibe û li ser piroseya vegotinê de hakim dibe)¹⁵⁶. Ev jî dibe sedem ku vebêjiya hertişt zanîne wek vebêjîna xirab bê pênase kirin, ji ber vegotina her tişt zanîne, ew nivîskare ku nikare wek kesekî bê alî derbikeve pêş, bibe sedemê gehandina agahiya ku derbarê kesên din de agahî bide û rê nede karakterên din ku bixwe di derbarê xwe de biaxivin, hebûna wan a serbixwe hebe û bixwe azadî di romanê de tevger bikin. Lewma em dibînin ku roman bi rêya vegoteya hertişt zanîne ve tenê awayê nûçeyek derbarê çend bûyer û çîrokan ve ku roman nivîs dixwaze û bi piştî xwe girêdana rastgotina xwe ve bigehîne me, ne ku piştî girêdana bi rastgotinek ku di romanê de biçîne û delaletên xwe yê taybet hebe. Ev jî wê yekê bi me têdigehe ku rexnegir derbarê vebêjiya hertişt zanîne de ne yek nêrînin û bîr û ramanên wan ên cuda di vê derbarê de hene. (Ji wê roja ku Helale Braym naskir. Xortekî aram û hêdî bû ku li radio kar dikir. Xortekî xwandevan helbestvan û hûnermend, kesekî ku hêdî hêdî jê nêzîk bûye, herwaha hêdî hêdî dîtînen wî yê

¹⁵⁵ - Teknîky Goşenîga le romanekanî Bextîyar Elî de, Mistefa Xiwatanî, weşan: Awêr, Hewlêr, 2015, R 126.

¹⁵⁶ - Nusîn wek nexoşî, Serdar Rehman, Konsêpt, jmare 4, Slêmanî, R 327.

jiyanê goherî û kûrtir û hêza wî ya şiyane zêde bû, bixwe û rastiyên wî, bixwe û aliyên wî yên veşartî û tiştên ku piştguh xistinî yên derûnî carekedin bibîne. Braym li gel vê alîkarî û geryan û kontrolên hêdî hêdî yên derûnî yên Helalê, gav bi gav evîndarê wê jî bû. Evînekî ne didît, yan jî aşkera nekiribû, yan jî aşkera kiribû lê Helalê tenegeheştibû¹⁵⁷ 170. Vebêj agahdarê wan peyvendiyan di navbera Helalê û Braym e, agahiya wê evîne ye ku di dilê Braym de hêdî hêdî mezin dibe, aşkeraye ku Helalê agahdarê wê evîne nîne, tenê vebêje hertiştêkê dizane û agahdarê nav dilê karakteran e. Helalê nizane ku Braym evîndarê wê ye, lê vebêj dizane. Ew dîtina efsûnî ya çîrokbêj ku hemû tiştan dibîne ye. Di awayê vebêjîna waha de berdewam vebêj gavekî li pêş karakteran e, berî herkesekî tiştan dizane û bi wî awayî digehîne xwandevan.

(Roger Fawler) mercê serkeftina vebêj di karê xwe de, bi awayê pêşkeş kirina wan zanyariyan ve girêdayî ye ku taybetin bi karakteran ve, ji ber vê jî derbarê vebêjîna her tişt zanîne de dibêje: (Ji aliyê pêşkeşkirinê ve pêwîst nake ku xwe wisa nîşan bide ku ew hertiştêkê dizane û dest dayne li ser hertiştêkê)¹⁵⁸. Lê (Henry Jeyms) nêrînekî din derbarê vebêjîna hertişt zanîne de derdixe pêş û kêmasiyan ronahî dike. (Dema ku dibe sedemê hilweşandinê û ne rêkûpêkbûnekê di encama wan veguhestinan de, ji nişkava bo cîhek din, ji demekê bo demekî din, ji karakterekê bo karakterekî din, bê ku ti sedemekî ronahî û aşkera bo me pêşkeş bike, di encamê de windabûna peyvendiyan organî di navbera parçeyên cuda cuda yên nav romanê derdikevin.)¹⁵⁹. Herwaha serbestiya vebêjiya hertiştzan sedemeke din ê cudabûna navbera rexnegiran pêktîne, ku li gel hin ji wan serbestiyekî rizgariyê heye, di yek demê de danûstandinê li gel kesekî serekî û bûyeran dike û bixwe jî di dem û cîhekî hatî diyar kirî ve girênade. Li hember vê yekê, hin kesên din ên rexnegir serbestbûna vebêjîna hertiştzan wek serbestiyekî rêjeyî pênase dikin û ji aliyê peyvendiyan wê vebêjiyê ya bi karakterên romanê ji aliyekê ve û ji aliyeke din ve jî bi xwandevan ve girêdidin. Elbet ew nêrînen cuda yên derbarê vebêjîna hertiştzanîne de, heta berî pêşketina piroseya vebêjîna û serhildana vebêjiya hertiştzan xwedî rol û bandorekî xwe ya taybet hebûye di piroseya vegotekirinê de.

¹⁵⁷ - Grewî Bextî Helalê, Eta Nehayî, R 170.

¹⁵⁸ - Îstakîka, Kemal Mîrawdelî, weşanxaney Qaniî, Slêmanî, 2005. R 26.

¹⁵⁹ - Tiyorî Edebî, Pîter Halbîrg, wergêr: Enwer Qadir Muhemmed, weşan: Melbendî Kurdoloci, Slêmanî, 2010. R 104.

(Ne min dikarî di dadgeh kirina wî de amade bim. Min dikarî biçim bo dadgehê û li wê derê guh bi nêrînên wî bigrim. Bi taybet min dikarî destûrê ji serokê dadgehê vergirim û tiştê ku min dixwast Şêrzad bizane û bibîhîse, jê re bibêjim. Lê ez neçûm bo wê dadgehê. Min bi taybet xwe jê we dizî. Çima? Ji ber dibe min ne xwest ew dadgeh veguhêzim bo nav çîroka xwe. Ji ber min ne dixwast di çîroka Helale de behsa dadgeha Şêrzad û awayê paqijiyê bi destanîna karesatekê bikim. Ji ber li gor min wisa nebû ku behs û gotinên Şêrzad di dadgehê de ti tiştêkê ji karesetê bigohêre. Karesat pêkhatiyê û ti dadgehek nikare pêşî li tiştê pêkhatî bigre. Ti nêrînek, ti pakan û pasavek nikare tiştê çûyî vegeirîne bo rewşa berî pêkhate. Karesat pêkhatiyê. Bi taybet jî berî pêkbê pêkhatiyê. Dibe ku berê wê jî min gotibe, di risteya yekem a çîrokê ve pêkhatiyê. Min risteya vê çîrokê, peyv bi peyv, hemû kes û kar û kiryar û helwêst, sedemê serekî yê bûyerê û sedemên bi bandor ên li kêlegê, ne wek ji bo ez berevaniyê bikim li karesatê, berevajî vê yekê bo rawekirina zemîn û sedemên wê vegotiyê. Naha dema ez li ser di fikirim, rast di vê dem û wextî de, ji xeyalê min re, li ber çavên min re derbas dibe ku dibe xwe dizîna min a ji dadgeha Şêrzad, biryarê min bo neguhestina bûyerên wê dadgehê bo nav çîroka jiyana Helale bû, dibe ku revîna ji ber tewanekî ku min pêkanî ye. Tewaneka ku min pêkaniye. Ez, ne wek Seîd Rehmanê mamostayê zanko, dost û hevalê Helalê Seîd Rehmanî yê çîrok nivîs. Gelo Şêrzad ev tişt dizanî...?)¹⁶⁰. Ewê ku biryar dide ku dîmenê dadgehê nekeve nav çîroka Helale, vebêje ne kesayeta Seîd Rehmanî ye. Desthilatiya wî ya temam li ser hemû bûyeran heye. Agahdarê wan hemû bûyerane jî ku bixwe naxwaze vebêje. Kesayetî li vê derê têkelyek dibin, Seîd Rehmanî û vebêj di dirêjeya romanê de cîh digoherin. Di vê paragrafê de Seîd Rehmanî xwe wek tewanbar dizane li hember wan tiştên ku pêkhatine. Hest bi tewanbariyê kirin ji aliyê Seîd Rehmanî ve di vê derê de pir bihêze û di vê xalê de xwe ji vebêj cuda dike. ev jî yek ji sifetên vebêjiya hertiştzaniyê ye ku hin caran wisa derdêxe pêş ku hertiştî nizane û agahiya wî ya derbarê hemû çîrokê de tune.

2.4 Dîtin li Gel:

Vebêjîna vê coreya nêrîna goşeyî re tê gotin (vebêjîna heman tiştî zanînê) ji ber di vê derê de zanyariyên vebêj derbarê bûyer û karakteran de li gel zanyariyên karakteran bixwe de yek in. wê demê rêjeya zanyariyên vebêj li gel zanyariyên

¹⁶⁰ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 364-365.

karakterên nav romanê de ji aliyêke ve yeksanin. (Ev jî tê wateya ku ti yek ji wan xwedî zanyariyên ji hev du ne kêmtirin ne jî zêdetirin. Ji ber di aliyê zanyariyan de mil bi milê hev dimeşin)¹⁶¹. Çavkaniyên peyda kirina zanyariyên vebêjiya hertiştzan her karakter bixwe ne. Ji bo wê jî eger karakter bixwe ne amade bin xwe bi lêv bikin, ev vebêjîne nikare her tiştêkê aşkera bike. Lewma hêza wan a bikare pêş an jî paş bûyeran bikevin jî tune ye û bi xwesteka xwe ve jî di wê asta (dem û cîh) de nîne ku danûstandinê bike, ji ber rêgezên bûyer û karakter, dem û cîh hemû bi rêya nêrînên goşeyî ve yek ji karakterên nav romanê tên pêşkeş kirin. (Ev jî wê yekê dide têgeheştin ku cîhê vebêjiya hertiştzan di vegoteyê de, xwedî role di diyar kirina awayê pêşkeşkirina bûyeran de, ku li gor cudayiyên cênawen ve dibe, ji ber danûstandinên vebêj, gotinên wî yê li gel bûyerên romanê de, li gel danûstandinên vebêjiya ne diyar cuda ne)¹⁶². vebêjiya axaftvan role rengîn bûnê yan veguheştina bûyeran nabîne, ji ber ew xwedî rola ava kirinê ye. Wê demê li pişt bûyeran ranaweste, ji ber li gel bûyeran bixwe ye. Wê demê jî rexnegir ji aliyê coreya wan cênaweya ku vebêjiya hertiştzaniyê bikartîne cudane, hin ji wan bi cênawiya kesê yekem ê axaftvan (ez) ve girêdide, ku taybetmendîya wan a herî girîng, tenê wan tiştane dibîne ku ber hest û hişmendîya kesayetiya serekî ya di nav romanê de ye û ji aliyê dîtina taybetiyên wî ve peyvendiye de ye, ev jî tê wateya ku vebêj bi dev û mêjiyê kesayetiya serekî ve diaxive û difikire: (...Wan rojane de ku Seîd hest bi vê kiribû ku peyvendiye wan hêdî hêdî tene gohertin. Di peyvendiyekî aşkera û hatûçûna germ a binemaleyê ve dibe peyvendiyeke heta astekê veşartî û bi awayekî ne asayî. Wî pirsî bû: Çi bûye Helale? Eger hest dikî di peyvendiya li gel min de jiyane te de pirsgirêk û astengî pêktên, eger tu di fikirî Şêzad ji ber min...Helale heman hevoka Seîd di bîra wê de nemabû. Seîd bixwe jî bîr kiribû. Tenê tiştêkî ku herduyan jî bîrnekiribû ew hevokane bûn ku ne Seîd gotibû û ne jî Helale bihîstî bû. Ew hevokên ku herduyan jî ne tenê wê rojê, her rojêkê ji xwe re ne gotin, ne jî bihîstinê didizîn. Ew hevokane pêwîstbû bibêjin û bibîhîsi, lê ne gotin, ne jî bihîstin. Helale pêwîstbû bigota: Seîd, Şêzad li te û peyvendiya li gel min bi gumane û ew gumana jiyana li min aloz kirine. Pêwîstbû Seîd jî bigota: Helale madem wisa ye, ji bo jiyana we aloz nebe, em vê peyvendiye bi dawî dikin. Ji vê şûnde êdî em yek

¹⁶¹ - Pêkhate û Ravey deq, Babek Ehmedî, werger, Mesud Babaiy, Weşana Nima, hewlêr. 2007. R 211.

¹⁶² - Regezkanî Drama le şîrî kûrdî de, Perwîn Ebdûlla, weşana Serdem. Slêmanî, 2008. R49.

nabînin. Bi taybet li zankoyê jî. Lê ti yek ji wan ev tişt negot. Her yek ji wan bi awayekê ku vîcdana xwe rihet kiribe û hest bi tewanbariyê jî nekin, xwe li gotina wan çend hevokan xwe veşartin. Her yek ji wan bi awayekî di dora wan çend hevokan lîstok dikirin. Her yek ji wan li gel xwe difikirî ewqas tiştên aşkera ne pêwîst nîne. Ev jiyane demeke aloz bûye û ti hevokek, ti biryarek, ti peyvendî bi dawî kirinek êdî vê jiyana alozbûyî carekedin komnake. Dibe wisa bibe. Dibe ev hevokane jî nekarî be vê jiyane ji hilweşandinê û ji yek cudabûnê rizgar bikin. Kî çî dizane? Kê dikare pêşbîniya paşerojê bike? Kê bîr li vê karesata dilêş dikir? Dihate bîra kê ku piştî demekî din Helale bêheş û birîndar li ser têxtê nexwaşxaneyê ketiba û Şêzad jî...¹⁶³. Vebêjî li pişt bûyeran rawesta ye, Seîd ku hest dike sedem, têkçûna navbera peyvendiyan Helale û Şêzad e, pêwîstbû tiştê bike. (Pêwîstbû xwe dîr bigre û nehêle ew karesate pêkbê, lê Seîd di vê derê de wek vebêjê wan bûyerane vegote dike ku hem vebêje, hem jî karakterê Seîd e û karakterekî xwedî rola teniştê ye)¹⁶⁴. Seîd vebêjiya xwe jî wek tewanbariyekê dibîne, hin gotin pêwîstbû hatiban kirin û nehatin kirin, eger çend hevokên asayî û aşkerayî kiriban, dibe ku ew bûyerane pêknehatiban. Seîd bi cênawê min(Ez) ê axaftvan ve çîrokê vedibêje, di rastiyê de Seîdê çîrokbêj derdikeve, ew bikaranîne aşkera dibe. Seîd di vê derê de tenê wan tiştane hest pê dike ku Helale hest pê kiriye, ew ti pêngavekê nakeve pêş Helale, ji ber di vebêjiya waha de zanyarî yeksanin.

Bikaranîna vê cênawê jî di vegoteyê de, bo pêşxistina wêjeya jiyaname û bizava rawekirina derûnî çavkaniya xwe digre, ku xwedî bandorekî kûr bû di hizra rojava de. (Yekemîn kesê ku ew cênawe di vebêjîna de bikar jî anî, (Marsel Prust û Siplîn) bûn li Fransa)¹⁶⁵. Ji ber vebêjiya vî cênawê, rasterast xwandevan li gel hizir, îdrak û têgeheştina vebêj de têkel dike, ev jî tê wê wateyê ku têgeheştina xwandevan û pêşketina zemînê vergirtî ye bûyeran, girêdayîye bi hûrgilî û rawe kirinê cuda ku vebêj pêşkeş dike. vebêjiya axaftvaan di piroseya vebêjiyê de, li du cîha de derdikeve, yan wek karakterekî beşdarî bûyerên romanê derdive, yan jî her li dervey çarçoveya bûyerên romanê de dimîne. Li rewşa yekem de dema ku vebêj ji nav romanê de dibe jî bi du astan de derdikev:

¹⁶³ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 298-299.

¹⁶⁴ - Xwêndneweyek bo Grewî Bextî Helale, Eta Qeredaxî, Rexney şawdêr, jmare 85, Slêmanî, 2008, R 3.

¹⁶⁵ - Rexney Edebî w Qutabxanekani, Çarlîs Brîslêr, wergêr: Ebdulxaliq Yaqubî, weşan: Aras, Hewlêr, 2007. R 102.

1- Tenê wek şahidekî rewşê ku dû pêdaçûna bûyeran de diçe û di nav cîhên romanê de jî hatûçûnê dike, lê nikare beşdarî di nav bûyeran de bike.

2- Di asta duyem de, wek karakterekî serekî yan jî xwedî rola teniştê yê romanê derdikeve pêş.¹⁶⁶

Lê di her du astan de jî, vebêj dikare bi rêya hin gotin û têr ramanan ve dest li bûyeran verbide. Ew destverdane jî herçend zêde nebe jî, lê berçav û bi awayekî ku tê hest kirin de ye, eger vebêj rola şahidê rewşê bibîne ev yek wisa ye, ji ber nabe sedemê birîna rêveçûna vebêjînê, lê eger vebêj rolê karakterekê dibîne, wê demê destverdana wî pir zêde berçav nîne, ji ber bi awayekê li gel piroseya vebêjînê de dikeve nav yek, li hev cudakirin jî zihmet û ne pêkan e. Di romana (Grewî Bextî Helale) de vebêj rolê karakter jî dibîne, Seîd Rehmanî hem çîrokbêje, hem jî hevalê Helale ye, ew şahidê rewşê ye, vebêje, karakterekî xwedî rola teniştê, destê wî di bûyeran de heye... Seîd dikare rola wî di asta Helale de bê dîtîna di romanê de, ew her du rewşan jî de rol digre serxwe, wê demê hem li gel kesayetan dijî û agahdarê hûrgiliyên jiyanê ye û şahidê rewşê yê beşek ji bûyeran e, herwaha ew beşên ku di çîrokê de wînda ne Helale ji wî re dibêje. Seîdê vebêj hin caran hertiştzane, hin caran jî heman tiştan li gel karakterê serekî dizane.

Bi awayekî giştî vebêj bi cênawî axaftvan, kesayeta serekî ye, lê şahkesê tamam nîne, ji ber vebêj di dema naha de behsa şahkesekê dike ku bûyer hemû di dema borî de pêkhatine. Wê demê eger vebêj bixwe şahkes be, wê demê heyameke demkî di navbera (dem)a borî wek şahkesê romanê û (dem)a naha wek vebêj de heye. Lê ewqas dem navberê de heye ku vebêj kesayeta serekî nîne û roman jî jiyaname nîne. (Ji ber piroseyekî vebêjiyê ye ku vebêj wek teknîkekî cênawê axaftvan tê bikaranîn, heta bikare lîstokekî hûnerî ava bike)¹⁶⁷. Li gor hin rexnegiran wisaye ku vebêjê heman tiştê dizane di vebêjîna herdu cênawê kesê yekem ê axaftvan û kesê sêyem ê ne diyar tê bikaranîn, bi mercê sîma (Dîtina li gel) bi parêze, wê demê eger bi cênawê axaftvan dest bi vebêjînê kir û piştê jî cênawê kesê sêyem ê ne diyar bikaranî, wê demê li gel vebêjînê her morika yekem a li berçav digre ku ne karakter li zanyariyên vebêj bê agahe, ne jî vebêj li zanyariyên karakter bê agahe. Ji vê derê jî ji bo me aşkera dibe ku vebêjiya heman tiştê zanînê bi hemû wan taybetiyên

¹⁶⁶ - Mana Şarawekanî Deq, Dana Mistefa, weşan: Rênma, Slêmanî, 2004. R 79.

¹⁶⁷ - Berew Estaney Roman u Goşenîgakan. Ebdulla Serac, weşan: Serdem, Slêmanî, 2007. R 112.

ku di vê derbarê de me behs kir, teknîke ke, li vebîjîna heman tişt zanîne pêşkevîtîre û romana nû jî ji ber vê pêşketinekî berçav a giring di xwe de dîtîye

2.5 Dîtina li Derve

Vê coreya vegoteyê de, zanyariyên vebêj li zanyariyên karakterên wî yên di nav romanê kêmترین. Ji ber vê jî ji vebêjîyê re tê gotin (Vebêjiya kêm tişt dizane) ku zêdetir pişt bi vesf û pênaseyan ve girêdide. (wê demê vesfa tevgera dengê karakteran û berdewam xwedî wê hêzê nîne ku derbarê karakteran de bikeve nav û bizane çî di dilê wan û derûna wan de heye, wê demê çavkaniya serekî peyda kirina vebêjîyê ye, ku tenê du hestyariyên dîtî û bihîstinê li pêşin)¹⁶⁸. Lewma vebêj bi rêya wan hestan ve nebe, ti hêzekî wî nîne ku tiştêkî pêşkeşî me bike, tenê tiştên ku tîn dîtî û bihîstin çavkaniya wî ye, eger na ti rêyekî din li pêş me nîne ku em bizanin çî di dil û derûna karakteran de heye, lê li gor (Todorof) ku nezanî û nîv agahiya vebêjiya kêm tişt zanîne di vebêjîyê de, tenê rêketineke û ne tiştêkî, eger na têgehestin di vebêjîyê de wî awayî ne pêkane. (Divê em vebêjîyê jî bibêjin ku (Tomashfîskî) tu amajeyek bo vebêjîyê coreya nêrînê goşeyî nekiriye)¹⁶⁹. Ji ber aşkeraye ku ew romanên ku vebêjîyê goşeyî bikar tînin, di nîvê duyem a sedsala bîstem de wek roman nivîsên nû ten pênase kirin serî rakirine. Ew romana ne ku dikevin nav xaneya ku ji wan re tê gotin (romanên şitêfî), ji ber di vesf û sozên derûnî ve vala ye, bi taybet hin ji wan ji aliyê rêgezên bûyerê de vala ne û gelek caran vesfa di derve de ya bêalî ji bo karakteran û gotinên wan dike, yan jî vesfê dîmenên hestiyar dike û bê ku ti rawekirinek û zelakirin û ronahîbûnê pêşkeşî me bike. Lewma xwandevanên vebêjîyê coreyê romanê rastî hin tiştên şêlû û ne diyar dibin û divê xwe pê ve pir bi westînin û hêzekî zêde bikarbînin ku bikarin têbigihin.

Di romana Grewî Bextî Helale de jî ew nêrînê goşeyî pir kêm bikar hatiye, li hin cîha de em hest bi vebêjîyê ku vebêj ango vegoteyan zanyariyên wî di derbarê bûyeran de kêm e û piraniya wan beşên ku li Kurdistanê pêktên ew rastî diyar dike, vebêj xwe di nav wan bûyeran de winda ye û agahiya wî ji çîrokan tune. Ew serpehatiyên ku li Swêd jî pêktên di derbarê wan û hûngiliyên wan de jî vebêj xwedî agahî nîne, pirsgirêka di navbera Helale û Şêzadê hevjinê wê de, Helale û xwişk û birayên wê û telefonên bo Kurdistanê û kar kirina li radyo û dadgeha Şêzad... hwd.

¹⁶⁸ - Nîgakan, Azad Berzincî, weşana Çawdêr, Slêmanî, 2008. R15.

¹⁶⁹ - Çend wêstgeyekî Edebî u Fîkrî. Azad Berzincî, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2006. R 88.

Ew hemû bûyerane dihêlin ku di romanê de hin caran vebêj bibe kêmtir zan. Coreya nêrînên goşeyî yên waha pir bi pirsgerêk in, bi taybet di romana nû de, yan jî ew tiştê ku jê re tê gotin di post modern de. Dikare ev wek coreya teknîkekî nû bê çav lê kirin, ji bo karakter hemû bixwe xwe bikarin xwe pênase û îfade bikin, herwaha hemû erk li ser vebêj nemîne. Cîhê amajê ye ku coreyên waha yên dabeşkirina nêrînên goşeyî, bûye sedem ku rexnegir du coreyê nêrînên goşeyî di piroseya vebêjîyê de destnîşan bikin. Ew du coreye jî pêktên ji (nêrînên goşeyî yên navxweyî û yên derve yî) ku li gel her du awayên vebêjîyê (Bixwe û babetî) de jî yek digrin. (Nêrînên goşeyî yên navxweyî ku di awayê vebêjîna bixwe xwe dike çavkanî, hewl dide bîr û raman û hest û sozên karakterê me nîşan bide û bi rêya naw ve çûnê ve dikeve hindirê bûyeran bixwe. Lê nêrînên goşeyî yên derve de li gor wî cîhê di vebêjîyê de peyda dike, kêmtir ji aliyê rawekirin û ronîkirina bûyer û tiştan derdêxe aşkerabûnê.)¹⁷⁰

2.6 Gotûbêjên di Romana (Grewî Bextê Helale) ya Eta Nehayî de

Di pênaseyên herî sade û zelal de, (Gotûbêj pêktên ji axaftinên navbera du kesan)¹⁷¹. Bi wateyeke din, gotûbêjên wan axaftinan hatiye komkirin û hatine serûbin kirin ku di navbera karakterên romanê de pêkhatiye. Bi awayek ku rêveçûna bûyeran ji xalekê ve bo xaleke din veduguhêze, ev jî tê wateya ku şanokirina bûyerane, ku yekemcar rexnegirê Îngilîzî (Henry Jeyms) li ser rêbazê (Arîsto û Flober) pê rewî dikir û bangeşe bo wê dikir¹⁷², (Persî Lobûk) jî jê re dibêje ‘‘dramaya gotinî’’¹⁷³ û tê de karakter di çarçoveya mîlmilaneya bûyeran de û bi rêya bîr û nêrîna wan axaftinan ve bê ti xwe helqurtandineke ji aliyê nivîskar ve, agahiyan di derbarê xwe bixwe de didin. Bi wî awayî jî (Dramaya rawestayî) ku pêktê ji têr ramanên di cîhê xwe de rawestayî û teji bûyî ango peng bûyî yên di nav zîhnê karakteran de ye. Nakeve nav bazineya gotûbêjan, lê dibe çemkê gotûbêjên berfireh li ser bîr kirin û her gotinek ku dibe karakterek- eger rastî karaktereke din nekeve- di xwe de digre. Wê demê ew mijare jî dikeve nav bazineya gotûbêjên ku yek ji aliyan û tu bersiveke wan ji aliyê beramber ve nehatiye dayîn, herwaha dikare axaftina karakter jî li gel xwe, di

¹⁷⁰ - Romanî kurdî, Sabîr Reşîd, . Weşana Aras. Hwlêr, 2007. R 98.

¹⁷¹- Rêbaze Edebîyekan, Hîmdad Husên, Weşana Mukiryanî, Hewlêr, 2007. R 273.

¹⁷² - Bineretekanî Felsefa, Hemîd Ezîz, çapî duyam, weşana Endêşe, Slêmanî, 2009. R 25.

¹⁷³ - Çend wirbuneweyek le Mîtafizîka, Rênye Dîkart, wergêr: Hemîd Ezîz, wezaretî roşînbîry, Slêmanî, 2005. R 118.

çarçoveya gotûbêjan de bê danîn, bi taybet jî gotûbêjên navxwe de)¹⁷⁴. Derbarê gotûbêjên tişteke belge naxwaze ku ti axaftinek nayê holê, eger du kes amade nebin û axaftin û bîr û raman neyên gohertin. Elbet her yek ji wan du kesane di yek demê de her du rolê axaftvan û guhdarvan dibînin. Ji ber mirov di axaftina xwe de gelek car ti planeke diyar kirî ya pêşwext bo kontrolkirina peyvvan, mijar û babetan danayne, jî ber gelek car bê ku armancekî wî hebe, babeta serekî ya behsan li gel hin behsên tenişt û li kêlekê vedişêre û winda dike. di vê derê de erkê nivîskar tê pêş û agahî û hişyariya wî jî derdikeve pêş, ji ber pêwîste awayekê gotûbêja wêjeyî bê helbijartin û bixe ser zimanê karakterên xwe, bi awayeke ku gotûbêj ber bi tejbûn û dagirtûbûnê ve pêş de bibe. Ev jî ji bo ku gotûbêj ji gotinên rojane veguhêzine bo asteke bilind, ku peyv û pêkhate û babet û amajeyan wa lê bike ku pêwîste li her nivîseke wêjeyî de hebe. Gotûbêj parûzandinin, ne raport nivîsînin, di heman demê de jî sedemekin bo çûna nav kirokiya tiştan, lê nayê wê wateyê ku di asta gotinên asayî yên rojane bîn kêmkirin, ji ber ev diyardeye hetimyetêke û kêman roman heye bikare xwe jî bikaranînê biparêze. (Gotinên asayî yên rojane dema ku ziyane digehîne romanê, ku nivîskar bi armanca veşartina rûkêşî û cîhanbînî û nêrînên xwe bikar bîne)¹⁷⁵. Ev jî tê wateya ku armanca bikaranîna xwe di xwe de xwedî giringiyeke zêde ye, bo nimûne: Di şanoyê de gotinên asayî yên rojane pir bi awayeke belav tê bikaranîn, (Lê zêdetir wek sedemeke xweşikiya giring û pêwîst wek di şano nameyên (John Ozbon û Tense Weliams) berçav dikevin)¹⁷⁶. Wê demê gotinên rojane yên asayî li gel wê ye ku çavkaniya alfabe ango pît û tîpên gotûbêjane, peyvendiyeke wan a giring bi hevdure heye. Ew peyvendi jî peyvendiyeke bi bandore, ne wek peyvendiyeke pişta xwe pê ve girêdanê ye û xwe pê ve kirine, ku dibe sedemê acizî û bêzariya xwandevan jî romanê.

Tişteke ku belge naxwaze û temamê rêgezên romanê bi rêya vegotekirinê ve tê bi bingehekirin, gotûbêj jî ku yek ji sedemên herî giring ê vegotekirinê ye, roleke mezin di bingehe romanê de digre ser xwe. Ji ber ku gotûbêj wek ruhê roman tê pênase kirin û danûstandina li gel ruh jî kareke asan nîne. Ji ber jê zanîn û lêhatinê dixwaze. Li gor hin kesan roman nivîs dikare di nivîsîna romanê de gotûbêjan

¹⁷⁴ - Teknîky Gêranewe le romanî (Êwarey Perwane)y Bextîyar Elî de, weşan: Berêweberayetî Roşinbîry, Slêmanî, 2009. R 128.

¹⁷⁵ - Nusîn û Berpirsîyarî, Rêbwar Sîweylî, çapî duyam, weşana Renc, Slêmanî, 2006. R 14.

¹⁷⁶ - Şwêngey Betal, Pîter Bruk, wergêr, Pêşrew Husên, weşan: Rexney Çawdêr. Slêmanî, 2009. R 46.

piştguh bixe û tenê pišta xwe bi vegotekirinê ve girêbide, lê em vê nêrînê red dikin, ji ber nabe wênyê romanekê xala li gotûbêjê- bi hemû awayên wê ve- bikin, ji ber sedemê ew zimanê ku bikartê, gotûbêj agahî derbarê bîr û raman û estetîkê de helçûnê dike. wê demê divê nivîskar berî hertiştêkê hevsengiyê di navbera vegotekirin û gotûbêjan de ava bike, bi wateya ku ew tišta ku nabe di bingehê romanê de bi temamî pišta xwe bi vegotekirinê ve girêbide û gotûbêjan piştguh bixe, ne jî divê gotûbêj temamê yan jî piraniya pêkhatiya romanê dagir bike, ji ber di rewşa yekem de roman dibe parçeyê pexşkirinê û di rewşa duyem de jî nivîs zêdetir ji dram re nêzîk dibe û nabe roman.

Di romana (Grewî Bextê Helale) ya Eta Nehayî de gotûbêj bi awayê berçav bikarhatine, romanê bo vegotekirina piraniya bûyeran pišta xwe bi gotûbêjan ve girêdaye. Piraniya coreyên gotûbêjên di romanê de bikar hatine, pir caran bo agahî dayîna di nav dilê karakterekê berê xwe daye vebêjînê li gel keseke din, ne tenê wesf û pênase û vegotekirina rewşa derûnî ya karakter ji aliyê vebêj ve. Gotûbêj di romanê de di asteke bilind de ye, bi wateya ku peyv tejî, kûr û kurt û bi lez armanca xwe radigehînin. Beşdariyê berçav di vegotekirinê de dikin. Alîkariyê pir ji vegotekirina re didin, ku xwe biparêze ji wesfên dûr û dirêj û vegotekirineke pexşî. Di vê romanê de pir caran gotûbêj pirsgirêkan û bûyeran zelal dike.

“Eybe Şêrzad giyan. Kuwa ême pêwîstman bi pareyê wa heyê?”

“Nîmane?”

deygot: “Helale tika lê dekem ba lêre biroyn. Min le eme ziyatir na tuwanim lêre bijîm.”

“Biçîn bo kuwê?”

“Bo şareke tir. Ba biçîn bo Orubro. Bo lay Gulale û Şehab. Weedit dedemê le wê her karek ke to pêt xoş bêt bîkem.”

“Helale deygot: “Min şwênî karekem lêre ye. Cige leweş min lêre dexwênim...”

“Bo le Orubro natuwanî bixwênî?”

“Detuwanim belam...”

“Balam natewê lem kabra eceme segbabe dabibrêyt. Ha?”¹⁷⁷.

¹⁷⁷ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 276.

Gotûbêj roleke serekî dibîne di derxistina tiştên nav dilê karakteran de, ku xwandevan ewqas bi gotûbêjan ve şarezayê bîr û fikirandina kesayetên dibe, ewqas rawekirina çîrokbêj şareza nabe. Aşkeraye Şêzad di dawiya vê gotûbêjê de ya dilê xwe derdixwe derve û xwandevan dizane çima dibêje vere em ji vê derê biçin û li bajareke din niştêcîh bibin, dizane Şêzad dilê wî ji jina wî pîse û çav berdaye serkeftin û azadiyên Helale. Ji ber vê jî tiştê ku gotûbêj dikare bigehîne xwandevan, pîr caran vegote xwedî wê hêzê nîne.

Yek ji erkên giring ê gotûbêjê, têkbirina sarbûn û yek astiya vegotekirinê ye, di heman demê de jî bêhn vedanekê bo nivîskar û xwandevan jî dibexşe. Gotûbêj roleke berçav di pîrsgirêkên wêneyê karakteran de dibîne, armanca me ji wênekêşanê tenê sîmayên dervey karakteran nîne, pîr caran vegotekirin rasterast an jî nerasterast vî karî pêktîne, ji ber armanca me li rewşa ruhî ya derve û cîhana hûndirîne jî. (Karakter bi rêya gotûbêjan ve, agahiyên derbarê xwe, hest û nest û bîr û fikrên xwe dide derve)¹⁷⁸. Bi taybet bi rêya cilûbergan ve jî, karakter agahiyê di asta civakî û dîroka xwe de jî didin. Dervey vê jî, wêneyê mirov tenê xwe di xwe de têr nake bo ava kirin û nasîna karakteran, ji ber (zimanê axaftinê) jî bo wê armancê sedemeke girînge. Wê demê karakter zindî û aşkera derdikeve, ku axaftin dike û xwandevan jî wî guhdar dike û xweşiktir hest bi hebûna wî dike. Bi wî awayî jî, gotûbêj karakter û xwandevan rûbirûyê yek dike û nêrînên goşeyî yên xwandevan jî cîhê nêrînên goşeyî yên vegotekirinê de digire. (Vê derbarê de li gor (Persî Lobûk) ku dramaya rasteqîne de ti kesek (dîmen)venabêje, ji ber bixwe derdikeve û bone û gotûbêj cîhê vê digrin)¹⁷⁹. Herwaha ev awayê şanoyê bi awayê wêneyê cuda dike û li gor wî wisaye ku di nivîsîna wêne de yek nêrîna goşeyî heye ew jî nêrîna goşeyî ya xwandevan nîne, wê deme di romanê de, ku hin taybetmendiyên drama tê de ne, nêrîna goşeyî ya xwandevan derdikeve.

(Mame Fetah be hele neçûbû, Nesrîn xanim bi rast jineke jîr û aqil bû.

Deygot: “Keçit debê Helale giyan. Jin ke be bonî xoş birşêtewe keçî debê.”

Şêzad deygot: “Eger keçman bû nawî denêyn Ewîn.”

Helale deygot: “Reina.”

¹⁷⁸ - Çîrokî Kurdî, Rexne u Lêkolînewe, Sabir Reşîd, weşan: Roşenbîry, Hewlêr, 2005. R 118.

¹⁷⁹ - Bîrî rexney Hawçerx, komele wtar, wergêr: Newzad Ehmed Eswed, Weşana Mukiryânî, Hewlêr, 2001. R 33.

“Reina? Bo çî? Ewîn xweştire li Reina. Ewîn tê wateya eşq, ango heskirin.”

“Reina ango xweşik.”

Helale gelek ferhengan geriyabû ku wateya wê peyvê peyda bike, Reina ango jina gêj û lewçe. Çi? Reina ango jina xweşik û bedewe.”

Şêzad got: “Teqez navê keseke ku te jê heskiriye, navê deste xwîşka te jê heskirî bûye ma ne waye?

"Erê."

“Nemaye? Şehîd bûye?”¹⁸⁰.

Helale û Şêzad di hemû tiştê de nakokin, heta li ser navê wî zarokê ku hîn li dayîk nebûye jî rêk nakevin û bîr û nêrînên wan cuda ne. nivîskar ji bo ku nakokî û dûrbûna bîr û nêrînên wan yên ji hev du derbixe û aşkera bike wan gotûbêjan dike bingeh û bi dîalokeke bî wî awayî ve hin tiştan nîşanî xwandevan dide, wê demê ev yek tê wateya ku eger piştî karesateke mezin jî pêkbê ji bo xwandevan şok jiyan neke wan gotûbêjan derdixe pêş, ji ber me berê hemû ew nakokî û lihev nekirin dîtine û xwandiye. Bi wî awayî gotûbêj beşdariyeke bi bandor dike di birina pêş a bûyeran û berdeamkirina piroseya vegotinê de.

Gotûbêj sedemeke girînge di bingeh kirina bûyeran de, her bi rêya gotûbêjan ve bûyer pêşdikevin û ji xalekê bo xalekê û heta geheştina bi “girê” pêşde diçin. Dervey vê jî xwedî role di anîna beşdarkirina beşên bûyerên qutbûyî û windabûyî de. Ji wan hemûyan girîngtir jî, gotûbêj (dem û cîh) wek çarçoveyekî bûyeran aşkera dike, ji ber gotûbêj xwedî bingehê girîng ê bûyerane di romanê de.

(Dîmen ku yek ji teknîkên girankirina rêveçûna vegoteyê ye, dema ava dibe, ku dema vegotekirin û dema çîrokê yeksan dike.)¹⁸¹ nimûneya awayê dîmenê jî bi rêya gotûbêjan ve ava dibe, ji ber tenê di gotûbêjan de ew yeksaniya di navbera dema vegotekirin û dema çîrokê tê holê û coreyekê hevsengiyê ava dike. wê demê dikare bê gotin gotûbêj xwedî roleke girînge di bingeh kirina dîmen di romanê de û ji ber vê sedemê jî desthilat û dengê nivîskar di dîmenê de heta asta têkçûnê kêmbê, war bo karakterên xwe ava dike ku agahî di derbarê xwe de bidin û bibin xwedî deng û nêrînên goşeyî yên taybet û nêrînên wan bixwe hebin, ji ber derketin û xwe

¹⁸⁰ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 134.

¹⁸¹ - Fî Edebna El Qises El Miasir, Şucaî Muslim El Anî, Dar El Şun Elamme, Bexda, 1989, R 23.

helqurtandîna nivîskar di gotûbêjan de astengî û zihmetiyan dixwe pêş ava bûna dîmen, di heman demê de jî xwandevan ew atmosfera ku di nav vegotekirinê de dijiya, wa li dîmen dike ku hêza karîna xwe, ku yekemîn erkê gotûbêjane, ji dest bide. (Xeletiya herî mezin û pir bi pirsgerêk a nivîskar di (dîmenê gotûbêjê) de ye, di vê derê de reng dide, ku karakterên romanê pir caran wek hevdu derdikevin pêş)¹⁸². Hemû di yek asta rewşenbîrî de ne, ji ber her yek ji wan beşek ji deng û bîr û ramanên roman nivîs vergirtine. Ji ber vê jî nasnameya xwe ji dest didin û dibin kopyaya yek. Belge jî bo li yek çûn û têkelbûna dengê nivîskar û karakterên romanê de, ew dirêj kirineye ku di gotûbêjan de tê dîtine, ji ber gotûbêj di hin dem û cîhên pêwîst de nebe, bi awayeke xwezayî bixwe ber bi aliyeke kurtbirînê ve diçe, ne ku dirêjbûnê. Karakter jî di gotûbêj da yan hevbîr û heman nêrînê parve dikin û bi risteya kurt û amajeyan ve bersiva yek didin, yan jî nakok û dijî yek dibin û bersivên wan jî wek bandorekê bo beramber a lezgîn dibe.

(Mamosta ew gotin di civîna giştî ya endamên beşa ragehandinê de kir.

Got: “du sê endam ji beşên din ve divê biçin beşa çapemenî û weşanê.”

Her wisa berê xwe da Braymok: “Tu bira giyan, tu endameke çalak û mirovekî rewşenbîr û dest bi qelemî, divê ji naha û pê de biçî beşa çap û weşanê. Ez dixwazim ji vê şûnde pîraniya karê wê beşê de te erkdar bikim.”

Braymok veciniqî.

“Başê rodyo!? Gelo bernameyên min ên li radyoyê!?”

Mamosta got: “Di cîha te de du kesên din ezê rêkim radyoyê.” Her wisa got: “Hin ji bernameyên radyoyê jî divê gohertin tê de bînin kirin. bo nimûne gulistana helbest û wêje. Divê ji vê û pê de ew bernameye bi navê wêje û şoreş ve bê amade kirin û weşandin.”

“Kî dê amade û belav bike?”

“Yek ji wan xorta ne.”

Helale got: “Gelo ez?”

Mîrza Hesên got: “Tu naha endameke bihêz û bi ezmûnî. Dema vê hatiye ku tu bixwe bernameyeke taybet amade bikî û belav bikî, bernameyek bo jinan.”

¹⁸² - Çîrokî Nwêy Kurdî, Hesên Caf, weşan: Roşinbîry u Bilawkirdinewey Kurdî, Bexda, 1985. R 104.

Got: “Jin wek nivê civakê û baskekî serekî yê şoreşê ne. şoreş bê jinan û qurbanî dana wan nikare berdewam bike. Zilam û xortên şoreşger bi pişt germiya dayîk û hevserên xwe ve...”¹⁸³.

Ev gotûbêje nimûneyek berçavin ku çend gotûbêj xwedî role, di pêşde birina bûyeran de, di rastiyê de ev plana Heme Reşîdê axayê bavê Helale ye, bo ku keça xwe ji Braymok dûr bixe. Em di vê gotûbêjê de têdigeşin ku planek di vê derê de heye bo dûrxistina wan du kesane ji yek, ango dikare bê gotin ku bi armanc gohertin di beşên radyo û çapemeniyê de tê kirin û her di vê gotûbêjê de ronî dibe ku Helale û Braymok çend ne keyfxweşin ku cîhê wan tê gohertin û erkên xwe dest jê berdin, xwandevan hest pê dike ku ew her du jî dixwazin li yek nêzîk bin. Ji bo vê jî behskirina hemû wan hûrgiliyan tenê di gotûbêjeke waha de dikare bikeve ber behsê û xwandevan dikare armanca serekî ya pêşhatayan tê bigehe.

Gelek car nivîskar hewl dide xwe li xwe helqurtandina gotûbêjan biparêze û xwe bavêje ber fêleke hûnerî ku jê re tê gotin (araste kirina gotûbêjan) ku pêktê ji nivîskar di dema vesf û pênasekirina karakteran de, hin xasiyet û tiştan bo gotûbêjan zêde dike, wekî ku (Bi ser girînê ve dibêje, bi ken ve got, bi bêzariyê ve hate axaftinê...) lê ew fêle jî dîsa agahiyên derbarê nivîskar de dide, ji ber ev gotûbêjên bi wî awayî her dîsa girêdayîne bi nêrînên goşeyî yê nivîskar ve û rê ji xwandevan re digrin ku bi rêya gotûbêjan ve, wêneyekê bo karakteran di xeyalê xwe de bikşînin.

Eger gotûbêj li ser du beşên serekî de bê dabeşkirin, wê demê gotûbêjên rasterast û nerasterast di romana (Grewî bextê Helale) de her du şewaz jî bikar hatiye, her du core jî beşekî zindî ne di piroseya vegote kirina romanê de.

2.6.1 Gotûbêjên Rasterast

Gotûbêjên rasterast kurt tirin û berfirehtirin ji coreya gotûbêjên di romanê de, tê de karakter rasterast di navbera xwe de danûstandinê dikin, dikare bê gotin ku (gotûbêjên nobetî) bê binav kirin, ji ber (nobetî) ku li ser pirs û bersiv, bi hev gohertina nêrînan hewldan bo razîkirina aliyê beramber rawestayê, sîmayeke berçav ê vê coreya gotûbêjê ye, ku dibe sedemê paşvekişînê û sînordar kirina desthilatê û dengê vegotekirinê di piroseya vebêjînê de ye, (karakter jî bi azadî xwe pêşkeş dikin û bi awayeke rast goteyî agahiyê derbarê xwe de didin)¹⁸⁴. Bi wî awayî jî kareke

¹⁸³ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 188.

¹⁸⁴ - Teory binyatî şarawe, Necat Hemîd Ahmed, Weşana Aras. Hwlêr, 2008. R 175.

wêjeyî ye (bê alî û waqîf ango rastî) yê zêdetir di xwe de dibîne. Divê em vê yekê jî bibêjin ku gotûbêjên rasterast bi (gotûbêjên bêgerde) hatiye pênase kirin, bi wateya vê yekê ve ku gotûbêjên bi xal di her vesf û vegoteyekê de.

(Mecîd got: “Hîç, Hîç yek ji wan jî ne raste.”)

Got: “Ji xwe tu jî kurdî, gelo li gel we kevneşopiyeye waha heye? Gelo ma qet te tiştê waha bihîstiye?”

Nebû. Ne bihîstûbû. Di tu pirtûkekê de jî nexwandibû, ji ber wê.

Mecîd got: “hemû direw û daliqandine.”

“Kê ew hemû direw daliqandine?”

“Dibe Şêzad.”

“Çima?”

“Bo ku xwe derxe paqijiyê, ji bo ku tewanê mêrkûjiyê ji xwe paqij bike û xwe ji cezayê cinayetê ango mêrkûjiyê xilas bike.”¹⁸⁵

Di gotûbêjên rasterast ên bi wî awayî de hêza kom kirina gotinên axaftvan, çî di dema axaftinê de yan jî di rawestan û bêdengiyê de, yan jî di amaje û pirs û bersivan de, ango bi giştî piroseya peyvendî pêkanînê de, bi awayeke ronî derdikeve, ji ber di bingeş de gotûbêj coreyeye peyvendî kirine, ku tê de kes bi nobet dibin bi nêrer û vergir. Ji ber vê jî sîmayê (go kirin ango gote kirin) sîmayê herî diyare di gotûbêjên rasterast ê temamê coreyên din ê gotûbêjan cuda dike ye, ji ber axaftina karakteran di gotûbêjên vê coreyê de, bi gote kirineke rasterast tê danîn, ku li gel (Harîs) ev pêktê ji hemû beşek ji beşên xawtin ku axaftin pêktî, di pêş û paş vê beşê de jî bêdengiyek ji aliyê axaftvan ve heye, cîhê amajeye bo kirina gotûbêja rasterast di rêveçûna teknîkî (dîmen) de tê bingeş kirin, (ku teknîkekî drama kevne û di serdema (Homeros) de bikarhatiye û tê de karakter bi rêya gotûbêjan ve dîmeneke şanoyî pêktînin)¹⁸⁶. Bi wî awayî jî teqezî li ser wan taybetmendiyan romanê tê kirin, ku formekî çîrok amêz nîne bi bêhn ango henaseyekî dramî, ji ber formekî dramiyê di bergeke çîrok amêz de. Dîmenên nav romanê, ji ber paşdekêşana dengê vebêj coreyek li yeksanî û hevsengî di navbera piroseya vegotekirin û piroseya çîrokê de tê holê, di vê derbarê de (Henry Jeyms) daxwaz ji nivîskarên dike ku romanên xwe de

¹⁸⁵ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 320.

¹⁸⁶ - Geranewe le xeyalewe bo waqî, Eta Qeradaxî, weaşana Serdem, Slêmanî, 2004. R 88.

nirx bi nivîsandina dîmenê gotûbêjan bidin, ji ber derbarê wê yeksaniya di navbera dema vegotekirin û dema çîrokê¹⁸⁷, gotûbêjên agahiya bûyer, dem û cîh dike, ku dibe sedemê bicîhanîna erkê sereke yê gotûbêjê, ku karakteran di dema pêkanîna bûyer, kiryar û tevgera wan nîşan dide. Ev tê wateya ku bê karakter gotûbêj rasterast nayê hole, ji ber her karakterek xwe wek berhem anîna wî rêgezî pênase dike. divê em vê yekê jî bibêjin ku gotûbêjên rasterast wek coreyekî gotûbêjên derveyî, zêdetir di romanê pir dengî de bikartê, ku agahiya rikberiya aîdiyatan dike, di demekî ku asta bikaranînê di romanên tevgera agahî de ku li ser bûyereke derûnî rawestayê, pir ji wê kêmtire.

(Seîd got “Em demeke li vê derê ne?”)

Nasir zûtir ji Mecît geheştibû.

“Helale çawa ye?”

Lê Mecîd bersiva wî da.

“Te çawa dîtiye, her wisaye. Herwaha bédeng û...”

Nasir axaftina wî birî.

“Hemşîre dibêjin îşev axaftin kiriye. Yek du risteyên kurt ku kes tê negeheştîye. Dibe bi zimanê kurdî axaftibe.”

Seîd di bin lêvan de kenî û serê xwe hejand.

“Naha kî li gel e?”

“Gulale. Gulale ya xwîşka wê.”¹⁸⁸.

2.6.2 Gotûbêjên ne Rasterast

Yek ji taybetmendiyan ê gotûbêjê amadeyiya vegotevane, ku tê de axaftina karakteran, wek wan bixwe bi kurtî û puxtî vediguhêze. Ev tê wateya ku, bi rêya vê coreya gotûbêjê ve dikare gotûbêja rût ango teztî û bê kurt kirin û bi awayê nerasterast bê kirin û encama piroseya vegotekirinê bi bileztir dibe, ji ber li gel awayê nerasterast de ku piroseyeke ji bûyeran kûr dike, çîrok jî bileztir dibe, di wî karî de jî, gotûbêjên rasterast piştî xwe bi karên dema borî ve ango kesê sêyem ve piştî xwe girêdide. (wê demê vegotevan bi rêya vê gotûbêjê ve, çend gotin û kiryarên karakteran di raboriyê de heye û li gor xwe giring dibîne, bê ku destverdanê li bîr û

¹⁸⁷ - Lenaw bazney deq da, Semed Ahmed, Weşana Wezarata rewşenbîry, Slêmanî, 2003. R 130.

¹⁸⁸ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 309.

wêneyan bike vediguhêze bo dema naha, ji ber tenê destverdanê li bingehê ziman û ji aliyê dem û amajeyên axaftinê dike)¹⁸⁹.

Wê demê armanca serekî di gotûbêjên nerasterast de, kurtkirine, ku bazdanekê li ser dema vegotekirinê de dike û dema çîrokê kurttir dibe, herwaha ew bûyerên ku giringiyekî wan ji bo rêveçûna romanê tuneye, wan kurt dike yan jî qut dike, ji ber armanca nivîskar di bingeh de vegotekirina gotûbêjê nîne, ji ber dixwaze çîroka xwe bigehîne, lê ev wisa li gotûbêjê dike ku bi rêya ragehandina xwe ve ji dest bide ku ji kesekê ve bo kesekî din tê gohertin. Di vê dîmena jêr de ku Heme Reşîd Axa bo yekem car Şêzad tîne bo mala xwe û bi hevsera xwe dide nasîn, coreyek li gotûbêjên nerasterast a di navbera wan de pêktê û hejandinekê bi vegotekirinê dike û valahiyek mezin di romanê de teji dike, ji ber bûyereke giring û nabe ti demekê ew hevdîtina wan a yekem car bê jibîr kirin.

(‘‘Ev Şêzade. Ew jî Helale ya keça min e.’’

Got: ‘‘Helale heta demek berî naha li radyoyê kar dikir. Naha li dibistana awayî dersê dide zarokan.’’

Helale kofiyek reş girêdabû. Lêçek li serê wê nebû. Ji wê xweşiktir bû ku Şêzad li bendê nebû.

Heme Reşîd Axa qîr kir li Seadeta hevsera xwe:

‘‘Saadet vere. Vere bizanim dizanî ev kurê ciwan û xweşik kurê kiye?’’

Saadetê nezanî. Heme Reşîd Axa got: Şêzad kurê Ferec Axaye. Kurê Dîlberê. Te dizanî Dilberê kurê waha heye?

Saadet ji aliyê xwe ve jî Şêzad vergirt. Wek hemû careke din ku hemşehrî û nasnavekî xwe didît, derbarê kes û karê xwe de pirs pirsîn, nûçe û xeberên xelkê hemû bajêr lê pirsî.

Heme Reşîd axa got: ‘‘Şêzad kureke zîrek û paqij û xwandevane. Dixwazim wek kurekî mal bê zanîn. Wek kurê malê rêz lê bigrin û jê hesabkin.’’

Ji herduyan re got. Herwaha berê xwe da Şêzad û got: ‘‘Tu jî naha û pê de xwe wek kurê malê bizane û bê ku şerm bikî wek kurê malê yî û wisa tevbigere û vere û here.’’¹⁹⁰223-224.

¹⁸⁹ - Binyatî Gêranewe, le Dastanî(Mem u Zîn)y Ehmedî Xanî u romanî (Şary Mosîqare Sipîyekan) y Bextîyar Elî de, weşanxane: Mukiryan, Hewlêr, 2009. R 208.

¹⁹⁰ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 323-324.

Di navbera dialog û vegotekirinek peyvendiye têr û teji heye, bi awayekê em dikarin bibêjin dialog temamkerê vegotekirinê ye, bi wan tiştan radibe ku vegotekirin nikare pê rabe. Pêwîst nake tiştêk bi dialogê bê aşkera kirin bi rêya vegotekirina asayî ve bê aşkera kirin, ji ber karê dialog ewe, eger tiştêk nikare bi awayeke rêk bi rêya vegotekirinê ve bê aşkera kirin, wê demê dialog tê bikaranîn. Bi wî awayî ew erkê dikeve ser dialogê erkeke girînge, ji ber hûnera vegotekirinê, hûnerê berfirehe û piroseya berfireh a nav nivîsê dagir dike, bi wî awayî jî hêza wê ya karîne pir zêde ye, di gehandina tiştan û bi cîh anîna erkên xwe ve, ca eger hûnera vegotekirinê bi hemû hêza xwe ve nikaribe hin erkên xwe bi cîh bîne û di cîha wan dialog û gotûbêjan de vegotekirin nikaribe li wê erkê rabe, wê demê guman namîne ku ew rol û erkên ku dialog û gotûbêj di nav nivîsa wêjeyî de pê radibe erkên girîngin.

2.6.3 Hûnera Vesf di Roman (Grewî Bextî Helale) ya Eta Nehayî de

Vesfeke ji teknîkên vegotekirinê û peyvendiyeke tejiye li gel bingehên vegotekirinê, nivîskar bi rêya vesf û penaseyê ve zanyariyên zêdetir derbarê her yek ji karakter û cîh ji xwandevevanan re dibexşe. Vesf wêne girtineke zimanî yê watedare, (nivîskar ziman wek amûrê wênegirtin û veguhestina wê waqîbûnê ango rastiye bikartîne, ku dixwaze nav nivîsa waqî û rastiyeke din ava bike, ku wek rastiye jiyanê be)¹⁹¹, Lê kit û mit li wê neçe û xasiyet hebin ku ji wê bê cuda kirin. xasiyet ango taybetmendiye cudakirina jiyanê û taybetmendiye nivîsa wêjeyî dibin sedem ku cudayî bikevin navbera wan her du cîhanan de. Wî awayî vesf ne tenê ew navende bo wênegirtin û vesf kirinê re tê bikaranîn, ji vesf û pênase kirina rastiye cudaye, bixwe jî li wê vesfê cuda dibe ku di rastiye de heye. Vesf şewaz û rengên bi wî awayî venaguhêze ku çav dibîne, ji ber li gor nêrînên goşeyî yê derûnî û hûnera estetîk vediguhêze.

Girêdayî bi hebûna vesf bi wî nêrînên goşeyî yê ku bo vegotekirinê tî bikaranîn wa lê kiriye ku ji aliyekê ve peyvendiyeke têr û teji di navbera wan her du amûrên nav nivîsê de hebe, ji aliyekê din ve jî ya duyem çawaniya derketin û bikaranîna mijara yekem diyar bike. (Bo nimûne vegotekirin parçe parçe be, vesfê cîh ji ber yek hilweşandî dibe. Dem jî dîtineke berfirehe, vesfê cîhekî divê yekgirtî û

¹⁹¹ - Xewnî Nwsîn, komalêk Nivîskar, wergêr: Dilşad Xoşnaw, weşana: Serdem. Slêmanî, 2008. R 44.

giştî be).¹⁹² Eger ew nêrînên goşeyî yên ji bo vegotekirina nivîsê bikar hatiye serbixwe be, wê demê vesf yek parçe dibe û çîrokbêj bi tenê û li ser yek vesfa her tiştê dike ku bixwaze, lê dema bo vegotekirinê (ez) bikar hatibe, wê demê vesfa tiştan û karakteran beş beş bi xwandevan re digehe û hemû li ser yek nîne, ti yek ji wan ji karakteran nikarin vesfê temamî yê tiştan bikin, lê eger bi tenê bingeheke ya amûreke tenê karakterekê bibîne, wê demê “ez” wekî “ew” lê tê û “ez” vesfê tiştan hemû li ser yek jê re dibêje.

Di nivîsa vegotekirinekê de giringiya vesf, ji giringiya ti hûner an jî bingeheke vegotekirinê kêmtir nîne, vesf pêwîstiyê serekî yê vegotekirinê ye, pir zihmete bê vesf em bikaribin vebêjê pêkbînîn, lê kareke asane vesf bê vegotekirinê em bikin. Her tiştê jî dema dibe wek pêwîstiyek, wê demê bi naçarî dibe sûd jê bê vergirtin û bê bikaranîn. (Bikaranîna vesf ewqas tê pejirandin ku ji bo wê perwerde kirin û geşe kirina qehremanên (karakteran) çîrokê jî giringe. Dîmen û diyarde divê kar û bandorê li amadebûna karakter bikin)¹⁹³. Herwaha tiştên pêwîst, cil û berg û nav mal û awahiyên ku derxerê karakteran, divê pir bi hûrgilî bîna vesf kirin, lê nabe vesfkirina tiştan bibe sedem bo bistbûn û çêqîna piroseya vegotekirinê.

Erkê vesf li xwe girtina bûyer û kiryarên nav berhemekê de nîne, erkê wê kontrol kirina tiştan û pêkhatiyane li gel karakteran û tevgera wane. Herwaha wateya wê ew nîne ku vesf ti peyvendiyeke wê vegotekirinê ve tune. Dikarin vesf bo avakirina melodiya vegotekirinê bikarbînin.

Taybetmendiya vesfkirinê ewe ku dikare kurt be û dikare li gor pêwîst bê dirêjkirin. Dirêjkirin û kurtkirina vesf sedemin bo ku gelo awazê nivîs giran be yan lez be, rawestayî be yan bi tevger be. Di wan her du nêrînan de du erkên giring ê vesfê derdikeve ku yek ji wan kontrol û diyar kirina karakterane, cîh û amûrên nav nivîsê ye, ya din jî ava kirina awazê vegotekirinê ye. Hebûna wan erkên vesfkirinê, nêrînên rexnegirên klasîk piştguh dixê ku li gor wan vesf bingeheke rûnişkandina nivîsê ye, ku ev erkekî herî sade yê vesfê ye.

Bi giştî dikare erkê vesf di sê xalan de bê komkirinê:

1- Pêdana estetîk û melodî bi nivîsê.

¹⁹² - Ekrobatêkî Winbw, Îsmâil Heme emîn, weşana wezaretê Rewşenbîrî, Slêmanî, 2012. R 96.

¹⁹³ - Çîrok u Taybetmendîyekanî, Risr Hêlz, Wergêr: Selah Omer, wezaretî Roşinbîrî, Hewler, 2005. R 71.

2- Bexşkirina zanyarî û ronahî kirina taybetmengiyên navxweyî û derveyî yên pehlevan û karakteran.

3- Pêdana çemkê waqîf ango rastiye bi nivîsê.¹⁹⁴

Pêwîste tiştê heye ku em agahdar bin ew jî vesf bi armanca vesf kirinê ve neyê bikar anîn. Ji ber tenê divê tenê ji bo hebûna nivîsê pê bê mezin kirin, an jî tenê bi armanca wê bê bikaranîn ku xwandevan hin zanyarî li ser wan amûr an jî karakter û cîhan de bidest bixe vesf tê kirin. Pêwîste nivîskar li gel vesfkirinê her yek ji wan ên li gel zanyarî bibexşe di derbarê wan de û wa bike ku xwandevan tiştên din lê bikole û bingehê ava bike bo wan bûyerên ku dû ketiye û vesfê wan dide, herwaha bi coreyekê ku eger vesfê karakterek an jî cîhekê bike ku bûyera piştî vesfkirinê radibin an dibin ew cîhê ku bûyer tê de pêkhatine, wê zemînesaziyê ango bingehî divê ava bike ku xwandevan hest bi amadebûna wî karakterî yan jî wî cîhî bike, bo encamdan ango li xwe girtina bûyerê, lê ew nayê wê wateyê ku vesf heman wî rolê dibîne ku vegotin di nav nivîsê de pê radibe. (Vegotin li dû hev hatina dema bûyeran pêktîne, lê vesfkirin wan tiştane li xwe digre ku di cîhekê de yek dibirin)¹⁹⁵.

2.6.3.1 Vesfê Karakter di Romana (Grewî Bextî Helale) ya Eta Nehayî de

Herçend di vê romanê de kêmtir pişt bi vesf kirinê ve hatiye girêdan bo vegotekirinê jî, lê ti nivîseke wêjeyî xala wê tune ye ji vesfa tiştan, cîh û kesan. Pir caran xwandevan di dema xwandinê de hest bi giringiya vesf dike û tamedî pir jê re dibexşe, wa dike ku dîmenek di zîhnê xwandevan de ava dibe. (Deriyê hewşa wî hêdî min pêveda û pal da dîwarî û li ser Helale hûr bû. Dibe yekemcar bû Helale bi cilûbergê keçînî ve û çarşefê ve dibînim. Çarşefa Helale bo ser milê wê daketibû. Porê wê kurt wek her tim li derve bû)¹⁹⁶. Ev vesfa kesayetiya Helaleye, di temenê zaroktî de dema bo yekemcar cilê xortan fire dide û (Cemal an Kemal) bi wî awayî dibîne. Nivîskar bi awayek vesfa nav dilê wan karakterên zarokane dike ku evîneke paqij û bi soz û hogiriyê şermîname di derûniya wan de heye. (Wek paş sê caran zeng lêdanê bû, ku Helale derî vekir. Bi tîşortekî şîn û berê wê duçeqbû û şelvareke ketanî yê nav malê ve derî vekir. Çend li Helaleya berê diçû. Li Helaleya ew dame

¹⁹⁴ - Teknîky Goşenîga le romanekani Bextiyar Elî de, Mistefa Xiwatanî, weşan: Awêr, Hewlêr, 2015, R 159.

¹⁹⁵ - Wergêranî Rwxsarî Ewanîtir, wergîr: Hendrên. weşana wezateta rewşenbîry, Slêmanî, 2010. R 211.

¹⁹⁶ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 59.

ku taze arazûyên wê hebû. Wan rojane jî tîşortek li ber xwe dikir ku berê wê duçeq bû. Zêdetir ji nivê sing û memkê wê li derve bû...) ¹⁹⁷. Di vê derê de ev vesfe tenê bi armanca erotîk nayê kirin û bo vekêşîna xwandevan behsa sing û memkê Helale tê kirin, ji ber bi rêya vê vesfê ve nivîskar dilpîsî û zihniyeta rojhilatî ya Şêrzad bo me derdixe pêş. Zilam naxwaze jina wî li pêş çavê mêvanên wî singê wê li derve be û tîşortê yaxê wê fireh li ber xwe bike. Nivîskar bi rêya vesfê karakter ve tiştek din dibêje û armancê din dide derve, di hemû ew vesfên bi hûrgilî de wêneyeke ronî bo xwandeva ava dibe. (Heme Reşîd Axa bi roj ne dihat. Şev dihat. Piştî dinya tarî dibû. Pir caran ku derî vedikir bêhna xwîdanê jê dihat, xwîdaneke ku êvari li gel du yan sê kes ji hevalên wî, bi dizî ve di bin dar an jî keviyekê de vexwaribû. Bi tenê ba Saadet dipirsî: “Wî vexwariye kabra?” bê tirs û ecêbmayî dipirsî. “Nahêle, eger xelkê gund bizane...” Heme Reşîd Axa bê deng dibû ti gotinekî wî nedima. Wers û bê taqet diçû hundir, şûtika xwe vedikir, kulaw û cemedaniya xwe datîna, li ser kewilê pez ê spî piştî xwe dida dîwar, lingên xwe dirêj dikir û guhê xwe bi radyoya biçûkve di zeliqand) ¹⁹⁸. Heme Reşîd Axa zilameke xwediyê pêgeheke civakî yê bihêze. Ereq vexwarina wî navûbangê wî leke ango qirêj dike û têkdibê. Dîsa tenê ev ne vesfa kulaw, cemedanî û serfîne û çûna hundir nîne, ji ber dîsa ji ber ku ji keça xwe nîgerane berê xwe dide vexwarinê, îde ango fikra wan di destê wî de nemaye. Bi gotina kesekê nakin û çî bixwazin wê dikin, yek ji wan ku Helaleye li gel Braymok li ser kaniyê evîna wan bi rûtî û zelal hatiye dîtin, Gulale jî berdewam di nav hewşê û serban û ber derî mijûlê dildarî û evînê ye li gel xortên gund. Wan tiştane jî Heme Reşîd Axayê bavê wan nîgeran kiriye, ji ber vê kêmtir berê xwe dide male û tenê bi şev tê, berdewam bêhna ereqêberhemaneye ku pir bi tejbûnê ve vesf tê de tê dîtin, pir kêm nebe, eger na karakterek an jî cîhek di nav romanê de em nabînin ku vesf tê de nehatibe kirin. Roman nivîs tenê wênekêşîya dekor û karakteran nebe ne ti tişteke. Ew wênekêşîya roman nivîs bo cîh û karakter dike, bi rêya vesfên hûnerî pêktîne, ew karê bo wênekêşîna cîhê romanê û wekî hev kirinê ye li gel cîhê cîhanî yê waqîf ango rastî de. Bi vê jî armanc ji bikaranîna cîh di romanê de tenê rûnişkandin an jî tenê armanc vesfkirin nîne, herwaha vesf bixwe armanc nîne, ji ber nasandîna karakter û cîh dibe armanca serekî ya vesf kirina wî. Wekî hev kirina cîhê roman li

¹⁹⁷ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 329.

¹⁹⁸ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 163.

gel cîhê waqîf de karê herî girînge ku hûnera vesf di nav romanê de pêktîne. Roman bixwe berhemê wêjeyî yê herî nêzîk di waqîbûnê de datîne. Bi rêya vesf ve, roman nivîs dixwaze ew peyvendiya di navbera xwe û rastiye de bihêztir bike, wisa derbixe ku her yek ji wan karakterane û cîhên ku di romanê de hene di rastiya jiyânê de nimûneyên wan tê dîtin, eger ew bixwe di rastiye de nebin jî. Di vesfa karakteran de roman nivîs pêwîste bi hûrî agahdarê aliyê derûnî û bîr û fikarandin û wan rehendane be ku bandora wan li ser ava kirina aliyê navxweyî yê karakter heye, ji aliyê derve de jî pêwîste agahdarê danûstandin û tevgera karakteran be. Li gel nirxdayîna bi wan du aliyên di vesfkirina karakter de, pêwîste roman nivîs girîngî bide wan peyvendiyan ku di navbera aliyên derveyî û navxweyî yên di nav karakter de heye. Herwaha bikaribe hemahengiyekê di navbera her du aliyên karakter de ava bike. Ji ber ku ne hemaheng nekirina wan her du aliyên li gel yek di encamê de bixwe re dê ne serkeftûbûn ango şikest di ava kirina karakteran de li gel xwe bîne.

2.6.3.2 Vesfa Cîh di Romana (Grewî Bextê Helale) ya Eta Nehayî de

Vesfkirina cîh heta astekê girêdayî ye bi şarazayiya roman nivîs a di wan navçe û cîhên ku lê geriyaye û li qadê bûyerên pêkhatine û karakterên wî ve. (Heger cîhekî waqîf ango rastî be û roman nivîs bi destverdaneke kêr ve veguhestibe nav nivîsê girîngiyekê wê yê cuda heye, lê eger cîh xeyalî yan jî fantazî be û avakirina bîr û ramana roman nivîs be, wê demê pêwîste roman nivîs agahiya wî hebe ji wan vesfa ne ku pesn û vesfa wan cîha dîke û hemahengiyekê divê ava bike di navbera wan amûr û cîh bixwe de ava bike)¹⁹⁹.

Rêjeya wan vesfên ku di romanê de hene, sînordar nînin û ji romanekê bo romaneke din cuda ne. Herwaha vesf kirina karakterekê ji karakterek din an jî cîhekê bo cîheke din cuda ye. Vesf di hin romanên de dibe ku çend rûpelan teji bike, lê di hinekê din de dibe tenê ji beyteke biçûk pêkbê û pir zû jî bi dawî be.

(Yek du gavan li dû bavê xwe bû. Wek hemû carên din ku du kesî di çiya de ber bi malê ve diçûn, sîbera çiya ketibû ser rêya teng a biçûk, ketibû ser dar û baran û zinarên wî aliyê rêya zirav. Ew di bin sîberê de diçûn. Lê roj, roja ber bi êvarî ya baharê bû, wî aliyê çem hîn jî beşek ji dol û newalan wek deriyekê hemû awahî girtibûn himbêza xwe. Herwaha deşt û zevî û bostanên xwarê yên awahiyên gund jî

¹⁹⁹ -Teknîky Gêranewe le romanî (Êwarey Perwaney) Bextîyar Elî de, weşan: Berêweberayeti Roşinbîry, Slêmanî, 2009. R 158.

di himbêza wê de bûn. Deşt û zevî û bostanê xwarê hemû bi şînkayîbûn. Di nav wê şînkayiyê de pêl bi pêl gulên sor, şîn û zer ew qade xemilandibûn²⁰⁰. Vesf di romanê de radiwestê li ser pêwîstiyên romanê yên bo vesf kirinê, ne wek daxwazên roman nivîs bo wî karî û roman nivîs pêwîste xwe ji zêdegavê dûr bigre. Bi hûrgilî vesf kirina karakter, cîh û tiştan jî nabe ji aliyekê ve bibe ku vesf kirineke dûr û dirêj a tiştan bike. Ji ber ewqas vesf û pesnê tiştan divê bike ku li gor armanca nivîsê ya bi rêya vesfê ve tê xwastin pêkbîne. Dema ku ew kar jî kir, wê demê dikare bê gotin ku vesfekî serkeftî pêkaniye. Berevajî wê yekê bê pêkanîn, wê demê berdewam nalîn û zêdegaviya vesf kirina nav wê romanê pêktê. Hebûna vesfa zêde dirêj di romanê de acizî û bêzariyeke temamî li gel xwandevan ava dike, ji ber vê jî vesf heta astekî zêde westandin çêdike û rêveçûna nav romanê pir hêdî dike.

(Braymok li ser banê xanî mijûl bû bi radyoyê ve û binkeya ragehandinê û filût lê dida. Xaniyê radyoyê jorî hemû xanî û konên wî çiyayî di nav hin dar û berên bilind de bi heriyê û bi beran hatibû çêkirin. Ew dema tomarkirin, an jî bi weşankirina bernameyên xwe dibû, rojê dida çanteyê wî û diçû der, li teniştê xanî de dizivirî. Ji piştê ve li gor awahiya ser du beran, kevîr li ser banê xanî hebûn. Di bin sîbera giya û dar û beran, li ser beteniyeke kevin û diryayî ku berdewam li wê derê hatibû raxistin rûdinişt. Di wê bilindayiyê de, li ser banê wî çiyayî ku banê dol û newal û deriyek bû, gelek çem, deşt û awahiyên dûr û nêzîk li wê derê diyar dibûn. Ji vî alî ve jî zincîre çiyayek ku qey te digot li pişt yek hatine rêz kirin hebû. Yê herî dûr jî bi xweliyê, ji mijê yan dibe ku toz û axê di dûr de mirov digo qey hatine paqij kirin û nemanê...) ²⁰¹. Herçend di romana Grewî Bextê Helale de ji aliyê vesf de pir zêdegavî nehatibe kirin û nivîskar pir destê wî bi peyvan ve re girtiye jî, lê di hin cîha de vesf nebûye beşek ji vegotekirinê û ev yek ziyar gehandiye nivîsê, wek di vê paragrafê de em dibînin, di rastiyê de pêwîst bi vê vesfa zêde nake û kêman caran vesfê wek vî awayî di romanê de hene ku mirov hest bi zêdegaviyê bike. Zêdegavî di vesf kirina romanê de ji du aliyan ve bandorên xirap ango nerênî li ser romanê dike. yek ji wan ew acizî û bêzariya li gel xwandevanê romanê ava dike û ya din jî mezinkirina hacmê nivîsê ye, ku ev her du rewş jî dijî yekin, lê mezin kirina hacmê

²⁰⁰ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 154.

²⁰¹ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 146.

romanekê nabe pirsgirêk, lê eger roman nivîs karîbe bi awayeke serkeftî hemû bingeh û hûner bikaranîbin û tevgerike zêde karîbe xistibe nav romanê.

Eger vesf li gel roman nivîsên hevbi, tenê wek amûrekê razandinê û rûnişkandinê hatibe bikaranîn û rexnegirên wê serdemê tekezî li ser bikaranîna wê coreya vesfê kiribin, wê demê ew erkên vesf di nav romanê de dibîne qonax bi qonax hatine gohertin û di romanên nû û hewçerx de erkên di ji vesfkirinê re hatiye dayîn.

(Pir ne qerebalix bû, lê wek hemû cîhekî Stockholm li şevên yekşemê de pîs û qirêj bû. Tejî bû li zibil û qotiyên vala û kaxezên dirayî. Berî bigehin mehewetê, kesekî qelew dîtin, di tariyê de li pişt kacêkê de mijûlê mistînê bû. Keç û xortên ciwan destên yek girtibûn di tenahiyekê de winda bûn. Ji vir de tir du karker mijûlbûn û mehewet paqij dikirin. Di odeya rawestgehê de du kesên din heman kar dikirin. Helale û Şêzad di hindir de li pêlekana de digeriyan...) ²⁰². Di vê paragrafê de roman nivîs behsa şevêkî piştî bêhnvedana yekşemê dike, ku dema Helale û Şêzad li mala mamosta Seîd Rehmanî vedigerin, diçin nav rawestgeha qîtarê û li bendê dimînin. Di vê dema kurt de nivîskar bi awayeke jîr hin vesfên bi hûrî û lez ên navçeyê dike. Wêneyeke Stockholmê nîşanî xwandevan dide, ku çî di wê şevê de pêkhatiye. Di romana nû de vesfê ew berdewamiya heye ku li gel Flobêr û Kafka hebû, ku ya yekem bi hûrî û bi belge nîşandanê ve hatibû nasîn, a duyem jî bi dubare kirina li vesf kirina tiştê û dîtina bi hemû aliyan ve. Peyrew kirina wan her du tevgerane ji aliyê roman nivîs ve wa lê kiriye ku û ewqas hûrbûn wek wêye ku roman nivîs bi kamerayêke sînemayî wêneyê tiştan kêşabe ye. Herwaha ez eziya li gel roman nivîsan û qenaet neanîna bi tenê aliyekî amûr an jî bingehan ve bê vesfkirinê re rê nade, wa kiriye ku li hemû aliyê tiştan nîşan bidin û xwandevan bi hûrî li ser her bingehê agahdar bikin û vesfê wê dikin.

²⁰² - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 207.

3 Teknîk di Romana Girewiya Bextê Helaleyê de

3.1 MONOLOG (MONOLOGUE)

Monolog regekî vegêrandinê yê bi armanca pêşkêşkirina nava mirov tê bikaranîn. Ango bêyî ku deng ji wî kesî were, ligel dilê xwe diaxive. Romannivîs bi rêya monologê ve aliyên veşartî yên derûnê kesayetiyên dixin ber çavan. (Monolog ew cûrê teknîkiye ku rewşa derûnê (pîskolojî) ya kesayetiyên û kiryarên wan ên saykolojî pêşkêş dike)²⁰³. Berî di demên derûnê de weke derbirîn pêş bikeve û çêbibe, bi armanca di derbarê wê de gotin bînin kirin. Ango ew helwest û kiryarên di derûna kesana de hene, bêyî ku bê derbirîn û bi zimanekî hêsan ji xwendekar re bê ragihandin; di dilê xwe de helwestê li ser dide. Ev corê şêwazê jî weke teknîkek vegêrandina zêdetir di romana derûnê de tê bikaranîn. Ew jî çavkaniya xwe ji encamên kar û bûyerên derve werdigire. Li beramberî hinek bûyer û diyardeyan (fenomen) girîngiyê dide bertekên (reaksyon) derûnê û mejiyê kesayetiyên.

Erkê monolog tenê di sinorê eşkerekirina dilê kesayetiyên de ranaweste, belkî tevî pêkhatiya wê dibe. Ji bilî vê yekê romannivîs jî ber monologê dikarin dem û cihên xwe diyar bikin, niha, dema bûrî û siberojê tevî hev bikin. (Ev jî herî zêde bi rêya bikaranîna monologa hundir ve ye. Vê jî cûdahiyek zêde ligel pêla mejî (hiş) heye)²⁰⁴. Teknîka pêla hiş tenê ji aliyê kesekê ve, di berdewamiya romanê de bêyî raweste ligel dilê xwe diaxive.

Yan jî dema ku bîranînên wî/wê tên bîra wî. Ango ev teknîk jî beşek in ji monologê, tenê li gor cûdahiyên di navbera wan de heyî cûda dibin. Ev cûrê monologê di wê demê de rûdide ku hiş kesayetiyekê ku tenê wê demê dikeve tevgerê ku dema ji hebûna mijarê dûr dikeve. Ew jî taybetên ên di warên weke felsefe û saykolojî de. Lê kesê di romanê de dibe xwediyê xwe yê dûrî rastiya jiyane. Dema girêdayî fikir û saykolojiya derûniya xwe dibe. Ev cûrê fikirinê jî zêdetir nêzî bêagehiyê ye, dema kes jî bo nivîskar û ti kesayetiyek din naxive; heta jî bo xwendekar jî naxive. Tenê ligel xwe bi xwe daxive. Ango monolog berevajî diyalogê, guhdariya ti kesayetiyek din ê beramberî xwe nake. Ev jî yek ji taybetmendiyên serekî yên monologê ye.

²⁰³ - Teknîky Gêranewê le romanekani Ebdulla Serac de, Rêzan Ehmed Xidir, weşan: Rojhelat, Hewlêr, 2012. R 216.

²⁰⁴ - Nwnînekanm le Bwarî Rexne w Lêkolînnewda, Husên Arif, weşan: Serdem, Slêmanî, 2002. R 152.

Ligel vê yekê jî dema romannivîs hewara xwe digihîne ber bikaranîne, monolog di dema vegêrana romanê de hest bi çawaniya fikirîn û ezmûna jiyana wan kesayetiyên dike, bêyî ku ti tiştek derbixe. Ji ber ku monolog di romanê de amrazêke û bi awayeke rasterast xwendekar dibe nava jiyana hundir a kesayetiyên û bêyî nivîskar beşdar bibe. Bi rêya daxuyanî û derbirîna fikrê taybet, tişta nêzî mijara bê agayiyê ye. (Ango erkekî vegêranê digihîne encamê û ji bo nîşandana derûniya kesayetiyên peywendî bi ziman ve heye. Ji ber ku monolog wan fikran bi çend hevokên kurt ên rêziman tîne ziman)²⁰⁵.

Robert Himfrî, monologê li ser dû cûran parve dike:

1-Monologa Rasterast

2-Monologa Nerasterast²⁰⁶

Cûrê her yek ji van monologan li gor cihnavê (ranaw) ku di nava de tê bikaranîn, tê diyar kirin. Ev jî belgeya wê yekê ye ku peywendiyekî baş di navbera monolog û cihnavan (ranaw) de ji bo destnîşankirina cûrê wê monologa ku romannivîs di vegêrana romanê de bikartîne, heye

1-Monologa Rasterast: Ew corê monologê ye ku kesayetiyek rasterast ligel xwe bi xwe daxive, bêyî beşdarbûn nivîskar û nebûna ti guhdar û vegêranekê. Di vê cora monologê de romannivîs cihnavê kesê yekemîn ê kit, 'Min' weke axaftvan bikartîne. Lewra em hest bi wê yekê dikin ku kesayetiyek bi xwe daxive, kesek nehatiye wî bide axaftin û ji bo guhdariya wî bê kirin. Lê di rastiyê de nivîskar û xwendekar hene, lê di dema xwendin û vegêrana romanê de pêwîste hest bi hebûna wan bê kirin. Ango monolog rasterast durrî destlêwerdanên nivîskare û qaşo ne guhdar e. Bi vê jî kesayetiyek serbixwe pêwîste di derbirîna wan hest û kiryarên saykolojî yên derûnî de hebe.

2-Monologa Nerasterast: Ew corê monologê ye ku li cihê cihnavê kesê yekemîn ê kit, 'Min' cihnavê kesê duyem û sêyemê kit 'Tû, Ew' tê de bikartîne. Corê van herdu cihnavan jî peywendî bi gûşenîgaya kesayetiyên ve heye. Monologa

²⁰⁵ - Berew Estaney Roman u Goşenîgakan. Ebdulla Serac, weşan: Serdem, Slêmanî, 2007. R 27.

²⁰⁶ - Derbarey Roman u Çîrok, Heme Kerîm Arif, Yekêtî Nuseranî Kurd, Kerkuk, 2008. R 38.

nerasterast balê dikişîne ser xwendekar, ew û nivîskar jî di nava lîstikê de ne. Ji bilî wesifkirin, sedem û hestkirina bi rastiya wan di nav de tê bikaranîn. Ango nivîskar bi xwe derûna kesayetiyê dide axaftin, helwest û kiryarên wî dixê ber çavan. Lê bi rêya zimanê kesayetî ve vî karî dike.

Tevî vê yekê jî ji ber monologa nerasterast, xwendekar di dema xwendina romanê de hest pê dike ku nivîskar amade ye û agehdariya wî ji aliyên derûnê kesayetiyê heye. Bê gûman di heman demê de xwendekar hest bi hebûna xwe dike ku weke guhdarekê di dema vegêrana romanê de amade ye. (Ji ber di monologa nerasterast de nivîskarek zana tiştê pêşkêşî me dike, weke ji hestê kesayetiyekê hatibe û nebibe gotin)²⁰⁷. Herwiha nivîskar bi rêya wesifkirin û daxuyaniyan dibe sedem ku rê nîşa xwendekar bike û ji bo rêyekê bibîne. Ji bo çûyîna di nava kesayetî û çawaniya têgihîştina ji helwestên ku di nava xwe de derdixin.

Ango cûdahiya di navbera monologa rasterast û nerasterast de di du aliyên de diyar dibe. Ew jî li aliyekê bikaranîna cûrê cihnav e, li aliyê din jî amadebûna nivîskar û xwendekar ku di monologa rasterast de cihnavê 'Min' ê diaxive bikartê û hest bi hebûna nivîskar û xwendekar nayê kirin. Bi ti awayî amadebûna wan li holê nîne. Lê di monologa nerasterast de cihnavê 'Tû, Ew' tê bikaranîn, nivîskar û xwendekar amade ne û agehdariya wan ji derûna kesan hene. Bi awayek giştî monolog rewşa taybetî û dilgiraniya derûniya kesayetiyê nîşan dide. (Ango tiştê di mejiyê wî de ye, nivîskar bi awayekê pêşkêşî xwendekar dike. Bi vê jî monolog dema derûnî ya kesayetiyê diyar dike)²⁰⁸. Despêka her monologekê bi biwêja 'Min berê xwe da rûyê xwe, ez bi xwe re axivîm, min di dilê xwe de got, di dile xwe de got, ji xwe xwe re dibêjim..' destpê dike. Ev jî bo me derdixê holê ku kesayetiyêke ligel dilê xwe dikeve nava guftûgoyan de.

3.2 Monolog û Corên Wê

Romannivîs di vê romanê de bi rêya bikaranîna regezê monologê li gor dem û cihê fikirîna dilê kesên din radigihîne. Hinek caran bi rêya teknîka pêla hiş ve, fikirîna û mejiyê kesayetiyê bi pêl derdixê. Vegêran/nivîskar di dema vegêrandina romanê de hewara xwe digihîne herdû corên monologê.

²⁰⁷ - Teknîky Gêranewe le çîrokekanî (Marf Xeznedar)de, Şukirye Resul, wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2010. R 210.

²⁰⁸ - Nersîsî Kujraw. Bextîyar Elî, weşan: Endêşe, Slêmanî, 2015. R 321.

Di monologa di nava teksê de, kes daxive û heman kes jî guhdar e. Lewra pirsgirêka ku karekterek yan palewanekî (qehreman-Kesê serekî yê romanê) li ser daxive, pirsgirêka palewan an karektere yan jî ew bi xwe dixwaze dûrî wergirtina dîtina yê din yan jî rêdayîna xwe ji navderxistinê mijarê çarser bike.

(Şêrzad fikra wê yekê dikir ku sedî sed wê di dilê xwe de bêje: Temaşe bike ev herdu çend lihev tên. Tevî ku temenê wan kêr û zêde ye, tevî Sedî 15-20 salan mezintire, lê bawer bikin ev kêr û zêdeyî lê diyar nabe. Tû dibêjî cotekî destgirtiyên hev ên di heman temenê de ne. Dû dildarên hevta û hevferheng! Temaşe bikin çawa bi devê hev dikenin! Temaşe bikin çawa temaşeyî hev dikin û ji hev fêm dikin! Çawa ji dil gotinên hev vedigêrin!

Ev ew gotin bûn bi baweriya Şêrzad, Sûheyla ew jina Farise ku cara yekemîne dibînîn û dibînin. Jina wî mirovê mamostayê zanîngehê, nivîskar û lêkolînavî bû. Ew jin nexweş bû, dibe ku bi xwe jî heman pirsgirêk hebe, dilê xwe de dibêje)²⁰⁹.

Monolog şîrovekirina hişê karakter e. Ev şîrovekirin jî karakter bi xwe dike û dûrî beşdarbûna her karekterek din e. Li vir pirs girîng ew e ku qehreman an jî karakter çawa monologê hildibijêre, ji bo bi wê rêyê pirsgirêkên hene ligel xwe çareser bike. Yan jî di dilê qehreman an jî karakter de çi tiştêk veşartî heye, nikare bi rêya hunerên din ji me re bêje û hawara xwe digihîne monologê?

Di jiyana asayî de dema mirov ligel xwe daxive, dema ti kes ligel nebe û hest bi aramiyê bike. Ew hest ligel çêbibe ku rewşa derketiye ku ji bo bikare tiştên di nava dil û mejiyê wî de hene, tiştên ji yê din veşartî, bi taybet li ser baxive û bi hûrî behs bike. Dema mirov li ser pirsgirêkên hene daxive, wê demê rasterast hest bi aramiyê dike û heta radeyekê hest bi hebûna girêya kor a di nava dil de dike. Lê dibe ku hinek tişt hebin û ji wê yekê zêdetir veşartî bin, mirov bikare bi eşkere ligel yê din baxive. Di heman demê de pêwîstî bi axaftinê heye, ji bo hest bi wê aramiyê bike ya ji ber axaftinê jêre derketî. Lewra hewara xwe digihîne axaftinê, lê axaftina ligel xwe ne ligel yê din. Derûnnasî vê mijarê lêkolîn dike û bi rêya monologê di dilê mirov de pêngavekê ber bi pêş ve diavêje. Erkê kesê derûnnas hêsan dike, ji ber ku gihiştina bi dil ku cihê xebitîna derûnnas a li ser mirove, ne karek hêsan e.

²⁰⁹ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 218.

(Şêzad ji xwe ve ditirsiya. Ew di wê demê de bû dema pêwîst bû Hellale di nav de li himbêza xwe bike, laşê nerm û nazik li himbêza xwe bike. Niha Hellale li ser çirpake xwe dirêj kiribû, laşê germ û rût, nerm û jihevketî, ketibû ser çirpake. Bêhna mêran ji laşê wê dihat, bêhnek xerîb. Fikra wê kiribû çend ew laş biriye vî alî û aliyê din. Bajar bi bajar, çiya bi çiya, welat bi welat... Ew tûrbeyê goşt, xwîn, hestî û çermê li himbêza bi dehan kesan hatî kirin û parastî. Ji dehan dest û tiliyên têhn, dev û lêvên ter. Çima? Ji bo bigihîne rojek weke îro? Ji bo bigihîne cihek ku mala Şêzad be? Mala zilamek ciwan ku ev demek mêrê wê bû. Li salekê, berî sal û nîvekê bi nav û yasa mêrê wê bû)²¹⁰.

Monolog ew hûnera ku di nivîsîna çîrokan de tê bikaranîn, naveroka derûniya karakter û kiryarên derûnî nîşan dide. Di demek ku ew kiryar di asta cûda ya rêxistina hiş de berî bi armanc bê derxistin. Hebûna asta cûda û negihîştina monolog di warê derbirînê de nayê wê wateyê ku kêmasî di monologê de hene û nasandina vê corê monologê ne hêsan e. (Monolog bi xwe wê yekê ji me re îspat dike ku ew hunereke bê pirsgirêke, bi wê sedema ku erkê wê derxistina ew cihê ku destê mirov nagihê; ew jî dil e)²¹¹. Ango monolog li wî cihê kar dike ku ti hunerekî din nikare bi wê kêrhatiyê li wî cihê kar bike. Di heman demê de jî ew ne raste ku monolog nabe pey û hevok, ger wisa be gelo xwendekar bi rêya çî dilê karakter fêhm dike? Ji wê yekê jî cûdatir gelek çar kesê monologê encamp dide, dengê xwe bilind dike û diaxive. Vêca eger monolog ew dîtin û derbirînên bi rêya monologê derdixe, negihîştibin wê astê ku axaftin li ser bê kirin; gelo ew axaftin û derbirîna wan peyv û rastiyan ji kêrhatiyê tê? Lewra armanc ji axaftinên li ser tiştên ku bi rêya monologê tên ziman, ewe ku qehreman an jî karakter ew gotinên dike nagihin armancê û weke axaftinek asayî bernameyê jêre nadane. Lewra hem monolog hunerekî têgihîştîye û hem jî ew tiştên bi rêya monologê ve tên nîşan dan, karîna wê yekê di nav de heye ku axaftin bîn kirin. Lê qehreman an jî karakter hemû tiştan û heta bi xwe jî pirsgirêkan çareser bike, dûrî yên din.

Monolog di nava tekstê de erkên cor be cor dibîne, gelek girane û gelek hûrîti di nav de hene bi wê wesfê karakter dide. Hûrîtiya monologê vedigere ji bo tiştên ku qehreman an jî karakter bi rêya monologê tên ziman. (Ew tiştên ku di dilê

²¹⁰ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 68.

²¹¹ - Xewnî Nwsîn, komalêk Nivîskar, wergêr: Dilşad Xoşnaw, weşana: Serdem. Slêmanî, 2008. R 64.

wan de hene û heta tiştekan ji bo monologê diar neke, ew di wan tiştan de amade nabin)²¹². Lê dema bingehê wê yekê çêbû ku qehreman an jî karakter ligel xwe baxive, rasterast wî karî dike û hemû tiştên di dilê wî de hene, bi rêya monologê têne ziman. Lewra monolog di nava tekstê de ji nişka ve behsa çîrokê dike û xwendekar rasterast ji tiştên veşartî yên di nava dilê kesayetiyên de têdigihe.

(Hellale ligel ne axivî, telefona wî şikand û temaşeyî hevalên xwe dikir ku diaxivîn û pê dikenîn. Eger gotinên dayîka wî jêre vegêre... Eger jêre bêjin ku biryare li Kurdistanê ligel zilamekê mar bikin (bizewicînin) û ji wir ji min re rêkin... Keniya wî hat. Pêkenînek tal û nexweş. Hê jî bi temamî ew yek fêma nekiribû tiştên dayîka wî daxwaz kiribû. Weke kesek bû axaftinek nîvço bibihîse. Bi rastî dayîka wî daxwaza çî jê kiribû? Bi berdewamî hevalên wî pê dikeniyên. Nekû wan jî gotinên dayîka wî bihîstibe, di wê rewşa ecêb de tiştên ketibin di nav de bihîstîbin? Çawa bersiva dayîk û bavê wê bidin? Bersiva kîjan pirsê? Ya dayîka wî gotî ne pirs bû, daxwaz bû. Na, xeber bû. Xebera wê yekê bû biryare ji Kurdistanê mêrekê jêre bişînin. Mêrekê jêre post bikin. Ew jî kî, Şêzad. Ji bo demekê Şêzadê bi rih, simbêl, bi şal û şapik, bi cemedanî û bi çek di nava kartonekê de li postexaneyê bibînin. Keniyê wê nehat, dilê wê teji bû. Gelo bi rastî ev welat cihê kurek mezlûm ê weke Şêzad di nav de nayê dîtin? Gelo ew kûr wisa zêde jêre hatiye ku biçûkatiyek wiha bide? Dilê wî pê şewitî. Şêzadê bextreş...) ²¹³.

Weke tê dîtin Hellale ligel xwe di nava monologek dirêj de ye. Fikra eger û pêşhatayan (texmîniyan) dike. Fikra rewşa xwe ya piştî hatina Şêzad dike, gelo wê jiyana wê çawa lê were. Hê ti tiştekan zelal nîne, lê telefona wî ew matmayî hiştiye û hê jî nizane wê çî çêbibe. Di nava rewşeke derûnî ya aloz de ye, fikrên wê nayên kom kirin û hê jî nikare li ser xwe bibe hakim. Nivîskar di rewşekê guncaw de hewara xwe gihandiye monologê û me ji rewşa nava karakteran agehdar dike.

Ji ber monolog heta astekê peywendî ligel bîranînen xwe heye û di cîhana bîranînen wê de dema borî, niha û dema bê tevlihev dibin û dem wateya xwe ji dest dide. Tevî ku jîdestdayîna wate ji aliyê demê ve nayê wateya nemana demê û dem timî di nava dilê mirov de jî heye. Lê li wir û bi taybetî jî di dema monologê de, wê lojîcê di nava jiyane de yan jî di nava tekst û derve ya karakter a heyî winda dike. Bi

²¹² - Zanko le Modêlêwe bo Waqîî, Rêbwar Sîweylî, weşana Dezgay Gencan, Hewlêr, 2007. R 83.

²¹³ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 246-247.

heman awayî di monologê de cih û tişt (eşya) jî diyar namînin. (Di encamê de ferd (kes) ê ku monologê çêdike, heta astekê ji herdû corên dem û cih rizgar dibe. Rizgarbûn jî ji bo hemû tiştên armanca xwendekare bigire nava xwe, dibe alîkar)²¹⁴.

Erkek din ê monolog di nava teksta çîrokî de digire nava xwe, bidestxistina karakter e. Me berê di hunera diyalogê de ew yek got ku ji ber axaftinê, qehreman an jî karakter zêdetir nêzî rastiyê dibe û xwe weke tiştêkî zindî nîşan dide. Vêca eger diyalog bikare vî karî bike, wê demê hunerê monologê ji bo dest bi karê bidestxistina qehreman an jî karakter pêngavekê li pêş e. Divê xwendekar piraniya demê hewl bide ku bi rêya axaftinê tiştên veşartî yên di nava dilê qehreman an jî karakter de nas bike. Lê di nava monologê de xwendekar bêyî ti astengiyekê (ji bilî yê çîrokê vedibêje) van tiştên eşkere nas dike, qehreman an jî karakter bi xwe hewl dide di vê derbarê de zanyariyan bide xwendekar.

Di nava romanê de piraniya corên monologê tên dîtin. Sedema vê jî bikaranîna gelek cihnavane û corê yê çîrokê vedibêje. Herwiha di nava romanê de mirov dikare tenê cihnavê serbixwe ‘Ew’ bikarbîne û mirov dikare bi tenê ‘Min’ jî bikarbîne. Lewra hinek roman nivîs hene herdu cihnavan di nava teksta xwe de bikartînin.

3.3 DEM (TIME)

Berî ku em behsa rolê demê yê di vegeerêna romanê de bikin, despêkê pêwîste em corê demê fêhm bikin, giringî û pênaseya demê di warê teorî de diyar bikin.

Armanca ji corê demê, regeza serekiye ku regezên karê hunerî pal dide ku bikeve tevgerê, pêşbikeve û bingehê hunerê romanê biqedîne. Ji ber ku weke valehiyekê hemû pêkhate û regezên din di nav de diyar dibin. (Ji ber qewimîna her bûyerekê girêdayî dema di nav de rûdayîye. Bi wê sedemê çawaniya rolê aliyên din ên weke, erek û peywendiya wan a bi demê ve diyar dike)²¹⁵. Çawaniya tevgerkirina ligel demê ya di nava nivîsîna romanê de, dibe yek ji xalên giring ên vê hunerê û divê nivîskar di derbarê wan de gelek hûr û hişyar be. Berevajî wê di nava bikeve di nava şaşitiyên mezin de.

²¹⁴ - Lalezarî wise, Muhammad kurdo, weşana wezateta rewşenbîry, Slêmanî, 2007. R 17.

²¹⁵ - El Neqid El Edebî, Ehmed Emîn, El Naşir Kitab El Erebî, Beyrut, 1967. R 114.

Li gor dîtina Birgson ku bi awayekî berdewam temaşeyî demê dike, li gor wî bi berdewamî tê wê wateyê ku dema borî berdewam e û hê jî dema wê derbas nebûye.. Bê gûman beşek biçûk ji dema me ya borî fikirîne, lê em ji hemû dema xwe ya borî hez dikin, dixwazîn û kar dikîn. Madem dem li ser hev kom bûye, wê demê bi ti awayî siberoj (dahatû) weke dema borî lê nayêt. Ji ber ku ligel her pêngavekê kombûnek nû çêdibe. Ango tevgerkirina demê di wê milmilanêya ku di navbera deman de heyî, bi rê ve diçe. Herwiha Lok jî xwediyê heman dîtînê ya li ser demê ye. Li gor dîtina wî, kes bi rêya wan bîranînên ku derbarê fikir û karên dema borî de hene, ligel nasnameya xwe ya berdewam peywendiyên peyda dike. Çi tiştê di derbarê dema vegêrandê de, armanc jê vegerana wê bûyera di nava romanê de peywendî ligel hev heye; li ser regez û astên demê dabeş dibe. Lewra li gor dîtina E. M. Forster (wênegirên jiyane ji ber demê û ji bo pêşvebirina bûyer û çarçoveya kesayetiyên di dema vegeêrana romanê de rolek giring dileyîzin)²¹⁶.

Dem bi dîtina corê texlîdî bi awayekî zîncîrî (yek li pey yekê) di vegêrana romanê de li pey hev tê. Lê li gor dîtina romana nû, ev corê bikaranîna demê di vegêrandê de hatiye şikand. Romannivîs di çawaniya bikaranîn û peyrewkirina demê ya di romanê de azad bû. Ev jî girêdayî jêhatiya romannivîs e. Ji ber ku eger deshilata nivîskar li ser demê de bişkê, wê demê wê karîna wê yekê hebe ku ligel xwendekar wê yekê çêbike ew tekst rast e. Lê eger ew jêhatin ligel nivîskar nebe, wê demê di warê demê de nirxekî statîstîkê nade vegêrandina romanê.

Ji bo vegêrandina romanê romannivîs di warê bingehe hûnerî de giringiyekî zêde daye çawaniya tevgerkirina demê. Ev jî bûye sedemê wê yekê ku bikare bi xwestek û daxwaza xwe bi demê bileyîze. Ji ber ku di nava romanê de leyîstina bi demê karek statîstîkiye, bandorê li çawanî û hebûna bûyerê nake. Belkî bandorê li awa û rêxistina bûyerê dike. Ev jî wisa li xwendekar dike ku li pey çawaniya rêzbeniya demê bigere û bizane romannivîs bi çî awayî dema vegêrana romanê peyrew kiriye. Dem weke giroverek an jî xetêke rêkûpêke li derdora bûyer û kesayetiyên dizivire. Ji ber ku hemû bûyer di demê diyarkirî de rûdîdin. Di heman demê de vegêrana van bûyeran jî, girêdayî dema kesayetî vedigêrin e.

Ango mirov dikare bi awayekî giştî bêje ku dem di romanê de, ew dema rêjeyî ye ku çawaniya vegêrana bûyer û tevgerkirina kesayetiyên di dema niha,

²¹⁶ - Aspects of the Novel, E. M. Forster. A Pelican Book, Great Britain. 1971. P 51.

borî û bê de li gor awayê vegêrana tekstê rêkûpêk dike. Bi awayekî herî baş derbirîne li abûrî, civakî, derûnî û fikrê wan ê di helwestên cûda de dike. Felsefeya wan a ji jiyane ji despêkê heta dawiya bûyeran nîşan dide. Ango corên demên yê weke ‘Dema niha, borî û bê’ digire nava xwe. Lê romannivîs li gor wê aliyê ji bo vegêrana bûyeran heye, dikare awayê dema vegêranê diyar bike. Weke pêkhatyeke aloz bixe tevgerê û cihê wan bigûherîne. Romannivîs li vir sûdji montaja sînemayî werdigire. Li vir jî montaja demê dixê ber çavan, di nav de hes û hişê kesayetiyên di ‘Demê’ de tevger dike, lê her di ‘cihê’ xwe de ne.

Di warê teknîkiya vegêrana teksta romanê de, dem weke bingehek hatî çêkirin çawaniya demê vegêrana bûyerên me ji me re cûda dike. Di derbarê cûdakirina demê ya di romanê de, Şêklofîskî demê li ser dû beşan parve dike. Ew jî evin:

1-Dema Çîrokê

2-Dema Vegêranê²¹⁷

Di dema wêjeyî (edebî) de pêwîsta Dema Çîrok û Dema Vegêranê ji hev bê cûdakirin. Dema Çîrokê, ew deme ku bûyerên hatine pêşkêş kirin, di nav de rûbidin. Lê Dema Vegêranê, ew kae ku pêwîste ji bo xwendina berhemê, dema nîşandanê, ango her bûyereke tê vegêran dema xwe heye. Dema Vegêranê bi xwe de demeke taybet heye. Ev jî bûye sedem ku di vegêranê dû dem derbixevin. Dema Bûyer û Dema Vegêranê. Tevî ku ev herdu dem di warê dem û rêxistinê de ne weke hev in, lê peywendiyên wan ligel hev heye. Ji ber Dema Vegêranê, çavkaniya xwe ji Dema Bûyerê werdigire. Tevî vê yekê jî dem di warê hebûn, hest û helwestên kesayetiyên de dûr cor hene:

1-Dema Derve (Fîzîkî)

2-Dema Di Nav De (Derûnî, Pîskolojî)

1-Dema Derve (Fîzîkî)

Ew deme ku li derve mamele ligel tê kirin. Weke formek rast û mijara maddeya wê ne rawestiyayî. Ev forma hebûna madde: Lipeyhatina pêşvebirina qonaxên meteryalî û gûherîna hinekan bi hinekên din, dûrketina qonaxên cûda ku

²¹⁷ - Teknîk le Kurte Çîrok de, Azad Mhammed, Wate, jmare 3, Hewlêr, R 76.

wan prosêsan ji hev, dirêjbûn û pêşvebirina demê digire nava xwe. Ango li derveyî hestê kesayetiyên de ye û ji ber pêkhatiya mijarê, tê destnîşan kirin.

2-Dema Di Nav De (Derûnî, Pîskolojî)

Ew deme ku peywendî bi hundir û derûnê kesayetiyên ve heyî. Ev corê demê di romanê nûnertiya pîrsgirêk û reqabeta (milmilanê) kesayetiyên bi xwe dike. Destnîşankirina Dema Hundir ne hêsan e, ji ber ku li gor rewşa derûnî ya kesayetiyên tê diyar kirin û dem ji hemû corên din giringtir e. Ango bi awayekî giştî ev dem, derûnî ligel hest û rewşa derûniya kesayetiyên tê gûhertin. Ji ber vê yekê mirov nikare mamele ligel vê demê bike. (Ev jî di encama bandorîkirina derve rûdide, ji ber ku kesayetî wê demê diyar dike ku ya bûyer di nav de rûdaye)²¹⁸. Dibe ku dema bûyerê dirêj bûyî be, lê di hest û derûniya wî de weke demek kurt tê diyar kirin yan jî dema bûyerê kurt bûye. Tevî ku kesayetî di derûniya xwe de xwe ji bo demek dirêj amade dike. Lewra ev corê demê bala xwendekaran radikêşe ser xwe. Weke alîkariyekê xwendekar diçe nava fikra kesayetiyên, temaşeyî pîrsgirêk û helwesta dema derûniya wan kesayetiyên, ligel nivîskar wêneyê hest û hişê kesayetiyên xîz dike. Tiştê em li vir balê dikişînin ser dema vegêrana romanê ya di warê teorî û pratîkî de ye ku peywendî bi awayê vegêran û gûşenîgaya yê vedigêre re heye.

3.4 Dem û Corên Wê

Dema di romanê de heyî, timî dema bûriye. Bûyerên ku çêbûne, ji dîroka hizir û civakiyê hatiye wergirtin, demek li ser wan re derbas bûye. Roman weke destanê piraniya bûyerên ku behs dike, dema wan li gor demên vegêranê dema derbasbûyî ye. Lê di romanê de dema niha û bê heye. Dem di romanê de wê yekê wînda dike ku ya di destanê de hebû. Lewra ew mameleya di destanê de ligel demê hatî kirin, li vir ew mamele tê gûhertin û dem dibe bingehekî herî serekî ji bo dirûstbûna romanê. Ango li vir cihê wan nirxan digire yê ku bingehekî destanê li ser çêbûyî, corê demê lêhatî ber bi rêjeya hebûnê ve diçe. Dema romanê ew rêjeye ku çawaniya vegêrandina bûyeran û tevgerkirina kesayetiyên ji niha, dema bûrî û bê de li gor tekstê tê rêxistinkirin. (Awayê vegêrandina bûyeran rol dileyîze, ne bûyer bi

²¹⁸ - Teknîky Gêranewe le romanekanî Ebdulla Serac de, Rêzan Ehmed Xidir, weşan: Rojhelat, Hewlêr, 2012. R 164.

xwe)²¹⁹. Eger awayê vegêranê dema bûrî be, wê wextê dema vegêranê divê dema bûrî be. Eger dema niha yan jî bê be, wê wextê wê dema romanê bi heman awayî be.

(Hewa sar bû. Sarbûnek ne di dema xwe de û zû. Meha îlûnê û ew serma!? Hellale ji bîr kiriye. Kengê ev serma wê ji laş û giyanê wê derbikeve? Sermaya hemû şev û rojên jiyana wê yên di bîranînên wê de mane. Ji bo ji vir û pê ve, zêde ji vir û pê ve, di tarî û ronahiya odeyan de ji bo Seîdî vegeerê. Ji bo Dr. Seîd Rehmanî. Ji bo mêrek ku nedizanî tiştê dibihîse parçe parçeya çîrokekê ye ku wê qedera vegêranê bikeve stûyê wî. Hellale di dema vegêrana parçe parçeyên bîranînên xwe yên ji bo Seîd, êdî ew keç ne keyfxweş û serxweşê wan rojan bû. Ew keç çalak (aktîv), karker û xwedî bernameye, ji xwe bi bawer, dev li ser piştê li pey xwezî û hêviyên xwe direve..) ²²⁰ 267-268

Weke em dibînin dem parçe parçe ye, tevlihev û aloze, hem dem weke niha vegêrane ku hewa sare û meha îlûnê ye. Hem jî dema bûyerên cûda ye. Çi dema çîrokê ji bo Seîdî Rehman vedigêre, çi jî ew dema ku dema bûyerên tiştane ku dikeve bingehêkî pêşvetir. Di vê romanê de dem, bi yekcarî aloz e. Xwendekar divê bi hûrî vê romanê bixwîne û ji bo ji demê paşde nemîne. Ji ber ku hemû paşketinek di demê ya di romanê de, paşketina di bûyeran de û têngihiştina ji tevahiya çîrokan. Lewra nivîskar mameleyek gelek hûr ligel amraza demê kiriye, gelek caran bêyî ku xwendekar hest pê bike, çend salan paşde vedigere û behsa bûyerên kevin dike. Dema ku Seîdî Rehmanî tiştan di nav de behs dike, ji dema Hellale çîrokê jêre vedigêre cûda ye. Herdû dem jî ji dema çêbûna bûyeran cûda ne. Herwiha dema ku nivîskar çîrokan di nav de dinivîse, demek serbixwe ye û ji hemû deman cûda ye.

Romanê peywendiyek baş û xort ligel demê heye, bêyî demê ti wateya romanê nîne û nabe roman ji demê qut bibe. Roman amraza herî nêzîk a wêjeyî ya di rastiye de û rastî jî bê dem nabe. Lewra hemû roman nivîs deyndarê rastiya bingehîn in, lê bi bêwênebûna xwe taybetmendiya deshilatdariya li ser demê de peyda kiriye. Heman ew pirrengiya bingehîn a di jiyana de heyî, romannivîs bêyî dû diliyê ji bo nava tekstê, tevger dike û sistema bingehîn dişikîne. Wê karîna deshilatdarbûna li ser demê peyda kiriye û dikare bi vî awayê ku xwe bi pejirandî dibîne, wisa hest dike ku bi vî awayî di xizmeta romanê de û bi vî awayî mamele ligel demê dike. Ew rastiya

²¹⁹ - Xewnî Nwsîn, komalêk Nivîskar, wergêr: Dilşad Xoşnaw, weşana: Serdem. Slêmanî, 2008. R 84.

²²⁰ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 267-268.

ku gelek baldar ew e ku piraniya pêşketinên di hunera romanê de hatine bidestxistin, di bingehê xwe de ew pêşketinên ku di corê demê de rûdayî. Lewra eger despêkê mameleya romannivîs despêkê xwediyê heman mameleyê be ya ku nivîskarên destanan ligel demê de dikirin, ya hê baştir ew e ku em bêjin bikaranîn heman dema rêzbandiya ku bûyeran yek li pey yekê dihatin. Ev yek di romana nû de û ji ber van gûhertinên zêde yên di demê de hatine kirin, romannivîs neçar kiriye ku weke yek ji qehremanên herî girîng ên romanê mamele ligel bike. Ji ber ku çî dirûstbûna romanê û çî jî pêşketina wê, girêdayî demê ne.

(Wê rojê yek ji rojên herî seyr bû, hemû malbat bi hev re kom bibûn. Çend roj bû Heme Reşîd Axa vegeriya bû. Hellale jî ew demek bû li radyoya çiya kar dikir, wê rojê ji mal derneket. Karwan jî ji roja xwe ya bêhnvedanê hatibû. Şeva borî hemû malbat, ji bilî Mecîd li derdora sifreyekê kom bibûn. Çi xwaribûn? Li fikra Hellale bû. Dayîka wê mirîşkek anî û serê wê birî. Seadetê di dema çêkirina xwarinê de ji ber xwe ve wiha got: "Çend xweşe îşev Mecîd jî bê û ji vê mirîşkê bixwe!"

Ew demek dirêj bû Seadetê Mecîd nedîtibû. Keçên wê jî demek bû ne dîtibûn. Ji dema ku vegeriya bû gund, tenê carek an jî dû caran dîtibû. Seadet got: "Xwezî dihat."

Hellale got: "Bi vê êvarê!? Bi vê berf û bahozê?"²²¹.

Dem weke hemû demê di romanê de xwediyê amadebûnek diyar e. Gelek bi hûrî hatiye bikaranîn û beşeke ji vegêrana romanê nayê qut kirin. (Ew rojê ji wan rojên seyr bû... Heme Reşîd Axa çend roj bû... Hellale demek bû... Wê rojê ji mal derneket, Karwan jî di roja xwe ya bêhnvedanê bû.. Şeva borî hemû malbat...)²²². Ev hemû amajeyên ji bo demê yên di vê romanê de bi agehdarî hatine encamdayîn. Ev awayê bikaranînê wisa dike ku zêdetir bûyer nêzî rastiye bin. Wêneyekî rastîn ê malbatek Kurdî digire û xwendekar ji ber demê wêneyên ciwantir di mejiyê xwe de çêdikin. Dem alîkariyek mezin dide xwendekaran, ji bo hê zelal û sadetir ji girêyên aloz ên tekstê fêm bike.

²²¹ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 139.

²²² - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 312.

Di romana nû de corê demê hatiye gûhertin, dema di nava romanê de wekhevîyek diyar ligel dema rastî ya jiyane nemaye. Ji ber hemû gûhertin û tevliheviyên ku di nava dema vegêranê de tîncamdayîn, ev tevî rakirina eşkere ya di dema locîkî de çêkirina demek xeyalî ye. Lewra di romana nû de tekane dema ku hebe, dema xwendinê ye. Bêgûman ev di berhevkirina dema di nava romanê de ligel dema rastî ya ku tekane dema ku di romana locîk û aliyê mijar di nav de mabe, dema xwendinê ye. Ev jî demeke û rasterast peywendî bi tekstê ve nîne û demek li derveyî tekstê ye. Mirov dikare bêje dema locîkî ya di romanê de nemaye û li cihê wê 'Dema Taybet' hatiye danîn. Ev dema taybet di nava romanê de bêyî locîkê mamele ligel demê dike, lê locîka di nava teksta romanê de ne locîka dema jiyane ye.

Romannivîs nikare romana xwe ji her locîkek hebe qût bike, alozî û nehevîgirtina di navbera demên romanê de çêbike, ev ne taybetmendîya romanê ye. Roman timî hewla wê yekê daye ku bi awayekî herî baş baweriyê ligel xwendekar çêbike ew teksta ku dixwîne, hemû çavkaniya xwe ji rastiye wergirtiye û rast in. Dema di romanê de behsa demeke fantazî tê kirin, nivîskar gelek belge û daxuyaniyan dixê ber çavan. Ji bo em wisa bawer bikin ku ev ne fantaziye û rastiye. Ev karane hemû bi rêya komek teknîkiyên girêdayî demê ve tîncamdayîn.

Ev gotinên li jor me neçar dike ku bawerî bi gotina Rollan Bart bînin ku dibêje: (Ti demek nîne ku tenê di awayek guncaw û sistemê de nebe)²²³. Di romanê de dem heye û li wir bi rêya çend teknîkên guncaw ên di navbera corên demê de çêbûye û dem li gor sistemekê hatine rêxistinîkirin.

(Hellale xerîbî dikir. Ji wê rojê heta sed salên din li wî bajar û wê taxê ne jiya bû, heta du salên din jî. Dû sal derbas nebû, bi neçarî ji wan tax û cihan derket. Bi yekcarî û ji bo her demê bi cî hişt. Roja çûnê li bîra wê bû. Yanî çî dema xwestiban, dianî bîra xwe. Wekî çawa çî dema xwestiban albûma xwe ya biçûk derdianî û temaşeyî wêneya dikir. Her yekê pêlek rengîn a bi jehr xwe di ser de dikêşa. Çend wêne ji wî bajar û taxê hê jî di albûma wê de bûn. Ew wêneyên ku berî hatina Swêdê, heta ji wir û pê ve jî yek bi yek kom kiribû. Wêneyê kolan û mala xwe û...)²²⁴.

²²³ - Derbarey Eqlî Morêrn, komelêk nivîskar, wergêr: Awat Ehmed u Azad berzincî, weşana: Serdem. Slêmanî, 2004. R 148.

²²⁴ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 57.

Dem weke madeyek şil (ter) cih ji xwe re nagire û li cihek aram nagire. Di vê romanê de dem weke mêvanekê ranewestiya û bi berdewamî di geştê de ye. Di dema hevokek an jî paragrafekê de bazdanek mezin dide, mafê wê heye du dîrokên ji hev dûr ên çend salî behs bike û nêzî hev bike. Ev jî berfirehî, fikrê nivîskar û jêhatiya di bikaranîna amrazek giring ê weke demê werdigire. Hellale karakterê serekî bi awayek xeyalî dikare demê paşde vegeirîne û ligel xwe xwendekar jî bêne.

Di romanê de teknîkên anîna pêş hene, ew jî ji pêxistina bûyerên bê û yên bi mîsogerî di bingehê vegeirîna romanê de rûdidin pêk tên. Siberoja romanê jî peywendî bi wê yekê ve nîne ku gelo dema giştî ya romanê di çi rewşekê de ye. Mînak, eger dema vegêrana romanê bi giştî dema bûrî be, hemû bûyerên ku di romanê behsa wan hatibin kirin, hinek bûyerin ku bi dawî bûne. Ev nayê wê wateyê ku di wê tekstê de pêşxistin nîne û ev teknîkane girêdayî dema hundirê tekstê ne nekû derveyî tekstê.

Pêşxistî di romanê de du rolên serekî dileyîze. Ya yekemîn derxistina bûyerekê ye ku piştî çêdibe û ya duyemîn jî çêkirina pirek ligel siberojê ye. Ya duyemîn di nava ya yekemîn de çêdibe, ango encama herî baş di ya yekemîn de bikeve ew e ku hemû demê wisa li xwendekar bike ku di nava romanê de li benda tiştekî nû be. Li vir pêşxistî weke teknîke pêwîst hebûna xwe îspat dike û ji bo xwendekar ber bi wê yekê ve rakêşe ku xwendekar romanê bixwîne. Lê eger bi dirûstî bingehê xwe çêneke, wê demê herdu bingehên balkêşan û ji nişka hunera xwe bikûje. Lewra teknîka pêşxistî du aliye. Eger roman nivîs di çêkirinê de deshilatdar bû û karî bi awayek rast û hunerê dîtina teknîkî bike, wê demê wê bala xwendekar rakêşe ser xwe. Eger na, wê demê wê berevajî vê yekê rûbide.

3.5 Teknîkê Paşxeriyê

Armanç ji teknîka paşxeriyê ew teknîkê giring ê vegote kirinê ye, ku bi rêya wê ve dema vegotekirinê dirêj tê kirin, (Bi wê ve nivîskar dema vebêjîna niha radigre û bi vê zîhnî ve vedibêje û bûyerên berê wek bûyerên îro vedibêje)²²⁵. Ku berê di serê wî de derbasbûye û di dema xwe de behs nekiriye, lê di dema naha de vedibêje û cudayiya di navbera dem de jî diyar nake.

²²⁵ - Modêrnekan, Ramîn Cehanbeglu, wergêr, Azad Berzincî, weşana Serdem. Slêmanî, 2003. R 178.

Derbarê teknîkê paşxerî (cîrar cînît) de bi wî awayî pênase dike û delçêt: (vegote kirina bûyerê dikeve pêş wan xalên ku vegotin têda pêktê)²²⁶. Ev tê wê wateyê ku vegote kirina wan bûyerane ku berî naha pêkhatine, ji ber bibîranînê ve nivîskar vedigere paş û amaje bi dema wan bûyeran dike.

Di encama vê penaseyê de em digehin vê, ku paşxerî pêktê ji vegote kirina bûyerên dema borî ya dema vebêjîna bûyerên naha. Vebêjîna waha jî ji aliyê vebêj yan jî kesayetiyan ve tê kirin. Êdî çi kesayeta serekî be yan jî kesayetiya xwedî rolê tenişt be ev yek tê kirin. Armanca roman nivîs bi pêgeha teknîkê paşxerî de ewe ku tîşk bixe ser bûyerên dema borî di dema naha de, ku xwandevan bi wê role ve, ku kesayetiyan di nav vebêjîna tîs ziman aşna bike û bide nasîn û wateya ew bûyerên ku dikevin berî naha û vebêjîna ronî bike. Ew coreya teknîkê peyvendiya xwe bi çawaniya asta sîstema vebêjîna nivîsê ve heye. Eger sîstema vebêjîna ber bi sistbûnê ve çû, wê demê roman nivîs bo ku berdeyamîyê bi vegotina romanê bike, radibe destbi vebêjîna bûyerên dema borî dike. di heyama vebêjîna de jî paş û pêş kirina bûyeran pêktê û dema vebêjîna li gel dema çîrokê ve ne yekin û dema vebêjîna dirêj dibe.

Teknîkê paşxerî di dema bikaranînê de çend erk û roleke taybet di nav romanê de tê dîtin, wek agahdar kirina xwandevan ji bûyerên dema borî û teji kirina wan valatiyan ku vegotevan di dema xwe de behsa wan ne kiriye û ji ber bazdan li ser wan hatiye kirin ew valatî derketine holê. Ev jî dibe sedem ku nivîskar hest bi berdeyamîna dema vebêjîna li gel xwandevan ava bike û nahêle hest bi wê bike ku ewqas bûyer di nav nivîsê de nehatine behs kirin ku pêwîstbû bihatan vebêjîna, ji bo ku zêdetir ji çarenivîsa kesana aşkera bibe û kesayeta wan bê naskirin û coreya fikir û bîr û baweriya wan ji aliyê herkesekê ve bê fêmkirin. Herwaha nivîskar ji ber vê teknîkê hin ji bûyerên veşartî pêşkeş dike û tê de hin zanyariyan derbarê raboriya kesayetan de aşkera dike.

Yek ji taybetmendiyên vê teknîkê ew e, ku tenê di romana nû de nayê bikaranîn, ji ber di romanên teqlîdî de jî hin ji bûyerên berê, ku di raboriyeke nêzîk de pêkhatine vedibêje. Ew jî tê wateya ku roman nivîs di hin cîha de dema vebêjîna de dişkêne û amaje bi coreya bûyeran dike. hin ji rexnegir û nivîskar teknîkê anîna berçav ji teknîkê paşxeriyê cuda dikin, lê anîna berçav heman teknîkê paşxeriyê ye,

²²⁶ - Rêbaze Edebîyekan, Hîmdad Husên, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2007. R 93.

ku roman nivîs bi rêya vebêjînê vey an jî kesayetiyên ve bûyerên berê tîne bîr. (Ji bo vê jî teknîkê anîna berçav, heman erkê paşxistinê ye, yan wek flaşbekê di vebêjînê de pêktê û bi rêya paşxistinê ve nivîskarê bihêz bi coreya vebêjîna asta yekem de nayê ragirtin)²²⁷. Ku xwandevan ji wê astê qutbibe û wa hest bike ku roman nivîs yan jî vebêj bi awayekê mekanîkî ne bi rêkûpêkî ew dem bi cîh hiştiye, ku bûyereke dema borî vebêje. Ew jî tê wateya ku vebêjîna her bûyereke dema borî tê wateya ku di dema xwe de hatiye paşxistin û nehatiye vebêjîn, roman nivîs radibe bi rêya flaşbek û zîhnî ve tîne bîr û vedibêje.

Coreyên teknîkê paşxeriyê:

Teknîkê paşxeriyê li gor çawaniya wan peyvendiyan ku bi asta sîstema yekem a vebêjîna ku heye dibe sê coreyan:

- 1- Vegotekirina(paşxerî) ya derveyî: Vedigere bo berî destpêkirina romanê.
- 2- Vegotekirina (paşxerî)ya navxweyî: Vedigere bo raboriyeke girêdayî destpêka romanê, ku pêşkeşkirina li nivîsê de hatiye pêş.
- 3- Vegotekirina (paşxerî) ya avête: Ev jî tîkel dibe bi her du coreyên berê.

Armanç ji paşxeriyê derveyî ew e, ku roman nivîs di dema naha ya vegotekirinê de radigre û vedigere bo raboriyê û behsa wan bûyeran dike ku berî destpêkirina vegotekirina bûyerên romanê de pêkhatibin. Ew jî tê wateya zîhnê kesayetiyekê vedibêje, ku dikeve dervey bûyerên serekî yên romanê, wek vegotekirina behsa raboriyekî zû yan jî rojên zaroktiye kesayetan dike.

Bi bîranîna wan coreyên bûyeran ve bi rêya zîhnê kesayetiyên ve, ji ber bandorên derveyî û ew rewş û cîhê ku tê de dijîn derdikeve pêş, bi vê yekê ve jî paşxeriyê derveyî zanyariyên zêdetir derbarê jiyana borî ya wan kesayetiyên pêşkeş dike. (Herwaha paşxeriyê navxweyî, tê wateya ku dema naha ya vebêjînê ku li raboriyeke nêzîk de berî geheştin bi dema pêkhatina bûyerên ku naha pêkhatine ye, ku di nav nivîsê de pêkhatine, lê roman nivîs behsa wan nekiriye û hewl dide di dema naha de vebêje)²²⁸.

²²⁷ - Le Staîyî Edeb de, komek nivîskar, wergêr: Şêzad Hesên, Weşana Aras. Hwlêr, 2001. R 71.

²²⁸ - Teknîky Pêşxeriyê, Brwa Ehmed, Rexney şawdêr, jmare 71, Slêmanî, 2008, R 3.

Di coreya sêyem de ango bi wateya paşxerîya avête de: Vebêjîna wan bûyeran de, ku li pêş û piştî dema naha ya romanê de derdikevin pêş, ango ragirtina vebêjîna naha ya vegotekirina bo raboriyê de, bi têkelkirina li gel naha ve û dubare vegotekirina dema naha ve vebêjîna bûyeran. Di berdewama vê yekê ve têkelîyek di navbera dema borî û naha de pêktê û vebêjîna ber bi paşerojê ve pêşdikeve.

(Helale ne dikarî şad û coşa xwe bi bihîstina dengê filûtê ve û ji wê jî zêdetir, bi dîtina filût lêdanê veşêre. Braymok ew şadî û coş li rûyê geş ê xwe dida derva di çavên wê de dît. Ken kete li ser lêvên wê û destê xwe xiste nav ava hewza biçûk a pêş kaniyê, ava ku arambû ber bi cokê ve ramalî.

“Tu dervey min çend kesên din ên filûtê lêdidin dinasî? Te guhdarî filût lêdana çend kesên din kiriye?”

Kena li ser lêvan a bi aramî û mîhrebane, di heman demê de rêyek ji gilî û gazindan têde bû. Helale bixwe ve şikiya, lê xweşiya wê winda nebû. Got: “Min henek kir! Min xwest bizanim tu dê çawa bersiva min bidî!”

Sekna wê wek zarokan bû. Braymok ti tiştêk negot. Helale piştî demjimêrekê got: “Ez gelek di bin bandora te de me, wa nîne?”

Braymok destê xwe ji ava hewzê derxist û rabû serpiyan û got: “Kê ew gotin kiriye Helale?”

"Şêzad."

"kê?"

Bi awayeke pir ecêbmayî pirsî.

Helale fikirî, Braymok Şêzad nedinasî. Nedîtibû.

Şêzad gotibû: “Min nedîtibû, lê dengê wî bihîstibû. Dengê germ û sozê filûta wî bihîstibû ku êvaran di radyoyê de belav dibû.

Helale gotibû: “Wê demê tu nehatibû derve, ne wisa ye?”

“Erê ez li bajêr bûm. Dema ez hatim derve du hefte bû term ango meytê Braymok dîtibûn û veşartibûn. Dema ez hatim derve hemû kes pir xemgîn bû, li her cîhekê behsa wî dihate kirin, behsa wî û...”

xwestibû bibêje te, lê ne gotibû. Şerim kiribû bibêje. Helale têgeheştibû, kenekî tal li ser lêvên wê rûniştibû û ti tiştêk negotibû...)²²⁹.

²²⁹ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 220-221.

Wekî ku tê dîtin teknîka paşxerî di romanê de bikarhatiye û bi alîkariya vebêjîna çîrokê daye. Ev teknîke nahêle xwandevan hest bi bêzarî û aciziyê bike û zû zû vedibêje bo dema pêştir û deman têkelî yek dike, herwaha zanyariyên zêdetir ji xwandevan re dide û derbarê cîh û kesayetî de danasîn çêdike. Ev teknîke di dirêjeya romanê de bikartê û nivîskar bi awayeke serekî piştî xwe pê ve girêdide.

3.5.1 Teknîkê Pêşxerî

Ev teknîke bi wateya piroseya vebêjîna bûyereke paşerojê digre ber, yan pêştir amaje bo pêkhatina wan bûyeran dike. ew bûyerane jî dikeve piştî wan xalên ku vebêjîna roman pê geheştiye, ev tê wateya pêşxerî kiryareke vebêjîne ye, ku bixwe di anîna bûyereke paşerojê vedibêje, ku rexnekirinê de jê re tê gotin pêş bûyeran ketin. Ev jî wê yekê digehîne ku roman nivîs dema vebêjîna bûyerên naha radigre û behsa bûyereke berî kuu pêkbê dike, ev tê wateya ku hîn bûyer pêknehatiye. Li gel vê yekê jî tevgera vebêjîna nivîsê her berdewam dibe û di nav dema naha de berê xwe dide ber bi dema pêş. (Bo balkêşan û rakêşana bîr û ramana xwandevan dikeve pêş pêkhatina bûyerê, armanc amadekirina bingehêke bo dema bûyerê)²³⁰. Ev pêş bûyerê ketin jî wa li xwandevan dike ku xwasteka wî zêdetir bo nivîsa romanê bixwîne pêktê, ku bizane pêşdeçûna vegotinê ber bi kûderê ve diçe û danûstandin û çarenivîsa kesayetiyên bi çî encam dibe. (Pêşxerî wek piroseyekî vebêjîne li benda pêkhatina bûyeran tê kirin, ku peyvendî bi hêza karîne ya karê roman nivîs ve heye, bo diyar kirina çarenivîsa kesayetiyên a ji ber wan bûyerên ku pêktên)²³¹. Roman nivîs hin caran di dema vegotekirina nivîsa romanê de bi armanca xwandina paşerojê wêneyê bûyereke paşerojê dikêşe, ku pêş dema naha dikeve, ji bo ku bizane paşeroja wan bûyeran çawa dibe û digehê kûderê. Ev wêne kêşane jî erkê pêşxerî di vebêjîna û sîstema bûyeran diyar dike, ku ji aliyê xwandevan ve wî dixê nav rewşekî bendewariyê de. Li gor hin ji rexnegir û nivîskaran teknîkê pêşxeriyê amaje kirine bo wan bûyerane ku dibe hin ji wan di paşerojê de pêkbên, lê li gor hin ji wan jî wisa dibe û ew bûyera ku tê behs kirin divê di paşerojê de pêkbê. Derbarê wan bûyerên ku bendewarî heye ku di paşerojê pêkbê (Perez Sabîr) dibêje: (Ne merce ku her carekê ew bûyer pêkbê, ji ber digohere, li gor gohertina tevgera bûyeran û helwêsta kesên nav çîrokê gohertin pêktên, di encama bandor li hev kirinê

²³⁰ - Pêkenîn u Azadî, Mîxayl Baxtîn, wergêr: Bextîyar Secadî, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2008. R 66.

²³¹ - Çend Wêstgeyekî Edebî, Komelêk nivîskar, wergêr: Ezîz Reuf. weşana Çawdêr, Slêmanî, 2008. R 163.

de çend bingehên taybet ên çîrokê, çî di navxwe de be, yan jî çî di dervey çîrokê de be ku pêktên û bandor û kareke taybet ê li gor xwe ava dikin pêşdeçûna bûyeran û diyar kirina çarenivîsa kesayetên derdixin holê, ji ber vê jî pir asayîye ew rewş çawa û bi çî sedeman ve hatibe holê, dibe ku encamên tîr hêvîkirin dernekeve pêş, herwaha tişteke pir asayîye ku ji ber ew armancên çav li rêye dernekeve holê û wisa bê ava kirin).²³²

Pêşxerîya wan bûyerên paşerojê di dema naha de vedibêje, ku divê di dema xwede pêkbên û nebin cîhê gumanê, ji ber vê jî her çî vegotinek behsa paşerojê bide û di dema xwe de pêkneyê, yan jî dibe ku pêkbê, nakeve nav çarçoveya pênaseya pêşxeriyê, erkê wê jî di nav nivîsên cuda de divê ji erkê wan bûyerên ku bi teknîkê pêşxeriyê ve be û di dema naha de vegotekirin bê pêşkeş kirin. Ev jî tê wateya tenê ew bûyerane di dema naha de tîr vegotekirin, ku merce di paşerojê de pêkbên, ne ku bi bingehê pêşbînîkirina wan bûyeran di dema paşerojê de.

Di encama vê ronahiya derbarê bûyer û bûyerên pêknehatî yê bûyerên paşerojê, em digehin wê nêrînê ku ew bûyerên paşerojê di dema naha ya vebêjînê de tê behs kirin, hemû demekê di paşerojê de bi awayek diyar nake ku pêkbên, lê piraniya dema wan bûyerane pêktên, ev jî tê wateya ku nabe di vegotina nivîsa romanê de merc be bo pêkhatina wan paşerojan bê danîn, ji ber di gelek romanên de behsa bûyerên paşerojê tê kirin, lê di dawîya vegotekirina romanê de ew tiştê ku bidest hatiye xistin dibe berçav nekeve. (Ev jî berevajî helgêranêye ber bi dawiyê ve, ji ber vegotekirina paşerojê di dema naha de bo paşerojê heldikşe, bi awayek ber bi pêş ve diçe, ku dibe sedemê bazdana wan xalên ku vebêjînê geheştîyê)²³³. Wê demê her pêşxeriyek sedemeke bo ku dema vegotina bûyerên paşerojê ber bi pêş de biçe, bo dîtina çawaniya bi cîh anîna bûyerên ku çav li rê ye.

3.5.2 Teknîkê Pêşxerî

Teknîkê pêşxerî li gor sîstema vegotina bûyerên paşerojê dibe sê core:

1- Pêşxerîya derveyî: Armanc di vegotekirina wan bûyerane, ku dikevin dervey dema serekî ya vegotekirina romanê, ew jî tê wateya ku vegotekirina wan bûyerên, ku di dema naha de tîr vegotekirin lê di paşerojê de pêkbê. Li gore wê

²³² - Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî, Perêz Sabîr, weşan: Serdem, Slêmanî, 2001, R 108.

²³³ - Teknîky Gêranewe le romanî (Êwarey Perwane)y Bextîyar Elî de, weşan: Berêweberayetî Roşînbîry, Slêmanî, 2009. R 94.

mezendeya bûyerê, ku dê di paşerojê de pêkbê, di dema naha de hatiye behskirin, ev bûyere jî li dervey nivîsa romanê de ye.

2- Pêşxeriya navxweyî: Wateya vebêjîna bûyerên naha bi têkelkirina li gel bûyerên paşerojê ye. Bi vê jî ew bûyerên paşerojê, ku naha tên behskirin di paşerojê de pêktê. Ev teknîke jî wek teknîkê paşxeriya navxweyî bikartê.

3- Pêşxeriya hatiye dûbare kirin: Armanc ji dûbare kirina vegotekirina bûyereke di dema naha de hatiye vebêjîn, ku di paşerojê de dê pêkbê ye. Herwaha dibe ew bûyer çend carek û bi çend awayan dûbare bibe û asta vegotinê û tevgera kesayetana bi gohere.

(Şêrzad digot: "Eger keça me bibe emê navê wê daynin Evîn")

Helale digot: "Reina."

"Reina? Çima Reina? Evîn xweştire li Reina. Evîn bi wateya eşqe, ango heskirine."

"Reina jî ango xweşik."

Helale li çend ferhenga geriyabû, ku heta wateya wê peyvê dîtibû. Reina ango jin a gêj û lewçe. Çi? Reina ango jina xweşik û bedew.

Şêrzad got: "Teqez navê kesekî ku tu pir jê hesdikî Reina bûye, yan jî navê deste xwişkeke ku tu jê hesdikî, ne waye?"

"Erê."

"Nemaye? Şehîd bûye?"

Reina mabû yan nemabû? Helale nedizanî. Demek dirêj bû, piştî ku Kurdistanê hatibû ti agahiyek ji Reina ne girtibû û ne pirsî bû. Yekem car dayîka wê telefon bo kiribû, gotibû: "Reina çawa ye, dayê?"

"Reina? Kîjan Reina?"

"Reina ya Sofî Heme Kerîm. Jina kevin a bavê min."

dayîka wê pir ecêb bû bo behskiribû.

"Mibarek nebe bo li ser ew hemû aleme nûçeyê wê dipirsî? Nekû bêjî li wê derê jî ew jin hîn ji bîr nekiriye!")²³⁴.

Pêşxerî di vê romanê de wek teknîkê paşxerî bikar hatiye. Roman nivîs bi awayeke pir zîrek zemînan têkel yek dike. wek di vê bendê de diyare, ev teknîke

²³⁴ - Grewî Bextî Helale, Eta Nehayî, R 134-135.

alîkareke pir başe bo vegotekirina romanê û piştewaniyeke zêdetir ji xwandevan re dibexşe bo fikirandinê. Herwaha lîstokeke pir xweşik bi peyvên Reina û bi taybet jî li ser dayîkbûna zarokê wan ê yekem hatiye kirin. Reina wek karakterek ku rolê herî kêm di romanê de jê re hatiye dayîne, lê nirxekî wê yê pir mezin heye, ji ber ku Helale ew jina ku ji bîra wê neçûye û li Ewropayê jî rewşa wê ji dayîka xwe dipirse û dixwaze navê wê jî li zaroka xwe bike. Ev giringî dane bi karakter û anîna ber behsê ya navê wê ye û lîstokeke pir jîraneye ku nivîskar di romanê de pêktîne.



ENCAM

Di encama lêkolîn û rawekirina bingehê vegote kirina vê romana (Grewî Bextî Helale) de, ji aliyê teorî û pratîk ve em geheştine wan encamên li jêr hatine nivîsandin.

1- Piroseya vegoteyê di vê romanê de ji aliyê vebêj û yek ji kesayetiyên serekî ve tê pêkanîn, her yek ji wan jî rol digrin ser xwe bo pêkanîna bi cîh anîna erkê xwe. Çîrokbêj di hin cîhên romanê de rolekî bi bandor digre ser xwe di pêşde birina vebêjînê de, di beşên destpêka romanê de çîrokbêj bêhtir nêzîke li nivîskar bixwe, ne yek ji kesayetên romanê.

2- Piraniya kesayetiyên pêş dikevin, ji ber heta dawiya romanê berdehamiya wan heye. Hin ji kesayetiyên raste xwedî rolekî serekî nînin û kêma derdikevin, lê bi dirêjahiya romanê de car car derdikevin û xwedî bandorin li ser tevgera vegote kirina romanê de.

3- Kesayetên xwedî rola tenişt di romanê de, rolekî wan ê giring heye di awahiya vegotekirinê de û piştevanî kirina roman nivîs a pêkhatiya kesayetên serekî de. Li gel vê yekê jî karîne pêşkeşiya vebêjîna bûyeran ber bi aliyê din ve bigoherin, ev yek jî bûye sedem ku berdehamî û dirêje pêdana piroseya vegoteyê pêkbînin.

4- vegote kirina bûyeran ji ber dialoga di navbera kesayetînan de ye, vebêjin ronîtir kiriye û roman nivîs dîalogên bi awayeke rasterast û ne rasterast kariye pêkbîne.

5- Bikar anîna monologan sedemeke bo vegotina bûyerên dema borî û dema naha û bîreveryên di nav romanê de. Ji ber monologan em di nav dilê karakteran de û beşek ji jiyana wan a borî agahdar dibin. Herwaha beşek ji planên wan ên paşerojê jî bi wî awayî tê aşkera kirin.

6- Dema vegotina romanê arasteyekî hûnerî vergirtiye, lê li gel wê yekê jî dema vegotinê demeke ku heta astekê têkele û xwandevan bi awayeke hêsan deman nikare ji hev cuda bike. Piraniya beşên romanê bi rêya bîrevery û bîranînan vedibêje, ji ber vê jî dema vegotekirinê têkşikandiye. Bûyerên dema raborî û naha û paşerojê bi yek ve girêdide. her vê yekê jî wisa kiriye ku roman nivîs her du teknîkê paşxerî û pêşxeriyê bikar bîne, ji bo wê jî dema çîrokbêj li gel dema vegotekirinê de ji aliyê ve li gel yek guncaw nînin.

7- Bikaranîna cîh di romanê de bûye hêvinê ber bi pêşdebirina vegote kirinê, ji ber roman nivîs bi awayeke hûrgilî cîh helbijartine. Vegote kirina bûyeran di hin cîhe de bûye sedemê tevgerxistina dema vebîjînê, ji ber di dema vebêjînê de roman nivîs bi rêya bîranînên karakteran ve cîhên Kurdistanê vedibêje, ji bo wan bûyerên dema borî di dema naha de vedibêje.

8- Bikaranîna teknîkê paşxerî û pêşxerî ve vebêjîna romanê hatiye kirin û sûdekî zêde bi tevgera vegotina romanê re bi wî awayî hatiye dayîn. Ji ber vê sedemê jî xwandevan piraniya aliyên veşartî û hûrgiliyên jiyana karakteran şaraza dibe.

9- Bikaranîna flaşbek û têkelkirina li gel bûyerên naha bi awayekî hûnerî bi kar hatiye, ev yek jî bûye sedem ku roman nivîs pir bi asanî vegere bo dema borî ya karakteran û beşek ji wan deman veguhêze bo dema naha û têkel bi demê re û cîhekî din ve vebibêje.

10- Di vê romanê de têknîkên vegotekirinê, wek monolog û dem û têknîkên pêşxerî û paşxeriyê bikar hatiye. Ev yek jî bi awayekî serkeftî li romanê û lêhatîbûna nivîskar derdixe holê. Bikaranîna wan teknîkên cuda wisa kiriye ku xwandevan ji romanê aciz nebe û bi awayeke balkêş hizra xwe û bala xwe bide ser romanê.

ÇAVKANÎ

- Azad Berzincî, *Çend wêstgeyekî Edebî u Fikrî*. Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2006.
- Azad Mhammed, *Teknik le Kurte Çîrok de*, Wate, jmare 3, Hewlêr, 2009.
- _____, *Nîgakan*, weşana Çawdêr, Slêmanî, 2008.
- Alan de Batin, *Dilnewaîyekani Felsefe*, wergêr: Selah Hesen Palewan, Serdem. Slêmanî, 2013.
- Bextiyar Elî, *Nersîsî Kujraw*, weşan: Endêşe, Slêmanî, 2015.
- _____, *Îman u Cengawerani*, weşana: Renc, Slêmanî, 2004.
- Brwa Ehmed, *Tekniky Pêşxery*, Rexney şawdêr, jmare 71, Slêmanî, 2008.
- Bextiyar Secadî, *Zaraway Edebî*, ferhengî şîkarane, Weşana Aras. Hwlêr, 2004.
- Babek Ehmedî, *Pêkhate u Ravey Deq*, wergêr: Mesud Babayî, Nima, Hewlêr, 2005.
- Babek Ehmedî, *pêkhate û Ravey deq*, werger, Mesud Babaîy, Weşana Nima, hewlêr. 2007.
- Bekir Elî, *Ledaykbunî muzik le rohî romanewe*, weşana Çawdêr, Slêmanî, 2009.
- Celal Enwer Seîd, *Tekniky Gêranewe le romanî (Êwarey Perwane)ya Bextiyar Elî de*, weşan: Berêweberayetî Roşinbîry, Slêmanî, 2009.
- Cemal Ehmed, *Plot le Romanî Kurdî de*, Serdemî Rexne, jmare 9, Slêmanî. 2002.
- Cîrart Cînet, *Xitab El Hikaye*, wergêr: Muhemmed Mutasem, Dar El Hîkme, Beyrut, 2000.
- Çarlis Brîslêr, *Rexney Edebî w Qutabxanekani*, wergêr: Ebdulxaliq Yaqubî, weşan: Aras, Hewlêr, 2007.
- Dayanda Bitgayer, *Roman u Pişay Roman nusîn*, wergêr: Ejî Goran, Dezgay Roşinbîry, Bexda, 1982.
- Dana Mistefa, *Mana Şarawekani Deq*, weşan: Rênma, Slêmanî, 2004.
- Dîyan Wat, *Fen El Kîtabe El Rîwaye*, wergêr: Ebdulstar Cewad, wezare Seqafê, Dar El Şun, Bexdad, 1988.
- Eta Qeredaxî, *Xwêndneweyek bo Grewî Bextî Helale*, Rexney şawdêr, jmare 85, Slêmanî, 2008.

- Eta Nehayî, *Grewî Bextî Helale*, weşana Renc, Slêmanî. 2007.
- Eta Qeradaxî, *Geranewe le xeyalewe bo waqi*, weşana Serdem, Slêmanî, 2004.
- Enwer Husên, *Romanêk le Giftugo de*, weşana wezateta rewşenbîry, Slêmanî, 2006.
- E. M. Forster, *Aspects of the Novel*, A Pelican Book, Great Britain. 1971.
- Edward Arnold, *Studying the Novel*, Jermey Hawthron, Great Britain. 1985.
- Ehmed Emîn, *El Neqid El Edebî*, El Naşir Kitab El Erebi, Beyrut, 1967.
- Elî Osman Yaqub, *Kodî Davînşî*, weşana Serdem. Slêmanî, 2007.
- Eta Qeradaxî, *Fantazîyaî Gêranewe*, weşana Serdem, Slêmanî 2008.
- Ebdulla Serac, *Berew Estaney Roman u Goşenîgakan*, weşan: Serdem, Slêmanî, 2007.
- Ebdulrehman Munîf, *Teşkek bo ser roman*, wergêr: Şîrîn K. weşana Serdem. Slêmanî 2006.
- Ebdulnutelîb Ebdulla, *Şuênkarî yekem le duyem u êstay Segwer*. Weşana Nîma, hewlêr. 2004.
- Ebûbekir Xoşnaw, *Goran û Nîma Yûşîc*, Weşana Wezarata rewşenbîry, Slêmanî, 2008.
- Ersto, *Hunery Helbest*. wergêr: Muhemmed Kemal, weşana: Serdem, Slêmanî, 2006.
- Edonîs, *Şunasî tewewnekraw*, wergêr: Newzad Ahmed Eswed, weşana paşkoy Çawdêr, Slêmanî, 2008.
- Enwer Qadir Mhemmed, *Le Edebî Rusîyewe*, weşana Serdem. Slêmanî, 2006.
- Faruq Refîq, *Malêkî Lêktrazaw u Wijdanêkî Bîmar*, Weşana: Renc, Slêmanî, 2002.
- Fuad Reşîd, *Rxney(Rexney Romanî Kurdî)*, weşana Soran, Hewlêr, 2005.
- Goran Baba Elî, *Azadîye Bçkolekan*, Rehend, jmare 3, Stockholm, 1997.
- Haşim Ehmed Zade, *Cîhanî Roman*, weşana: Endêşe, Silêmanî, 2015.
- Haşim Ehmedzade, *Cîhanî Roman*, weşana Endêşe. Slêmanî, 2015.
- Haşim Salih, *Arkolojîyay Zanista mirovayetîyekan*, wergêr: Şwan Ehmed, weşana: Serdem. Slêmanî, 2004.
- Helîm Yusif, *Katêk Masîyekan Tînu Debin*, weşana Endêşe. Slêmanî, 2015.

- Heme Kerîm Arif, *Derbarey Roman u Çîrok*, Yekêti Nuseranî Kurd, Kerkuk, 2008.
- Haşim Ehmedzade, *Ziman, Edeb û Nasname*, Weşana Aras. Hewlêr, 2012.
- Hemîd Ezîz, *Bineretekanî Felsefa*, çapî duyam, weşana Endêşe, Slêmanî, 2009.
- Hîmdad Husên, *Rêbaze Edebîyekan*, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2007.
- Hesen Caf, *Çîrokî Nwêy Kurdî*, weşan: Roşinbîry u Bilawkirdinewey Kurdî, Bexda, 1985.
- Helkewt Ebdulla, *Hunerî Gêranewe*, Edeb u Huner, jmare 531, Slêmanî, 2008.
- Hejar Xidir, *Romanî Nwêy kurdî*, Edeb u Huner, jmare 548, Slêmanî, 2008.
- Haşim Serac, *Gêranewe le Romanî Xewnî Pîyawê Îrannîyekan*, Raman, jmare 114, Hewlêr, 2006
- Husên Arif, *Nwnînekanm le Bwarî Rexne w Lêkolînnewda*, weşan: Serdem, Slêmanî, 2002.
- Hemesêid Hesen, *Hizir u Şewaz le Çîrokî Kurdî de*, weşan: Aras, Hewlêr, 2005.
- Hemed Derwêş, *Fen El Rîwaye*, Dar El Hurîye, Bexdad, 1986.
- Hîwa Qadir, *Jîyan Cwane*, weşana: Xaney Wergêran, Slêmanî, 2009.
- Hêmin Qeredaxî, *Marîfa u Îman*, weşana Endêşe, Slêmanî, 2012.
- Husên Arif, *Rwange u Yaran u Neyaranî*, weşana: Serdem. Slêmanî, 2005.
- Hendrên. *Wergêranî Rwxsarî Ewanîtir*, weşana wezateta rewşenbîry, Slêmanî, 2010.
- Îzeddîn Mistefa Resul, *El Waqîye Fî Edeb El Kurdî*, Aras, Erbil, 2010.
- Îzaddîn Mistefa Resul, *Lêkolînnewey Edebî Folklorî Kurdî*, weşan: zankoy Slêmanî, 1982.
- Îsmâil Heme emîn, *Ekrobatêkî Winbw*, weşana wezaretî Rewşenbîry, Slêmanî, 2012.
- Îsmâil Îbrahîm Seîd, *Rwdawakanî Kurdîstan le Awênêy Edeb de*, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2010.
- Îmbrî Gorc, *Gorc Lokaş*, wergêr: Mensur Teyfurî, wezaretî Roşinbîry, Slêmanî, 2004.

- Komek nivîskar , *Çend Wêstgeyekî Edebî*, wergêr: Ezîz Reuf. weşana Çawdêr, Slêmanî, 2008.
- Komek nivîskar, *Roman Çîye?*, wergêr: Cewad Mistefa. Weşana Mukiryanî, Hewlêr, 2008.
- komek Nivîskar, *Xewnî Nwsîn*, wergêr: Dilşad Xoşnaw, weşana: Serdem. Slêmanî, 2008.
- komek nivîskar, *Derbarey Eqlî Morêrn*, , wergêr: Awat Ehmed u Azad berzincî, weşana: Serdem. Slêmanî, 2004.
- komek Nivîskar, *Bînay Hunerî le kurte Çîrokî Kurdî de*, 1970-1980, Serdem, Slêmanî, 1999
- komelek nivîskar, *Xeyal û roh*, weşana Serdem. Slêmanî, 2004.
- komek Nivîskar, *Le Stâyîşî Edeb de*, wergêr: Şêrzad Hesên, Weşana Aras. Hwlêr, 2001.
- Kemal Mîrawdêlî, *Îstakîka*, weşanxaney Qaniî, Slêmanî, 2005.
- Kameran Salih, *Kobendî Çend Babetêkî Edebî*, weşan: Minare, Hewlêr, 2007.
- Kerîm Deştî, *Dîd u Dîdga*, weşan: Mukiryan. Hewler, 2002.
- Kameran Subhan, *Le Rqewe ta Xoşewystî*, weşana: Serdem. Slêmanî, 2007.
- Marif Xeznedar, *Dîcley Hizrim*, Weşana Mukiryanî, Hewlêr, 2006.
- Mensur Teyeurî, *Cwanînasî Şikist*, Murad Ferhad Pur, wergêr: weşan: Ranc, Slêmanî, 2006.
- Muhemmed Tofîq, *Mefhum El Mekan Welzeman fî Felsefa El Zahîra wel Heqîqe*, Munşa El Mearîf, El Eskenderîye, 2003.
- M Mhemed Îsmâîl, *Nusîn u Dahênan*, Aynde, jmare, 72, Slêmanî, 2002.
- Mensur Teyfury, *Roman û Şar*, Aynde, jmare, 76, Slêmanî, 2002.
- Muhemad Îhsan, *Bnemakanî Gêranewe le romanî Gulî Şoran de*, Gelawêjî Nwê, jmare 38, Slêmanî, 2008.
- Mhemed Şawêsî, *Gftugo legel Necîb Mehfuuz*, Wergêr: Ruberî Dahênan, jmare 29. Hewlêr, 2010.
- Merîwan Wirya Qanî, *Şwnas u Alozî*, weşana Rehend, Slêmanî, 2004.
- Mîxayl Baxtîn, *Pêkenîn u Azadî*, wergêr: Bextîyar Secadî, Weşana Mukiryanî, Hewlêr, 2008.

- Mhemed Kemal, *Nihîhîzm u Rehendekanî bîrkrdinewe*, weşana Serdem. Slêmanî, 2005.
- Mesud Mhemmad, *Le Peroşekanî Jîanewe*, weşan: Aras, Hewler, 2007.
- Merîwan Wirya, *Fîkr u Dunya*, weşan: Endêşe, Slêmanî, 2014.
- Muhammad kurdo, *Lalezarî wişe*, weşana wezateta rewşenbîry, Slêmanî, 2007.
- M.H. Abrams, *A glossary of literary terms*, Tahran, ninth edition. 2009.
- Mirian Aliott, *Novelists on the Novel*, Routiedge, USA, 1996.
- Mardîn Îbrahîm, *Mergî Meymun*, weşana Endêşe. Slêmanî, 2015.
- Muhsîn Ehmed Omer, *Ferhengî Edebî*, Çapxaney Hemdî, Slêmanî, 2012.
- Maryo Bargas Yosa, *Duazdah Name bo Romannwsêkî law*, , wergêr: Şîrîn K. weşan: Paşkoy Çawdêr, silêmanî, 2008.
- Mîlan kondêra, *Hûnerî roman*, Wergêr: Kerîm pereng, Weşana serdem, Slêmanî 2008.
- Merîwan Wirya Qanî, *Kitêb u Dunya*, weşana Endêşe, Slêmanî, 2011.
- _____, *Fîkr u Dunya*, Bergî Yekem, weşana Endêşe, Slêmanî, 2013.
- Muhemed Kemal, *Kêşey Bwn le Mêjuy Felsefe de*, Bergî yakem, weşana: Serdem. Slêmanî, 2002.
- Mîlan kondêra, *Pêkenîn u Bîrçunewe*, wergêr: Awat Ehmed, weşana: Serdem. Slêmanî, 2002.
- Mistefa Xiwatanî, *Teknîky Goşenîga le romanekanî Bextîyar Elî de*, weşan: Awêr, Hewlêr, 2015
- Necm Elwenî, *Teknîky Dîalog le Kurte çîrokî Kurdî de*, weşan: Şefeq, Kerkuk, 2006.
- Newzad Ehmed Eswed, *Bîrî rexney Hawçerx*, komele wtar, Weşana Mukiryani, Hewlêr, 2001.
- Nezand Begîxanî, *Surry Mana*, weşana Renc, Slêmanî, 2008.
- Necat Hemîd Ahmed, *Teory binyatî şarawe*, Weşana Aras. Hwlêr, 2008.
- Perêz Sabîr, *Bînay Hunerî Çîroky Kurdî*, Hewlêr, 2009.
- Perêz Sabîr, *Rexney Edebî Kurdî u Meselekanî Nwêkirdnewey Şîr*, weşana: Aras, Hewlêr, 2006

- Perêz Sabîr, *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî*, weşan: Serdem, Slêmanî, 2001.
- Perwîn Ebdûlla, *Regezekanî Drama le şîrî kûrdî de*, weşana Serdem. Slêmanî, 2008.
- Pîter Halbîrg, *Tiyorî Edebî*, wergêr: Enwer Qadir Muhemmed, weşan: Melbendî Kurdolocî, Slêmanî, 2010.
- Pêşrew Husên, *Şwêngey Betal*, Pîter Bruk, wergêr, weşan: Rexney Çawdêr. Slêmanî, 2009.
- Reuf Hesên, *Endêşe Cwanekan*, weşan: Roşenbîry, Hewlêr, 2005.
- Rêbwar Sîweylî, *Sofîstekan*, weşana: Serdem. Slêmanî, 2000.
- Rêzan Ehmed Xidir, *Teknîky Gêranewe le romanekanî Ebdulla Serac de*, weşan: Rojhelat, Hewlêr, 2012.
- Ramîn Cehanbeglu, *Modêrnekan*, wergêr, Azad Berzincî, weşana Serdem. Slêmanî, 2003.
- Rêbwar Sîweylî, *Zanko le Modêlewe bo Waqîf*, weşana Dezgay Gencan, Hewlêr, 2007.
- Rêbwar Sîweylî, *Nusîn û Berpîrsîyarî*, çapî duyam, weşana Renc, Slêmanî, 2006.
- Rêbîn Herdî, *Dijî Bêdengî*, weşan: Renc, Slêmanî, 2001.
- Rist Hîlz, *Çîrok u Taybetmendîyekanî*, wergêr: Selah Omer, weşan: Roşenbîry, Hewlêr, 2005.
- Risr Hêlz, *Çîrok u Taybetmendîyekanî*, Wergêr: Selah Omer, wezaratî Roşinbîry, Hewler, 2005.
- Rênye Dîkart, *Çend wirbuneweyek le Mîtafîzîka*, wergêr: Hemîd Ezîz, wezaratî roşinbîry, Slêmanî, 2005.
- Sîamend Hadî, *Mêjuy Serheldanî Roman*, weşan: Tîşk, Slîmanî, 2004.
- Sabîr Reşîd, *Romanî kurdî*, Weşana Aras. Hwlêr, 2007.
- Semed Ahmed, *Lenaw bazney deq da*, Weşana Wezarata rewşenbîry, Slêmanî, 2003.
- _____, *Çîrokî Kurdî, Rexne u Lêkolînewe*, weşan: Roşenbîry, Hewlêr, 2005.
- Sebah Îsmâîl, *Çemk u Îstatîkay Şwên la Edeb de*, Weşana Aras. Hewlêr, 2009.

Senger Şêx Zîrar, *Binyatî Gêranewe, le Dastanî(Mem u Zîn)ya Ehmedî Xanî u romanî (Şary Mosîqare Sipîyekan) y Bextîyar Elî de*, weşanxane: Mukiryan, Hewlêr, 2009.

Semed Ehmed, *Le sêberî Pirsîyar de*, weşana Yaney Qelem, Slêmanî, 2007.

Selîm Reşîd. *Şêwaz le kurte çîrokî nwêy kurdî de*, Weşan: Serdem, Slêmanî, 2004.

Serdar Rehman, *Nusîn wek nexoşî*, Konsêpt, jmare 4, Slêmanî.

Şucaî Muslim El Anî, *Fî Edebna El Qises El Miasir*, Dar El Şun Elamme, Bexda, 1989.

Şaram Qewamî, *Şary Deste u taqmekan*, weşana Gilbirg, Sine, 2007.

Şukirye Resul, *Teknîky Gêranewe le çîrokekanî (Marf Xeznedar)de*, wezareti Perwerde, Hewlêr, 2010.

Twana Emîn, *Menfa u Xwêndnewe*, weşana Çawdêr, Slêmanî, 2008.

Teha Ehmed Resul, *Rexne le Bextyar Elî*, Rênma, Slêmanî, 2005.

Walter Binyamîn, *Komalêk Babety Tîory*, komalêk wergêr, wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2004.

Xidir Mustefa Ehmed, *Corekanî Karekter le çîrok u roman de*, Raman, jmare 105, Hewlêr, 2006.